





# Naverok

Sal 3 • Hejmar 9 • Bihar 1997

---

Çend belgeyên Wezaretê Kar û Barê Derve ya  
Brîtanyayê li ser Kurdistan 3

Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropa 19  
Zinar Soran

Şerê qirêj û rewşa weşanên Kurdistan 28  
Lokman Polat

Mele Ehmedê Palo 34  
A. Bali

Rewşa Kurdistan di dîroka Îbn Xeldûn de 38

Zanistiya edebî û bîreweriya dîrokî 48  
N. Zaxuranî

Gerranewey estêrekan 53  
Xebat Arif

Kurdên Azerbaycanê, dîroka Laçîn û yên mayin 55  
Şamîlê Selîm Esger

Çend gotin li ser semînera edebiyata zarokan 65  
Mihemed Dehsiwar

Çend helbest ji Alîşêr Efendî 69  
Berhevkar: Doxan Yildirim

Derheqê kirmancî (kirdkî) de kombiyayîşê II. ê Stockholmî 75

"Yado yew dêr a vaciyena welat mi di" 86  
Sêyidxan Kuriş

Sal 3  
Hejmar 9  
Bihar 1997

Xwedî Komeleya Nivîskarên Kurd  
li Swêdê

Redaksiyon Osman Aytar  
Mahmûd Lewendî  
Laleş Qaso  
Zinar Soran

Şertên abonetiye Salek: 200 SEK  
Niv sal: 100 SEK  
Hejmarek: 50 SEK  
*Ji bo welatên din mesrefa  
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan Rûpelek: 1 000 SEK  
Niv rûpel: 500 SEK  
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan Osman Aytar

Rismê bergê pêşî Bajarê Hesenkêfê  
*(tabloyeke Şerefname,  
ji arşîva Jîna Nû)*

Postgiro 46 32 31-1

ISSN 1400-528X

Çap Apec-Tryck

*Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.*

Navnîşan • Adres • Address:  
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

# Çend belgeyên Wezaretê Kar û Barê Derve ya Brîtanyayê li ser Kurdan (\*)

**E**v belgeyên han, di çerçeveya projeya xebata kovara Gzîng a ji bo pêkhatin û sebebên hilweşandina Komara Kurdistanê hatine wergerandin. Lê belgeyên ku di bin reqema pêncan de ne, bi gelemperî di derheqê rewşa hemû Kurdistanê ya di navbera salên 1946-1950an de ne. Wekî ku dê ji aliyê xwendewanan ve jî bê dîtin, tiştên balkêş û bi îbret tê de hene. Ew notên di nav kevanê de hatine nivîsandin, ez nizanim ka gelo yê xwedîyê raporêne yan ên wergerê inglîzîyê ne. Tu agahdarîyek di vî warî de tune. Reqemên belgeyan ji aliyê wergerê inglîzîyê ve hatine danîn. Ew notên li ber wergerê hatine nivîsandin, herwiha yê Enwer Sultanî ne.

## **BELGE: 1**

Nusxeyek ji bîranînên xanim A. K. S. Lambton, Ataşeya Çapemenî ya Sefareta Brîtanyayê ya Tehranê.

Fo. 371/40173/13978

13 Îlon 1944 (22yê Şewrîwerê 1323yê hetawî)

## **PEYWENDÎYA KURDAN BI RÛSAN RE**

Qasekî berê niha, ji bo ku ez di rîya Meyanduwaw, Mahabad, Seqiz û Sine

---

(\*) Ev nivîs ku Enwer Sultanî ji inglîzî wergerandiye bo Soranî, ji Kovara Gzîng(hejmar: 10, kanûna paşî 1996) hatiye girtin.

re biçim Kirmanşanê, ez di nav beşeke ji Azerbaycan û Kurdistanê re derbas bûm. Hêle, ew cî bû ku navçeya Îran û Rûsyayê ji hevûdu vediqetand û ew jî di navbera Seqiz û Meyandiwawê de bû. Bingehe dawîyê yê çavedêrîya leşkerê rûsan, li Meyanduwawê bû; esker, cendirme û polîsên Îranê li Seqiz dihatin dîtin. Navçeyên rûsan yên ji Tebrîzê heta Meyanduwaw û Mahabadê, ji bajaran bigirin heta bi gundan tije çekdarên kurd bûn. Qet çavê min bi cendirme an polîsekî Îranî neket.

Ez bi grûbek kurdên navçeyê re axivîm, hemûyan jî ji nivê dilê xwe ve li ser serxwebûna Kurdistanê diaxivîn. Yek ji wan, bazirganekî ji Meyanduwawê bû, wisan hêzir dikir ku dê ji Kurdîstana serbixwe îstîfadeke mezin bike. Wî digot, Kurdîstana serbixwe her çiqas feqîr jî be û di rîya wê de qurban jî bêndan, lê cardin dê ji hal û rewşa me ya niha xweştir be. Her eynî kesî digot ku, Kurdîstaneke serbixwe, ya bi wî awayî, elbete dê pêwistî rawêjkarîya mal û tiştên wisan bibe.

Li Mahabadê, Qazî Mihemmed ku kurdekî ji xelkê navçeyê ye û birayê wî nûnerê malbendê ye (di Meclîsa Şûra ya Îranê de), wisan dixuye serokekî xwedî desthilatê wê navçeyê ye. Min wisan hîs kir ku peywendîya wî ya nêzîk bi rûsan re heye û çî ji destan tê, ji bo jarkirina nifûza karbidestên Îranê teksîr nake.

Wisan dixuye ku serokeşîr etên kurdan di bin serokatîya wî de civînek nehênî çekirine<sup>1</sup>. Kesê navê wî derbas bû, bi eşkere behsa serkevtina xwe ya ji bo bazdana kolonel Hoşmend dike, ku ew ji bo bingehê padganeke (qereqol) dewleta Îranê ku li bajêr ava bike şandibûn Mahabadê (Hoşmend, di dema Riza Şah de li Mahabadê dima û navê wî bi xerabî belav bûbû, ez nizamim ew ji alîyê dijmin pê ve hatine kirin an na).

Rojnameke kurdî, ku tê gotin bi nehênî derdikeve<sup>2</sup>, ji alîyê Qazî Mihemmed ve tê meşandin û beşdarîya wî tê de heye. Rojname, ku li gor gotina wî, piştgirîya serxwebûna Kurdistanê dike, wisan dixuye maqaleyên li ser komunîzmê jî tê de tînin nivîsandin.

Ms. Dalla Norveçî-Emerîkî, ku bi kurdekî Mahabadî re zewicîye û nêzîkî 23 salan li wir jîya ye, ji min re got, piştî ku bi tevayî hemû karbidestên Îranê ji Mahabadê derketine heta niha, rewşa bajêr vegeŕiyaye bîst sal berê niha.

Rê û ban, bi taybetî di navbera Mahabad û Meyanduwawê de, di nav rewşeke baş de nîne û nîşanek kêr di dest de ne ku hewlê başkirina wê bêdan. Ji Seqizê şûn de, êdî rewşa caddeyan hinekî baştir e û piçek kar li ser hatîye kirin.

Di navbera Seqiz û Kirmanşanê de, ji bilî esker û cendirman çavê mirov bi çekdarekî din nakeve.

Îmza

A.K.S. Lambton

Sefaretxaneya Brîtanyayê, Tehran

13 Îlon 1944

## BELGE: 2

Fo. 371/45446/131005

18 Sibat 1945 (29ê Behmenî 1323yê koçî)

Nûsxeya telgrafa General Konsolê(Konsolosê Giştî) 'Ela Hezretê Şah (Tebrîz) ji Sefaretxaneya Tehran re, hejmar: 30 (Tenê dê ji Tehranê re bê şandin).

### RAPORA REWŞ Û ŞERTAN

1) Di roja 15yê sibatê de, grûbek kurd ku ji aliyê malbateke piçûk a navê wê Ezîz a girêdayî Eşîreta Feyzûllahbegî ve ku hatibûn handan, êrişê îdareya polîsan a Mahabadê kirin û qasê ku hat zanîn, xwestine îdareya malîyê jî talan bikin. Pênç polîs hatin kuştin. Fer manderê leşkerê Îranê yê vir (Tebrîzê) ji min re got ku Ezîz di axavtina xwe de daxwaza derxistina karbidestên Îranê kirîye û gotîye ku wekî nasyonalîstekî terefdarê rûs û komunîzmê axavtîye. Yek ji wan mirovên Cemî(?) Mihemmed ê serokê (Eşîreta) Mameş a navçeyê, piştgirîya polîs kirîye û fermanderê Îranî (yê Mahabadê) ji Dîbokrî ('Elî Axayê Serdar Eshed -'Elyar) re gotîye ku siwarên xwê (bîne nav bajêr) û asayîşê temîn bike.

2) Urmîye: Di roja 14yê sibatê, liqeke piçûk pîyadeyê (leşker) Îranî di dema îzna xwe ya hefteyê de, çend mîl bakûrê bajarê Urmîyê rastê grûbek kurdên Herkî hatine. Esker ji kurdan xwestine ku dûr bikevin (ji cîyên xwe), wan jî gule berdane wan û major (serwan) ê fermanderê Îranî kuştine. Ev bûyera ha, bi serê xwe, mimkun e ku girîngîyeke wê ya sîyasî tunebe, lê ew kurd ji re'yeta Reşîd Beg bûn, ku dibêjin ketîye nav Partîya TUDEH.

3) Çapemenî: Piştî qewîtiya hakim(ê Tebrîzê) ser rojnameyan, ku dûr nîne li ser daxwaza General Konsolê rûsî be, gotareke ciddî ya li dijî ingilîzan di rojnameyên navçeyê de nayê dîtin. Êrişa ser Seyîd Deya-i (Taba Tabayî) berdewam e, lê îşaretê Brîtanyaya Mezin nayê kirin.

Cîgirê General Konsol

Referens. Telgrafa Tehranê, hejmar: 194 ji Wezareta Derve re.

Nusxeyek ji: Wezaretê Derve re.  
Moskova re  
MEMIN Qahîreyê re  
Hukumeta Hindê re  
PAIC re

### **BELGE : 3**

Fo. 317/45440/131005  
20ê Sibata 1945an (1ê Îsfendî 1323yê koçî).

Komek telgraf ji Tebrîzê Sefaretxaneyê (Brîtanya) Tehranê re, hejmar: 29, bersîva telgrafa hejmara 20an a 21yê sibatê Tehran, hejmara telgrafa min: 20.

Nêrîna general konsolosê Sovyetê ya li ser bûyera Mahabadê ev e, ku têkelhevî li ser parvekirina şekir peyda bûye û grûbek kurd ji bo nîşandana nerizayîya xwe berê xwe dane îdareya xelle (tesbît)yê û dema ku li ber derîyê bingehê cendirman re derbas bûne, çend cendirman gulle berdane wan û kurdek hatîye kuştin.

Di miqabilê wê de kurdan jî gulle berdane û pênc cerdirme kuştine û şeşan jî birîndar kirine ku didu ji wan pişt re mirine.

Ez ji çavkanîyeke din dizanim ku ev hedîse di dema belavkirina eşyayên dewletê de qewimî ye. Li gor min cendirman xwestine kombûnê belav bikin û ev jî bûye sebebê qewmandina vê bûyerê.

Cîgirê General Konsol

Nusxeyek ji: Wezaretê Derve re, p. l. 53.

Moskovayê re, p. l. 21.

MEMIN Qahîreyê re, p. l. 31.

Hukumeta Hindê re, p. l. 30.

PAIC RE, p. l. 4.

Referans: Telgrafa hejmara 1944an ji Wezaretê Derve re.

### **BELGE : 4**

Fo. 371/52401/125690



Ev belgeya ha, beşek ji rapora dîrûdirêj a di derheqê rewşa Îranê û navçeya Rojhilata Navîn de ye, ku tenê sê paragrafên wê, yanî paragrafên 35, 36 û 37an peywendîya wan bi Kurdistanê ve heye. Rapor îlava nameke û ji ber vê yekê tarîxa nivîsandina wê li ser tune. Li gor hesaba rewş û şertan ku rapor behs dike, dibe ku di destpêka yan navenda 1946 (1325) an de hatibe nivîsandin. (Enwer Sultani)

## **EŞİRETÎ Û NAVÇEYA KURDISTANA ÎRANÊ**

35) Rapor wisan didin xuyakirin ku, di netîceyê de Komeleya Kurd serî hildaye û Meyanduwaw (J-38-w, ZH 5345) û Bûkan (J-38-w, z 6546) girtine û ber bi Seqizê (J-38-w, zh 6194) heta Sera (J-38-W, ZH 6917) çend mîlek li bakûrê Seqiz xwe bi cî kirine.

Wisan dixuye Îranî li ser tewsîya rûsan jî, ku ji wan re gotine berî xwîn birije padganên (qereqol) Bane, Seqiz û Serdeştê vala bikin, lê ew dixwazin li Salihawayê bimînin (paragrafa 48an kurtebehsa hejmara 251an e).

Çi hal be, padgana Bane û Serdeştê, îhtîmal e ji bo xurtkirina bajarê Seqizê yê gelek stratejîk vala bikin. Padgana Seqizê, hê berî bi saya hêzên navçeyên Başmax (I-38-E, J 9511), Hewreman û Merîwanê hatîye xurt kirin.

36) Mele Mustefa, ku cara dawîyê li Merxûz (J-38-w, ZH 5718) hatîye dîtin (paragrafa 38an -kurtebehsa 251an), niha hewil dide, ku ji alîyê generalekî daxwaz jê hatîye kirin, biçe Bûkan.

37) Nêzîkî 20 aîleyan -ku zêdetirî wan kesên bê çek, jin û zarokên terefdarên Mele Mustefa ne- ber bi Iraqê ve vegeşîyan.

## **BELGE : 5**

Fo. 371/91252/132969

## **MESELA KURD JI SALA 1946an HETA SALA 1950an**

### **ÎRAN**

1946

Di muddetê nivê diduyan a sala 1946an de, qedera kurdên Îranê di nêzîk de, bi çarenivîsa komara xwedmuxtarî ya Azerbaycanê ya di bin hukmê Pîşewerî ve girêdayî bû. Her çend li gor çûn û hatina teblîxateke navbera Pîşewerî û Qazî Mihemmed ê serokê kurdên Mahabadê (binêrê: paragrafa hejmara 21an, ji nameya nehênî hejmar: 17081an), tê dîtin ku tu wextê ne gihîştine qonexeke wisan ku meşandina peywendîya navbera van herdu

hukumetan hêsan bûbe. Lê xerabîya rewşa hundur li Azerbaycanê û daxwazên kurdan ên giran û zexta hukumeta Îranê li ser herdu milan, mimkune bibin sebeb ku ji bo dem û sewdayek jî be li ser kaxezê li hev kiribin. Qazî Mihemmed, meha borî çûbû Tehranê û pişt re hat û ragihand ku li wir hewil daye dexm li hukumeta Îranê bike, ji bo ku wan razî bike “erdê kurdan” heta Şahpûr (Selmas) bê fireh kirin, li hemberê vê, serokwezîr dixebitî ku li kurdan wekî rûniştîyên Azerbaycanê bê nêrîn û li hev hatina 14yê meha borî (bi azerbaycanîyan re), kurdan jî bigre. Çi hal be, hêzên kurdan bi hesaba azerbaycanîyan, ku dihat gotin kontrola Serdeşt, Bane û Tîkab ji aliyê hukumeta Îranê ji wan re hatibû dan, dest danîn ser Urmîyê, lê wekî pişt re tê dîtin, yek ji wan qerarên ku tesîrek wê ya dirêj li ser şert û mercên kurdan hebe, nehatine danîn.

2) Di bihara sala 1946an de, şerên perçe perçe di navbera hêzên kurdan û hukumeta Îranê de qewimîn û wisan dixuya ku Barzanîyên di bin hukmê Mele Mustefa de ew piranîya beşa êrîşkerî li ser milê wî be. Ber bi dawîya havînê, çekdarên Barzanîyan ketibûn nava rewş û haletekî nexweş û dest bi damezrandina destpêka vegera nava Iraqê kirin.

3) Heta meha îlona sala 1946an, nîşanên wê yekê derketin ku Komara Kurdistanê ji ber sebebê nebûna pere û têkelhevîyên giştî tûşî muşkûleyên ciddî hatîye. Serokên kurdan, bi kêmasî bûn sê beş: Yên ketibûn li pê Qazî Mihemmed, yên li dijî wî bûn û muhacirên Barzanî yên di bin hukmê Mele Mustefa de, ku ev kêr û zêde ji herdu milên din cihê ne. Nîşanên peywendîyên nêzîk ên Mele Mustefa bi desthilata Sovyetê re zêdetir tên dîtin. Axayên serbixwe jî her çiqas îlhameke gelek zêde ya bilind di mildaneberîya wan de tune, lê xwe wekî li dijî komunîzmê nîşan didin; Qazî Mihemmed jî û Mele Mustefa jî li ser zemîne lihevkirina (komunîzmê) bi Îslamîyetê re, rengê eynî tiştî bi wan ve tê dîtin, lê bi tu awayî ew dudilî û weswesetîya exlaqî, pêşîya wergirtina ew çek û pere nedigirtin ku ji aliyê rûsan ve ji wan re dihat yan bi wê piştvanîyê, sînorek wisan di dema hezkirina Qazî Mihemmed ji aliyê rûsan ve, bihata danîn.

4) Rewş û şertên Azerbaycanê bi awakî siruştî tesîr li ser şert û mercên kurdan kir. Gotûbêjên dûr û dirêj yên di navbera demokratên Tebrîzê û hukumeta Îranê gihîşt wê netîceyê ku hinek mafên bi muxtarîyetê sînorkirî ji wostana Azerbaycanê re hat dan, lê domandina dijîtiyan ji aliyê hukumeta Tebrîzê bi mesela kontrolkirina wan ji Tehranê ve, bûye sebebê wê ku (dewleta Îranê) bi naçarî dest bi têkilîyên eskerî bike. Çavtirsîya rûsan ji vê tehlîkeyê, ku ji wan we ye karekî wiha, dê bi xwe re netîceyek ciddî bîne, ji aliyê hukumeta Îranê ve hatîye piştguh kirin û di 12yê meha kanûna pêşî Tebrîz hat girtin. Bersîva terefdarî û wefadarîya azerbaycanîyan ji Şah û serokwezîr re hatin şandin û Pîşewerî baz da û çû Rûsyayê.

5) Heta ew dem, alîkarîyên desthilatdarîya Sovyetê ku ji bo rêvebirina tehdîdên xwe tu tesîr nekiribûn, bi temamî ji Qazî Mihemmed teksîratî kirin û wî xwe li bajarê Meyandiawawê teslîmî fermanderê (leşkerê) Îranê kir; dewleta wî jî ber bi jêr û ber bi hilweşînê ve dimeşîya. Qazî, li Mahabadê mehkeme kirin û bi hejmarek giregirên hevfiqrên xwe re di destpêka meha sibata sala 1947an de hat îdam kirin<sup>3</sup>.

6) Îhtîmala serevtina dewleta Îranê ya li dijî kurdan, hîseke gelek nerehet li Bexdayê pêk anîye. Mele Mustefa tu wextê jî mejîyê dewleta Iraqê derneketîye û dûr jî nebû ku dema ji Îranê ber bi Iraqê ve diçû, ji nû ve bibe sebebê têkelhevîyek di nava eşîretên kurdan de. Ji ber vê dexm li hukumeta Îranê kir ku ji bo Mele Mustefa û yên ji leşkerê Iraqê baz dane û pê re ne, bigrin û bidin destê wan. Mele Mustefa, di destpêka kanûna paşî ya sala 1947an de, xwe teslîmî desthilata Îranê kir û ew birin Tehranê û eynî wextî piraniya hevalên wî li Nexedeyê mabûn, demek li wir di bin çavdêriyê de ma. Hukumeta Îranê qet meyleke bi wî awayî nîşan neda ku wî teslîmî Iraqê bike, lê jê re pêşniyar kirin ku û xwe û hemû Barzanîyan, eger hemû jî nebe, sed kes ji giregirên hevalên wî, şansê wan heye ku bibin hevvelatîyên Îranê û ji erdê Şah, nêzîkî 30 mîl başûrê r ojhilata Tehranê bèn cî kirin. Şeş meh jî ji aliyê dewletê ve alîkarî ji wan re bê kirin. Eger van pêşniyaran qebûl nekin, dê ew ji Îranê bèn derxistin, lê çekên wan ji wan nayê sitandin û ew teslîmî hukumeta Iraqê jî nayên kirin. Mele Mustefa pêşniyara cîbûnê qebûl nekir û di dawîya meha sibatê, berê berf rabe, ew û hevalên xwe bi hêminî ber bi başûr û sînorê Iraqê ve paşde kêşîyan, eynî wextî leşkerê Îranê jî li pê wan bû. Heta heystê adarê gihîştin deştê Mergeverê, wisan dihat dîtin ku her eynê bi wê rîya li ser Tirkîyê re, ku di çîrya pêşî ya sala 1945an tê re hatibûn, vegehin Iraqê. Lê piştî hefteyek, rapor gihîştin me ku cardin paş de vegehiyane û bi leşkerê Îranê re dest bi şer kirine. Çi hal be, di dawîyê de li wan xistin û ew ber bi sînorê Iraqê ve birin, Mele Mustefa bi xwe bi hejmarek hevalên xwe ve baz dan û ketin nav erdê Sovyetê (gulana 1947an).

7) Rewşa bakûrê rojavayê Îranê di dawîya sala 1946an de, di nav sergêjî û muranê de bû. Leşkerê Îranê, ku Serdeşt, Bane û Seqiz di destan de bû, xîmê destpêka çekkirina eşîretên kurdan danî. Hetta berê ku Qazî Mihemmed teslîm bibe, bi berdeambûna desthilata bi ser eşîretên kurd ên bakûrê rojhilat de, bi guman bû. Piraniya serokeşîretên Mameş, Mengûr û Dêbûkrî biryar dabûn ku berê xwe bidin hukumeta Îranê, lê wisan dixuya ku eşîretên kurd di nav xwe bi xwe de jî xwedîyê helwestên cihê bûn.

1947

8) Ber bi dawîya meha hezîranê de, êdî Mele Mustefa dest ji durûskirina janeserîyan ji hukumeta Îranê re kêşa bû. Di meha îlonê de piraniya eşîreta

wî, erdê Îranê terk kiribûn, Mela bi xwe jî bi grûbek kê m ve, ku şeş zabitên ji leşkerê Iraqê bazdayî nav de bûn, rîya Azerbaycana Sovyetê girt û çû wir. Berî dawîya meha gulanê orfî îdare li Kurdistanê hat rakirin û rapor gihîştin me ku karê çekdarkirinê baş pêş de çûye. Şah, efûyeke giştî ji hemû wan eşîretan re derxist ku têkelê dijminatîya wî bûbûn. Ji sala bê re, rewşeke tije aştî xwe bi ser navçeyê de berdaye.

9) Hêvî heye ku heta sala 1948an Mele Mustefa dixwaze bi hêzekê vegere Iraqê, ev xeber car carnan ji aliyê xelkê ve tê gotin. Çi hal be, şert û mercên hundurê Kurdistanê Îranê hêmin e -ji bilî wê hereketa ku li dijî Ciwanrûyan hat meşandin- ew jî ji ber sebebê wê rastîyê bû ku qasek şûn de tu deng û behsek jê derneket. Ev bûyer xwedîyê girîngîyeke wisan nîne.

## 1949

10) Di destpêka sala 1949an de, ji ber sebebê belavkirina hinek materyalên propagandeyê ji aliyê kurdên Demokrat ve (îhtîmal e ji aliyê Rizgarî ve be) gavek ji bo jîyandina tevgera nasyonalîzma kurdî daye avêtin. Desthilata Îranê, di meha sibat, adar û nîsanê de dest bi girtina xelkê kir -karek ku peywendîya wî bi xeberê wê bûyerê ve hat girêdan, ku guya meha sibatê ji bo kuştina Şah hatîye tesbîtkirin. Her çend Eşîreta Celalî û Şikakî dijîtîyên xwe yên li hemberê hukumeta Îranê nediveşartin, lê tu nîşanek di dest de tunebû ku kurdan ev karê han ê şaş kiribin. Çi hal be, wisan dixuye hejmarek ji endamên eşîretên kurdan ji bo sitandina toleyên xwe yên şexsî, di nezdê desthilata Îranê de ji bo xerabî (ya eşîretên din) ji wê şaşîyê îstîfade kiribin.

## 1950

11) Di zivistana sala 1949-1950an de, hêminîya (navçeyê) hat parastin û ew çaverîya bilind ên di mehên destpêka sala 1949an a di derheqê têkelhevî û alozîyan de lem avêtibû, berê havînê deng jê derneket. Heta Komele (ya Hêwa) jî tu emarêyê çalakîyên xwe nîşan neda. Zivistan ji eşîretan re xekek tengasî neanî, xelk çaverîya hasilateke baş dîke.

12) Partîya Kurdî Misilman, li Tehranê dîqçetê kêşa ser xwe. Ev partî ji aliyê hinek serokeşîretên naskirî ve hatîye damezirandin, ku meha gulanê ji bo beşdarîya merasîma anîna ter mê Şah a Îranê hatibûn Tehranê. Lê pişt re tu xeberek ji wan ji çavkanîyeke din nehat sehkirin.

13) Raporeke balkêş a li ser bingehe nêrîna du casûsên ceribandî yên ingilîz, ku di meha tebaxa sala 1950an de bi awakî serbixwe di nav Kurdistanê Îranê de gerîyabûn, fikir û hîsa wan a li ser helwesta kurdan, bi van çend gotinên xwarê nivîsandine:

a) "Hemû nûçevanên me yên ji navçeyên kurdnişînî yên bakûrê Seqizê, bi

awakî bingehîn, xeberên terefdarî(ya xelkê) yê di derheqê serxwebûnîya Kurdistanê digihînin me û sebebê vê tiştê jî bi cihêtiya nijad, fesad, zulm û zorîya hukumeta Îranê û zabitên leşkerê ve girê didin, ku li gor gotina wan, terefdarên meşandina bernameyên pêşkevî li navçeyên kurdnişîn nîne û bi darê zorê pêşîya bernameyên bi vî awayî digrin.

b) “Bi ser toretîyeke (xeydek) bêguman, ku ji wê akarê hatîye nivîsandin, tu nîşanek nayê dîtîn ku bernameyek hatî danîn an rêxistineke girîng bi armanca temînkirina serxwebûna navçeyê pêk hatibe. Perspektîfa desthilata leşkerî ya Mahabadê jî her wiha ye. Ji wê jî zêdetir, tu nîşanek ter efdariya Kurdistanê mezin, behs û xeberek di derheqê problema kurd li Tirkî, Surî û Iraqê, di nav hevzimanê wan ên kurdên Îranê de nayê dîtîn.

c) “Li navçeya bakûrê Seqizê, nerazîya xelkê ji karbidestên Îranê, wekî nerizayîya pîranîya navçeyên bakûr bû, lê li vir, di cîyê pêwistîya serxwebûnê, li ser vê meseleyê hewil dihat dan ku karbidestên Îranê bi vê meseleyê bîn agahdar kirin. Serîlêdana Şah a vê dawîyê li navçeyê, netîceyek baş bi xwe re anî, lê ev gelek girîng e ku ew sozên Şah dane wan, netîceyek jê bê sitandin”.

14) Di meha gulanê de, hinek bingehên eskerî li navçeya Ciwanrû hatin damezirandin. Wê wextê wisan dihat zanîn ku ev karê ha beşek ji sîyaseta giştî ya ji bo hêzkirina amadebûna eskerî di nav eşîretên kurdan de be. Çi hal be, bi zahîrî piştî li hev reşandineke piçûk di navbera Eşîreta Ciwanrû û Îmamî de, fermanderê navçeyê yê leşkerê biryara çekkirina herdu milan dabe. Eşîretan ewqas zêde tiving nedane dest (ku ji wan hatibû xwestin) û di diduyê îlonê de êrîş birin ser bingehê leşkerî ya li Pilingan. Çend eşîretên dijminê Ciwanrûyan alîkarîya leşkerî kirin û hereket di destpêka meha çirya pêşî dawî lê hat û gihişt netîceyê û eşîretan sedan tiving teslîm kirin. Ev bûyer ji aliyê radyoya Rûsyayê û hinek rojnameyên derve gelek hatîye mezin kirin.

## IRAQ

1946-1947

15) Hereketê li dijî Mele Mustefa, ku wekî beşeke karê rêxistinî ya ji nû ve yê Azerbaycanê ji aliyê desthilata Îranê ve hat meşandin, berê bi kurtî behsa wê hat kirin. Bi ser tirseke dayîmî ya ji vegera Barzanîyan û tîkelhevî di Iraqê de, wisan dixuye Barzanî bi xwe jî ji tecrûbeyê Îranê û ew zerarên ji leşkerê Îranê dîtîn, derseke baş wergirtibe. Beşek ji wan a berçav di sala 1947an de dest pê kirin û vegeriyan Iraqê û ew nimûneya ku ji bo vegera bê şert û şurût hatin danîn, ji aliyê wan kesan ve, ku pişt re divegeriyan jî hat qebûl kirin. Desthilata Iraqê bernameyek hişyarî ji bo vegera wan pêk anîbû, ku efû piştî wê hat û efû jî bêyî rexneyên rojnameyên Bexdayê neçû serî.

Wisan tê zanîn ku hejmarek gelek zêde çek, berê vegera penaberan ji sînor

hatibin derbas kirin an ji kar xistibin. Nêzîkî şeş hezar însan, jin û zarok di vegerê de navên xwe dan nivîsandin. Çar zabitên leşkerê Iraqê jî teslîm bûn, ew hatin mehkeme kirin û di 9ê meha hezîranê de hatin îdamkirin.

## 1948

16) Di mehên mayîn ên sal(a 1947an) û seranserê sala 1948an de rewşa Kurdistana Iraqê hêmin bû. Hêvîyên di derheqê Mele Mustefa ya ku dê zû vegere, di despêka salê de dihat sehkirin û şansê, ku mimkun e Mela ji tecrûbeyên leşkerî û şer û têkelhevîyên Filistînê îstîfade bike, tirsîsa hukumetê zêdetir dikir.

Çend têkelhevîyên yek di pê yekê de, ku di meha sibat û îlonê de ji bo nerizayîya xwe ya di derheqê Peymana Portmosê de dan nîşan û vê bi xwe re damezirandina hukumete eskerî anî. Di rastîya xwe de ev temamkerê xwepêşandanên Silêmanîyê bûn û di wan de zemînê nasyonalîzma kurdî nedihatîn dîtin.

## 1949

17) Di sala 1949an de, tu faalîyetên eşîretan nehatin dîtin. Xeberên ew peymanî di navbera Mele Mustefa û axayên giregir(ên kurdan) ên Iraqê de ku belav dibûn, tişteki adetî bû. Lê di cîyê vê de, çîrokek di derheqê perwerdekirina bi paraşûtê xwe avêtin li Iraqê belav bû û hetta hat gotin ku şeş kesan xwe avêtine. W isan tê xuyakirin ku kesên çavkanîya îlhama van xeberanin, bi xwe hêvîya careke din a vegera Mele Mustefa û carekê din bi Iraqê re danîna peywendîyan betilî bin û hîs kiribin ku pêwîste di xeyalên xwe de hinek behs û xeberên şêrîntir çêkin. Çi hal be, hukumeta Iraqê di meha gulanê de bi awakî rasteqînî li hêvîya vegera Mele Mustefa ya hinek zûtir hat agahdar kirin, lê hat dîtin ku ev xeberê ha xwedîyê zemînek nebû, sal bêyî tirseke zêdetir xelas bû.

## 1950

18) Di navbera meha nîsanê û hezîranê de, çîroka peywendî danîna Mele Mustefa bi hejmarek zêde serokeşîretan re û her wiha bi qaçaxî hatina çekan ji Îranê ji bo Iraqê belav bûye. Di meha tîrmehê de, xeberên vê çîrokê jî ji aliyê polîs ve hatin ragihandin ku guya Mele Mustefa hewlê wergirtina îcazeya derbasbûna di erdê Îranê re daye. Rapor vê jî li ser zêde kiribû, ku jê re hatiye gotin, dibê ew û derûdora wî bê çek bikevin nava Iraqê, lê ev şert qebûl nekirîye. Gumaneke kêma di wê de heye ku Mele Mustefa peywendîyeke dayîmî bi kesên dost û nasên yê li Iraqê ne, hebe, lê xeyala di derheqê vegera wî ya li Iraqê, girîngîyeke wê tune û ev jî eynî wekî salên borî ye.

19) Îsal, şikestina nezm û qanûn li wilayetên Mûsil, Hewlêr û Silêmanîyê, radeya adetî ya navçeyê zêde nebû. Meselek nebe, ku ew jî karê Xolepîze bû -çeteyek ku xwe ji dest bi serdagirtineke heyşt salan rizgar kiribû. Rabûna Xolepîze ya di sala 1949-1950an de, dîqqetekî ji hesabê der ê xelkê kêşa ser xwe û li wilayeta Silêmanîyê wekî Robîn Hodê kurd lê dihat nêrîn. Dihat gotin ku ji alîyê Şêx Babe 'Elî û Şêx Letîfê kurê Şêx Mehmûd ve pişgirîya wê tê kirin. Ji ber dirêjkêşana bûyerê û xwe parastina Xolepîze, heyayê hukumetê çû.

20) Ji ber sebabê serîlêdaneke zêde li ataşeya sefaretxaneya Dewletên Yekgirtî yên Emerîkayê -ku di bin perdeyê de nebû, tu wextî nasyonalîzma kurdî li Hewlêr û Silêmanîyê, evqas nehatibû teşwîq kirin. Girişî pêdana rojnameyên Emerîkayê û çûna Şêx Babe 'Elî ya Emerîkayê, ku beşeke xwendina xwe li wir temam kir, îşar etê wê rastîyê dikin ku armanca Dewletên Emerîkayê yên Yekgirtî ew e ku di warê terefdarîya kurdan de pêşîya rûsan bigre.

#### WELATÊN ROJHILATA NÊZİK (LEVANT)<sup>4</sup>

21) Wekî ku di rapora dewreya pêşî de hatibû behs kirin, li Lûbnanê civatek kurdan a piçûk heye û xwedîyê girîngîyeke kêma e. Lê bajarê Beyrûtê, ji ber sebabê ew rastîya ku cîyê lêmayîna Kamûran Alî Bedîrxan e û ew jî wekî birayê xwe bi tevgera nasyonalîstî ya kurdî ve mijûl e, cîyekî balkêş e. Çi hal be, merkeza serekî ya tevgerê li Cizîrê ye ku Dr. Ehmed Nafîz ê xelkê Qamîşloyê -başîrîn nûnerê armanca kurdan e- li wir e.

1946

22) Bûyerên Îranê, bi awakî tabîî kurdên Surîyê teşwîq kirîye. Lê di seranserê sala 1946an de, her çend çalakîyên wan di nav senetkarên bajaran ên sîyasetvan de mabe, lê tesîreke kêma jî li ser civaka Sûrîyê kirine. Ji bilî bangeke bê bersîv, ku di derheqê civîna kurdan a li Mekkeyê ya di muddetê hec de (ku berpîrsîyarê wê Bedîrxan bû), sal bêyî bûyereke ku hêjayê behs be, xelas bû. Wisan dixuye hîsa xelkê ya giştî ya ji ber sebabê hîsa dilsarbûna ji bûyerên Azerbaycanê û dilêşîya wan ji rûsan ku piştî kurdan berda, heye.

Di adara sala 1947an de, Dr. Nafîz nameyek ji Mr. Bevin<sup>5</sup> re nivîsand û bala wî keşa ser dîr oka kurd a piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û qetlîama wan ji alîyê wan welatên ku kurd tê de ne. Wî nameya xwe bi van pêşnîyaran dawî lê anîye: Di netîceyê de ew awa hereketên bi kurdan re ku tên kirin, gerek e ecêb neyên dîtin û serzenîşt lê neyên kirin, ku eger lawên kurd di cîyê hîsa bi hev re ya nihêlîzmê û bê hêvîtiyê, xwe bidin tund û tûjiyê û domandina zebr û zorîyê.

1947

23) Tenê guherînek balkêş di sala 1947an de hat dîtin, ew jî li gor raporek, pêkhatina tevgerê hevkarîyê di navbera kurd û asûrîyan de bû. Her çend wisan dixuye ev tevger bi nehênî ji alîyê Xalid Bektaş ve -serokê komunîstan-hatibe teşwîq kirin, ku ji sala 1946an pê ve li ser milê nasyonālîzma kurdî derketîye, lê eşkereye ku ji qonaxa daxwazan derbas nebûye.

24) Gavê hukumeta Surîyê ya di derheqê muracaata şeş kurdan ku bi dilxwazî xwestine li Filistînê (dawîya sala 1947an) şer bikin, ji alîyê serokên kurdan ve pêşwazî lê hat kirin.

1948

25) Di destpêka sala 1948an de, Dr. Kamûran Alî Bedirxan ji Swîsreyê vegeîya Beyrûtê. Li gor raporê, gotîye ku, ew di asoyeke dûrtir li mesela kurdên Surîyê û çalakîyên ji bo hemû kurdan dinêre.

1949

26) Celadet Bedirxan gotîye ku, biryar heye di gulana sala 1949an de li Beyrûtê konferansek bê çêkirin. Bi vê munasebetê îşaretê du rêxistinên kirîye ku navê yek ji wan Yekîtiya Partîya Kurdan û ya din jî Partîya Demokrat a Kurd e. Ronî nîne ka gelo ev herdu navên nû yên Wefdê Kurd û Encûmenên Selaheddîn in ku me di rapora berî de behsa wan kiribû an jî du rêxistinên bi temamî nû ne. Her çend wisan dixuye ku Celadet Bedirxan bêyî sekin mijûlê çalakîyan e, lê ev jî tê dîtin ku di nav xelkê de ji Haco Axa, Dr. Nafîz, Qedrî Cemîl Paşa û serokên din ên Cizîrê xwedîyê nîfûzeke kêmtir e, ku peywendîyek wan a nêzîk bi hevvelatîyên wan re heye. Wekî faktek di meha îlona sala 1949an de, raporek gihişt destê me, ku dibêje: nesla xortir rexne li wan girtine (yanî li Celadet Bedirxan) ku berê wî li Tirkîyê û hêzên rojavayî ye -rûdanek ku xwe bi eşkere û wekî perspektîfeke taze dide nîşan.

1950

27) Her çend endamên hukumeta Surîyê di van dawîyan de di derheqê tehdîda mesela kêmatîya kurd ji dewletê re û vegera wan ber bi komunîzmê daye nîşan, lê çalakîyên kurdan wê yekê nadin nîşan ku ber bi zêdebûnê de ne.

## TIRKIYE

28) Di rapora pêşî de (nehênî, hejmar: 17081), bi tevayî behsa şert û rewşa Tirkîyê hatibû kirin. Di vê muddeta çar salên borî de, guherîneke kêmtir di rewşê



de çêbûye. Di sala 1949an de, rojnameyên kurd dîqetêke kêma kêşane ser mesela kurdî û wisan dixuye bi rastî jî jîyaneke kêma hîsa neteweyetîya kurdî li wilayetên rojhilatê tê dîtin.

Desthilatdarîya tirk, her çend tê zanîn ku hinek mezinkirî jî be, ew perspektîfa ku li ser dimeşîyan dan ragihandin, ku mesela kurd di nava xwe de çareser kirîye. Eger bê û hukûmeta Iraqê kontrola wilayetên xwe yê kurdnişîn ji dest der xe yan jî êrîşek ji aliyê Sovyetê ve li ser Tirkîyê bê kirin, wisan dixuye dê kurdên Tirkîyê niha jî bikarin janeserîyê durûst bikin.

29) Di helbijartina giştî ya sala 1950an de, Demokratîkî pîranîya dengên rojhilata Tirkîyê sitandin, lê nîşanên wê nayên dîtin ku nûnerêk bi nasnameya (îdentîta) kurdî hatibe helbijartin. Li gor gotina wan kesên ku van dawîyan serî li navçeyê dane, qanûn û nîzameke rizamendî ji aliyê hukûmetê ve hatîye damezirandin û bernameya “tirkkirina” kurdan heta dereceyek zêde hatîye piştguh kirin.

## **DOZA JI NETEWYÊN YEKGIRTÎ Û ... TIŞTÊN DIN**

30) Dozek ji aliyê rewşenbîrên kurd ve: Mihemmed Hilmî Beg ê rûniştîyê Misrê, ku xwe wekî nûnerê Partîya Demokratîkî a Neteweyê Kurd daye nasîn; Şerîf paşa, ku gelek salan li Fransa û Îtalyayê jîya ye û di muddetê dema temînkirina aşî ya piştî Şerê Cihanê yê Yekem de, şexsîyetekî naskirî bûye; Dr. Nafîz, xelkê Qamîşliya Suriyê ye; Kamûran Alî Bedîrxan û Nûreddîn Zaza pêşkêşî Şûraya Wêzîrên Derve (1947) û Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî (1948) kirine. Ev kesên navên wan derbas bû, peywendîyên wan bi Heyeta Kurd a Parîsê re heye ku li wir bi navê Bûltena Merkezî ya ji bo lêkolîna mesela kurd kovarek derdixin. Vê heyetê, di 13yê îlona sala 1950an de, nerizayîya xwe li hemberê hereketê hukûmeta Îranê ya li dijî Ciwanrûyan, ji Neteweyê Yekgirtî û yek bi yek dewletên endam re ragihandin.

## **KOMUNÎZM Û KURD DEWLETÊN ROJHILATA NÊZİK (LEVANT)**

31) Gumanêke dilxweşî ya di sewîya têkelbûna serokên kurd di nav dewletên Levant, ji ber sebebê tehrîka Sovyet Rûsyayê, karekî hêsan nîne. Di vê muddeta ha de (di navbera salên 1946 û 1950an de) gelek raporên di derheqê peywendîyên navbera Bedîrxanîyên bira û nûnerên siyasî yê Sovyetê gihiştine destê me. Her çend Bûltena Parîsê xwedîyê deng û sedayekî li dijî komunîzmê ye, lê di van dawîyan de çend maqale weşandine ku tê de bala rûsan a ji bo ziman û dîroka kurdan dane xuyakirin û bi awakî terefdarî bi kêmmeylîya rojavayê ve muqayese kirîye. Di milekî din de gotîye ku, Celadet Bedîrxan yek ji wan kesê dijê komunîzmê yê tund û tûj e û wisan dixuye

piranîya serokên din jî xwedîyê eynî fikran bin. Çi hal be, gumaneke kê m di wê de heye ku kurdên xorttir ên Cizîra Sûrîyê yên ji aliyê Sûleyman Haco Axa ve serokatîya wan tê kirin, terefdarên temam ên komunîstan bin; rapora hevkarîya vê grûba ha bi ermenîyên komunîst re jî gihîştîye destê me. Gelek nîşanên wekî jîyana Xoybûn didin xuyakirin ku yekîtîya kurd û ermenîyan heta dereceyek zêde awayekî resmî be. Lê (Xoybûn) hemû wextê di nav peywendîya ermenîyên Daşnak de bû ku ew jî bi awakî sirûştî çiqas li dijî tirkên in, ewqas jî dijîtîya Sovyetê dikan.

32) Borî û her wiha rewşa niha ya kurdên Sûrîyê bi waletên din ên kêmayetîya kurd tê de dijîn, mîzanî nîne û hereketê kurdên Sûrîyê netîceya sirûştî ya van faktoran e. Ji bilî serokên bi salan ve çûyî, kurdên Şamê û bajarên din ên rojavayê Sûrîyê, dîqetek kê dane bûyerên kurdî. Ji wan, karbidest, zabîten leşkerê û parlamentê derketine, lê li ser hinek ragihandinên şaş ên ji aliyê serokên ereban ve, mimkûn e bê gotin ku bi “temamî” wekî qanûnek, bi awakî kêmtir di bin tesîra propagandeya nasyonalîstî ya kurdî de lê bê nêrîn. Di Cizîrê de -bi hejmar, nisbeten piranîya wan penaberên milê din ê Tirkîyê ne, ruhê netewayetî di hejîne de ye. Di eynî wextî de, Cizîr sengerêke xurt a kurdan nîne û nazikî dixê ser biçîma astenga rîya serhildanê û zemîn ji serokan re xweş dike heta li ser qanûnên hukumeta Sûrîyê bimînîn û ew roj ku şer(ê navbera Rûsya û Tirkîyê?) firseta tolesitandinê dibexşîne tirkên û serkevtina Sovyetê, serxwebûnî ji wan re misûger dike, kar bi wan re bikin.

Sirûştên objektîf pêwistîyeke kê m ji bo tehrîk kirin ji aliyê memûrên ve hatiye. Nebûna tecrûbeyên wan bi xwe di derheqê desthilatdarîya Sovyetî jî wisan lê kirîye ku amadeyê wergirtina qîmeta bi biçimî ya propagandeya Sovyetî bin û her wiha ji ber sebebê helkevtina cîyê wan li nêzikî sînorê Tirkîyê, dûr nîne bikevin bin tesîra bi tevayî her axaftina beravek wisan ku nekare li ser hesaba tirkên helbijartinek bike. Kurdên Sûrîyê, bêyî hebûna sînorê eşkere yê eşîretî, tiştên din ên bi wî awayî, tenê dikare xwedîyê çaverîyeke kê m a ji bo xwedmuxtariyeke navçeyî ya di nav humûmeta Surîyê de be.

## IRAQ

33) Raporên van dawîyan ên di derheqê hereketê eşîretên kurdên Iraqê de, cîyê dilxweşîyê ye. Terefdarîyek fireh ji Mele Mustefa re nayê kirin; hejmarek serokeşîretên kurdan ku xwedîyê giringîyeke zêde nînin, terefdarîya hukumetê yan jî ya Brîtanîyê dikan. Tu nîşanek jî tune ku propagandên Sovyetê tesîrî wan bike. Di rapora “Navçeyên Eşîretên Rûniştî Yên Iraqê” de, kêmbûna nîşanên ji bo propaganda Sovyetê bi xwe, dîqet dikişîne û raporên di derheqê aktîvîteyên Mele Mustefa, haletê kêmtir giring cîyê wan girtîye. Desthilatdarên Iraqê, bi awakî eşkere nerehet in ku mimkûn e kurdayetî ji propagandeya

komunîzmê jî zêdetir ruhê kurdan ê şoresgerê zindî rabigire.

Hewayê bajaran, bi taybetî yê Silêmanîyê kêmtir silamet e. Partî (Lîqa Partîya Demokrat a Kurdistanê), li wir, Hewlêr, Kerkûk û Rewandîzê gelek aktîf bûye. Partîya Rizgarî Neteweyî (Hizb El-Wetenî El-Tehrîr) jî, ku peywendîya wê bi Partîya Demokrat a Kurd re heye, karê xwe berdewam kirîye. Komunîstên Bexdayê, wisan dixuye nifûzeke zêde li herdu milan kirîye, ji ber wê heta mejîyê endaman de cihêtiyek di navbera armancên wê yên serekî -ku ji azadî û demokratîzekirina Kurdistanê pêk tînin- û armancên nêzîk de, ku diyarîkirinên komunîzmê ne, zelal nîne. Ev, ne wisan e ku tenê ketibin bin tesîra komunîstên Bexdayê, belko demokratên kurdan an paşvemayên wan ên li bakûrê Îranê jî, bi eşkere îlhama xwe ji Sovyetê distînin û ew materyal ji aliyê wan ve ji wan re tê dan. Lê endamên van grûbên ha jî -wekî yên sê grûbên din, wisan ketine bin zexta polîs, girîngîyeke wan a wisan tune, zêdetir mamoste, xwendevan, dikandar, karbidestên defterî(?) û karmendên xort in. Nifûza van kesan kêmtir e, lê eger ji bajaran derkevin, her wekî ku berê jî ev kar kirine, mimkûn e têkelhevîyan peyda bikin an jî di nav karkerên kompanya petrola Iraqê û wezaretên dewletê de asayîş xera bikin. Her gawek wiha, her çend bi navê nasyonalîzma kurd bigihe netîceyekê jî, lê di rastîya xwe de bûyereke bê kêmasî komunîstî ye. Ev jî pêwîste bê gotin ku nabe çaverîya wê bê kirin ku ev grûbên ha gaveke ciddî û îcabî ji bo mesela nasyonalîzma kurdî bavêjin, lê hemû wextê komunîst dikarin bi awakî ciddî tesîr li ser bikin.

## İRAN

34) Faalîyetên Sovyetê yên di nav kurdên Îranê de, ji bilî weşanên radyoya Êrîvanê û radyoya Demokratên Azerbaycanê -ku çiyê wê baş nayê zanîn, car û caran û li gor şertan bi rê ve diçe. Kontrola desthilatdariya Îranê li ser navçeyên çiyayî yên Kurdistanê, niha jî xurt nîne, lê ketina casûsên Sovyetê nav wan a bi mebesta berdewamkirina qîmeta peywendiyên kurdan bi Sovyetê re, mimkun e gelek degmen jî nebe. Ji şepçeyên tevgerê tînin di nav Sovyet hewleke zêde ya alîkariya ji bo kurdan, heta qasî alîkariyên sala 1946an jî nedabe. Bi awakî eşkere tu piştgirîyek ji aliyê Sovyetê ve ji Ciwanrûyan re nehat kirin û nîşanên wisan jî di dest de hene ku navçeyên başûrê Sîne û Kirmanşanê, bi tu awayî faalîyeteke komunîstî tê de nayê dîtin. Her wiha nîşanê wê jî hene ku ji bilî Şîkakî û Herkîyan, ku di muddeta şer û piştî wê jî, ji ber sebebê dest bi serdegirtina navçeyê ji aliyê Sovyetê ve, ji rê derketibûn, lê propagandên Sovyetê yên van dawîyan tu tesîr li ser eşîretên kurdan nekirîye. Nimûneya semereya (eşîreta) Feyzûllahbegî, ku ji aliyê konsolê 'Ela Hezretê Şah (ê Brîtanya) li Tebrîzê hatîye behs kirin û serokeşîr etan di dema rejîma Demokrat de, erdên xwe bi ser eşîretan de belav kirine, ji aliyê

tu eşîran îta'et lê nehatîye kirin û gelek dûr tê dîtin ku di dahatû de jî îta'et lê bê kirin.

35) Ew zimanê tund û tûj û ji hesabê der ê di weşanên radyoya kurdî de jê tê îstîfade kirin, nîşana berdewama meyla Sovyetê bi Kurdistanê û haletê niha yê destragirtina Sovyetê ji zêdetir desttêkirina nav beşa Kurdistanê Îranê ye, ku qebûl û pesneke zêde jî jê re heye û ev nîşana rêzlêgirtina Sovyetê ji wê rastîyê ye ku çî wextê hêzên Sovyetê bîn navçeyê û çek û pere li eşîretan belav bike, dikare eşîretên kurdan têxe nava dilxwazîya xwe. Îmkanên Sovyetê ya ji bo ragirtina kurdan di wê rewşê de, heta dereceyek gelek zêde bi îmkana parastina mezintîya navçeya xwe û berdewama şandina materyalan ve girêdayî ye

Beşa Lêkolînê ya  
Wezareta Kar û Barên Derve  
Duyemê Nîsana 1951an

Wergera ji Soranî:  
Zîya Avci

---

### Têbinî:

1. Mimkun e mebest civîna Komeleya J. K. be.
2. Dibe ev kovara Niştîman a organa Komeleya J. K. be, ku hejmara wê ya yekê di meha pûşewera 1343 (hezîran 1322yê koçî) derketîye û hejmara wê ya dawîyê jî (ya nehan) sê meh berê sefera Lambton hatiye weşandin. Rojnameya Kurdistan, organa Partîya Demokrat a Kurdistanê jî, salek û sê meh piştî sefera Lambton, di 15yê kanûna pêşî ya sala 1945an de hejmara wê ya yekem derketîye (Wêrger).
3. Pîşewa Qazî di 31yê meha adara 1947an de hat şehîd kirin.
4. The Levant States
5. Mr. Bevin, karbidestêkî sefaetxaneyê Emerîkayê ya Îranê bû.

# Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewropa

Zinar Soran

**L**i gor agahdariyên Qedrî Cemil Paşa ku di pirtûka xwe ya "Doza Kurdistan"ê de dinivîsîne di sala 1913an de, li Swîsreyê, bajarê Lozanê liqê *Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî* hatibû damezrandin. Ev, ji aliyê Ekrem Cemîl Paşa, birayê wî Şemseddîn Cemîl Paşa, Babanzade Reçî Nuzhet û Selîm Sabitê Dêrsimî ve hatibû ava kirin. Piştî demeke dûr û dirêj, xwendekarên kurdan yên li Ewropayê, di sala 1949an de, li Swîsreyê, li bajarê Lozanê bi navê "*Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa*" (KXKE) komeleyek damezrandin. Ev komele ji aliyê Dr. Nûreddîn Zaza û pênc hevalên wî ve hatibû damezrandin. Dr. Abdurahman Qasimlo û birayê wî Ehmed jî tevî wan bûn. Di kongreya ku li Lozanê hatibû çêkirin de, Nûreddîn Zaza weke serokê komeleyê tê hilbijartin û biryara derxistina kovarek mehane ya bi navê "*Dengê Kurdistan*" tê girtin.

Kovara "*Dengê Kurdistan*"ê bi kurdî, îngilîzî û fransî dihate weşandin. Li gor agahdariyên ku Dr. Nûreddîn Zaza dide; derxistina vê kovarê li Swîsreyê qedexe bû û loma jî endamekî komeleyê kovar li Parîsê teksîr dikir. Lê partiyên kominîst yên dewletên ku Kurdistan di nav xwe de dabeş kirine, ji vê xebat û têkoşînê nerehet dibin. Bi taybetî partiya TUDEHê ji bona rawestandina çalakiyên komeleyê dikeve nav hewldaneke taybetî. Ji ber vê yekê, nexweşî dikeve nav endamên komeleyê û komele nabe xwediyê jiyanê dirêj. Herweha tenê 12 hejmarên kovara "*Dengê Kurdistan*"ê têne weşandin. Li ser vê rewşê Dr. Nûreddîn Zaza weha dinivîse:

*"Dewletên ku serdestiyê li Kurdistanê dikin û kominîst partiyê wan bê ku bi derengî kevin li dijî serketina me derketin. Ev partiyên ku îlhama xwe ji reçeteyên Stalîn digirtin, hebûna komeleya me li dijî yekitiya çîna karker*

*didîtin û ji holê rakirana wê pêwîst didîtin. Pêkanîna vê wezîfeyê Partiya Kominîst ya Îranê TUDEH dabû ser milên xwe. Endamê me yê ku li Parîsê bû û endamê TUDEHê bû, kirin aletê vî tiştî”<sup>1</sup>.*

Ji bona gotûbêjên li ser vê rewşê û pêşeroja komeleyê, li Lozanê kongreya komeleyê tê civandin. Ew endamê komeleyê ku endamê TUDEHê jî bû, piraniya dengan nastîne. Lê teva vê yekê jî, Nûreddîn Zaza fêsha komeleyê dixwaze. Bi vî awayî, ev komele û kovara wê Dengê Kurdistan jî nabe xwediye jiyanêke dirêj<sup>2</sup>.

Piştî vê komeleyê, di 15- 16ê tebaxa 1956an de 17 xwendekarên kurd li Elmanyaya Federal bajarê Wiesbadenê dicivin. Piştî gotûbêjên dûr û dirêj biryar didin ku *“Komela Zanestîya Xwendevanên Kurd Li Ewropa”* (KZXKE) ava bikin. Ev Komele, bi zaravê soranî bi *“Komeley Zanistî Xwêndikaranî Kurd Le Ewropa”* dihate bi nav kirin.

*“Komela Zanestîya Xwendevanên Kurd Li Ewropa”* yê yek ji wan komeleyên kurd e ku li Ewropa demek dûr û dirêj jiyanê xwe ya komelayetî domandiye û li gelek welatên Ewropayê liqên xwe damezirandiye.

Kongreya çaran di 23- 26ê tîrmeha 1959an de li paytextê Avustîrya, Wiyenayê hatibû civandin. Di vê kongreyê de navê komeleyê guherandin û kirin *“Kurdish Students’ Society in Europe (KSSE)*. Navê komeleyê bi zaravê soranî bû *“Komeley Xwêndikaranî Kurd le Ewropa”* û bi kurmancî jî bû *“Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa”*.

Di xala didoyan ya destûra *“Komela Xwendevanên Kurd Li Ewropa”* de, armancên bingehîn yên vê komeleyê weha hatiye diyar kirin:

*”1- Bi hezkirina pêwendiyê di nava Xwendevanên Kurd li Ewropa û hewldan ji bona bi cihanîna xwendina wan.*

*2- Pêkanîna yarmetîya diravî di nava Xwendevanên Kurd li Ewropa.*

*3- Geşkirina zanistîya niştîmanîya Kurd û karkirin ji bona kara gelê Kurd û pirsîyariya wî a niştîmanî û beşdarbûn li xebata gelê Kurd ji bona wergirtina mafeyê xwe yê çarenûsî.*

*4- Nasdana gelê Kurd, welatê wî Kurdistan û pirsîyariya wî a niştîmanî bi gelên Cihanê re.*


*5- Bi hezkirina canê alîkariyê û dostaniyê di nava xwendevanên Kurd li Ewropa û xwendevanên welatên din de û pêwendikirin li gel rêxistinên xwendevanan û nexwendevanan ên niştîmanî û cihanî û hawkarîkirin li gel wan bi pê armanc û çakiya herdû aliyên.*

*6- Beşdarbûn di xebata gelê Kurd û piştgirtina xebata hemû gelên cihanê dijî împeryalizim, kevneperestiyê û rejîmê dîktatorî, li pê azadiyê, demokrasiyê*

*û aşitiyê li Cihanê de kirin”.*

Lê weha diyar dibe ku destûra komeleyê dûre hatiye guherandin û di hinek destûrên din de, armancên komeleyê bi heft xalan hatiye diyar kirin. Lê ew guherandin ne zêde ne û ne guherandinên bingehîn in.

Li gor raporeke ”Komîteya Birêvebirina Giştî” ku di 15ê sibata 1972an de li paytextê Romanya Bukreşê hatiye nivîsandin de; heta wê tarîxê 761



Nûreddîn Zaza (di nav ên li ser piyan de yê navîn) û Ekrem Cemil Paşa (di nav ên rûniştî de yê destê rastê).  
(Ji pirtûka "Muhtasar Hayatım" a Ekrem Cemil Paşa)

xwendekarên kurd bûne endamên “Komeleya Xwendevanên Kurd li Ewrûpa” û li Îspanya, Berlîna Rojava, Bulgarîstan, Macarîstan, Yugoslavya Yekitiya Sovyetan, Danîmarka, Îtalya, Polonya, Çekoslovakya, Elmanya Demokratîk, Îngilîstan, Fransa, Avustirya, Romanya, Swêd û Elmanya Rojava liqên vê Komeleyê hatine damezrandin.

Organa “Komela Xwendevanên Kurd Li Ewrûpa” kovara “**Kurdistan**”ê bû. Heta 15ê sibata 1972an 15 hejmarên vê kovarê bi zimanê îngilîzî û hejmarek jî bi zimanê elmanî hatibû weşandin. Komeleyê bi navê “**Pirşeng**” kovarek wêjeyî û zanestiyê jî diweşand. Di çaleya pêşîn ya 1964an de, komele dibe endamê “**Yekitiya Xwendekarên Cihanê**” (IUS).

“Komela Xwendevanên Kurd Li Ewrûpa” bi awakî rêk û pêk û bi beşdariya

xwendekarên kurd yên li gelek dewletên Ewropayê dixwandin, kongreyên xwe dicivand. Komeleyê kongreyên xwe yên heta sala 1975an, di van tarîxan de civandiye:

**Kongreya didoyan:** Di 2- 4ê çeleya paşîna 1958an de, li Londonê û bi beşdariya 22 xwendekarên kurd hatiye civandin.

**Kongreya sisêyan:** Di 4- 8ê tebaxa 1958an de, li Münchenê û bi beşdariya 17 xwendekarên kurd hatiye civandin.

**Kongreya çaran:** Di 23- 29ê tîrmeha 1959an de, li Wiyenayê û bi beşdariya 40 xwendekarên kurd hatiye civandin.

**Kongreya pêncan:** Di 22- 26ê tebaxa 1960ê de, li Berlina Rojava û bi beşdariya 73 xwendekarên kurd hatiye civandin.

**Kongreya şeşan:** Di 22- 26ê tebaxa 1961ê de, li Münsterê û bi beşdariya 109 xwendekarên Kurd hatiye civandin.

**Kongreya heftan:** Di 9- 15ê tebaxa 1962an de, li Braunschweigê hatiye civandin.

**Kongreya heştan:** Di 9- 15ê tebaxa 1963an de, li Münchenê û bi beşdariya 156 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya nehan:** Di 3- 9ê tebaxa 1964an de, li Hanoverê û bi beşdariya 183 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya dehan:** Di 17- 22ê tebaxa 1965an de, Li Berlina Rojava û bi beşdariya 125 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya yazdehan:** Di 26- 30ê tebaxa 1966an de, li Berlina Rojava û bi beşdariya 117 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya dozdehan:** Di 27- 31ê çeleya pêşîna 1967an de, li Belgradê û bi beşdariya 212 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya sêzdehan:** Di 11-16ê tebaxa 1969an de, li Berlina Rojava û bi beşdariya 245 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya çardehan:** Di 1- 5ê tebaxa 1970yê de, li Stokholmê û bi beşdariya 135 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya panzdehan:** Di tebaxa 1971ê de, li Berlina Rojava hatiye civandin.

**Kongreya şazdehan:** Di 16- 19ê tebaxa 1973an de, li Berlina Rojava û bi beşdariya zêdeyî 300 xwendekaran hatiye civandin.

**Kongreya hevdehan:** Di 27- 31ê tebaxa 1975an de, li Berlina Rojava hatiye civandin.

Ji rapora xebatê ya Komîteya Birêvebirina Giştî ya “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewrûpa”yê ku pêşkêşî kongreya hejdehan kiriye em dizanin, ku



kongreya hejdehan di 6- 9ê tebaxa 1976an de û li bajarê Berlîna Rojava hatiye civandin. Herweha dîsa ji vê raporê diyar dibe, ku kongreya hevdehan jî ya vê komeleyê li bajarê Berlîna Rojava hatiye çêkirin. Lê di derheqê cih û demên kongreyên din de vê gavê agahdarî û wesîqeyên pêdivî jê hene di destên min de tunene <sup>3</sup>.

“Komeleya Xendevanên Kurd Li Ewrûpa”, li gel pêwendî û pirsgirêkên xwendekarên kurd yên li Ewropayê, ji bo danasîna tevgera Kurdistanê û zilm û zordariya li ser gelê Kurd jî, hewldan û xebatên hêja kiriye; tevger û bûyerên ku li her çar perçeyên Kurdistanê dibûn ji nêzik ve taqîb kiriye û li gorî hêza xwe piştgiriya tevgera neteweyî ya welatê xwe kiriye.

Di îdeanameya Org. Cevdet Sunay ya ku di 17 çiriya pêşîna 1963an de amade kiriye de, li ser hinek biryarên heşt kongreyên “Komeleya Xwendekvanên Kurd Li Ewrûpa”yê radiweste. Bê guman ne bi awakî giştî be jî ew biryar helwest û çarçeweya xebat û çalakiyên vê komeleyê dide diyar kirin.

Di dema mahkemeya 49 rewşenbîr, xwendekar û welatparêzên kurd berdewam dikir de, Îsmet Şerîf Wanlî li ser navê Komîteya Birêvebir ya “Komeleya Xwendevan Kurd Li Ewrûpa” telgrafekê ji Serokdewletê Tirkîyê Cemal Gürsel, avayiyên navneteweyî û Neteweyên Yekbûyî re dişîne. Hinek daxwazên vê nameya ku di îdeanameya li jor hate behs kirin de, weha hatiye formule kirin:

- ”1) Mahkemeya 49 serokên kurdan bi awakî vekirî bê kirin,
- 2) Hemû girtiyên siyasî yên kurdan serbest bên berdan,
- 3) Bê îlan kirin ku di vîlayetên li navçeya Rojavayê de ku piraniya rûniştevane wan kurd in, weke zimanê resmî wê bi kurdî hindekarî bê kirin,
- 4) Destûrdayina weşandîna rojname û weşanên kurdî,
- 5) Di çarçeweya planekî de, li temamê Tirkîyê pêşdebirina jiyana gelê Kurdistanê ya maddî û kulturî,
- 6) Vîlayet û navçeyên Kurdistanê di nava yek welatî de bê civandin û di çarçeweya Komarê de statuya otonom jê re bê nas kirin”<sup>4</sup>.

## LIQÊ STENBOLÊ YÊ

### KOMELEYA XWENDEVANÊN KURD LI EWRÛPA

Di sala 1959an de, hinek xwendekarên kurd yên ku ji Kurdistana Başûr û Kurdistana Rojhilat hatibûn û li Stenbolê dibistanên bilind dixwandin, hewl didin ku liqekî “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” li Stenbolê damezirînin. Ev xebat û hewldan bi awakî îlegal dihatin meşandin. Ji bo pêkanîna vê armancê, ew pêwendiyên xwe bi navenda “Komeleya Xendevanên

Kurd Li Ewrûpa “yê re datînin û di encamê van dan û stendinan de, li Stanbolê liqekî vê komeleyê bi awakî îlegal ava dikin.

Li gor îdeanameya ku ji aliyê Orgeneral Cevdet Sunay ve hatiye amade kirin, Umran Yahya Feylî beşdarî kongreya “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewrûpa” yê bûye û di kongreyê de pêşneyar kiriye ku liqekekekî vê komeleyê li Stenbolê bête damezirandin. Lê di vê kongreyê de, ev pêşneyar nehatiye qebûl kirin.

Di sala 1962an de Îbrahîm Mamxidir, Hesên Şetevî, Necat Remzî, Şîrko Arif Ciyavok, Muhammed Saîd, Simko Arif Ciyavok û Umran Yahya Feylî civiyandin û biryar danin ku ji bona damezirandina liqê Stenbolê dîsa hewl bidin. Ew pêşneyara xwe dîsa bi riya Umran Yahya Feylî pêşkêşî kongreya “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewrûpa” yê dikin. Kongre dîsa pêşneyarê wan napejirîne.

Di îlona 1962an de, li mala Muhsîn Dizeyî ya ku li Cîhangîrê bû, Necat Remzî, Fuat Derwêş, Îbrahîm Mamxidir, Muhammed Saîd, Şîrko Arif Ciyavok, Telat Şerîf, Muhsîn Dizey, Gazî Dizey û Emer Dizey ku ji Kurdistana Iraqê hatibû dicivin. Saîd Ebdurahman, Hesên Şetevî û Cemal Alemdar jî beşdarî vê civînê dibin. Di civînê de, biryar tê girtin ku pêşneyara xwe ya ji bona damezirandina Liqê Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa, careka din ji “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê re bişîne. Ew, di nav xwe de 550 lîra jî didin hevdu û bi riya Emer Dizey û Saîd Dizey teslîmî “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê dikin. Piştî 3- 4 mehan di çiriya paşîna 1962an de, Saîd Dizey nameyekê ji Îbrahîm Mamxidir re dişîne û di vê nameyê de diyar dike ku “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê pêşneyara wan pijirandiyê; ew dikarin ji bo damezirandina liqê Stenbolê hilbijartinê çêbikin û di nêzîk de, wê hevaleyê were û bi wan re pêwendiyê deyne.

Îbrahîm Mamxidir, hevalên xwe Necat Remzî, Saîd Ebdurahman, Muhsîn Dizey, Muhammed Saîd, Hesên Şetevî, Gazî Dizey, Telat Şerîf Muxtar, Fuat Derwêş, Fîrûz Falahat, Cemal Alemdar li mala xwe ya Karagümrükê dicivîne. Ew nameya ku ji Saîd Dizeyî girtiye ji wan re dixwîne û bi awakî dizî hilbijartinê çêdikin. Di encama vê hilbijartinê de, Îbrahîm Mamxidir ji bo serokatiyê, Hesên Şetevî û Cemal Alemdar jî ji bo komîteyê birêvebirinê tînin hilbijartin. Hesên Şetevî jî dibê berpirsiyarê aborî.

Herweha endamên komeleyê di warê peywendiyên jî wezîfeyê di nav xwe de par ve dikin û di vê parvekirinê de heft kes wezîfeyên girîng digrin ser milên xwe: Ji bo pêwendiyên bi “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê re *Necîb Khaffaf*; ji bo danîna peywendiyên bi rêxistinên ku li Elmanyayê ne û ji bo eynê armancê dixebitîn *Saîd Dizey, Emer Dizey û Kemal Çelebî*; ji bona

danîna pêwendiyên bi Bulgariya re û bi vê riyê re dan û stendina bi rêxistinên li Ewropayê re *Sabir Xoşnav* û ji bona pewendiyan bi rêxistinên kurd yên li Iraqê re jî *Gazî Dizey, Îbrahîm Mamxidir* hatine wezîfedar kirin. Di vê civînê de, ev biryarên li jêr tîrî qebûl kirin:

a) Destûra “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê hate pejirandin û weke liqekî wê komeleyê xebitandin, hate qebûl kirin.

b) Li gor destûra “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê her endam divê salê sterlîneke îngilîzan bide. Di dewsa vê endametiye de, ji her endamî, divê mehê 10 lîrayên Tirkiyê bê girtin.

c) Divê Komîteya Birêvebir her meh di hefta yekem de bicive. Gava Komîteya Birêvebir pêwîst bibîne, dikare endamên komeleyê dawetî civîne bikin <sup>5</sup>.

Di rapora Komîteya Birêvebirina Giştî ya “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê de ku di 15ê sibata 1972an de hatibû amade kirin, behsa damezirandina liqê Stenbolê nayê kirin. Heye ku ev yek ji bona ku liqê Stenbolê bi awakî ne resmî û îlegal hatibû damezirandin, “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê nexwestibe liqê Stenbolê weke resmî qebûl bike û di raporên xwe de binivîse. Ji xwe, li gor îdeanameya Cevdet Sunay jî, çend çaran pêşneyara damezirandina liqê Stenbolê ji “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê re çûye, lê ew pêşneyar ji aliyê vê komeleyê ve nehatiye pejirandin. Dibe ku “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê di destpêkê de nexwestibe liqekî vê komeleyê bi awakî îlegal li Stenbolê damezirîne. Herweha birêvebirên komeleyê dizanîbûn ku dewleta Tirkiyê wê destûra avakirina komeleye kurdî nepejirîne.

Di nîsana 1963an de, ji ber hinek sedemên taybetî Îbrahîm Mamxidir dixawaze ji seroktiya vê komeleyê veqete. Li ser vê daxwazê civînek endaman tê civandin. Di vê civînê de daxwaza Îbrahîm Mamxidir tê qebûl kirin û bi hîlbijartineke bi dizî, Cemal Alemdar weke serok, Necat Remzî û Hesên Şetevî jî weke endamên Komîteya Birêvebir tîne hîlbijartin. Ev guhertin bi nameyekê ji “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa” yê re tê diyar kirin<sup>6</sup>.

Liqê Stenbolê yê Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa bi welatperwer û rewşenbîrên kur dên Kurdistana Bakur yên weke Musa Anter, Medet Serhat, Saîd Kırmızıtoprak, Saîd Elçî, Yaşar Kaya re jî peywendiyên germ daniye.

Di 4ê hezîrana 1963an de bi fermana wezîrê karê hundur Hıfzı Oğuz Bekata operasyonek mezin li ser xwendekar, rewşenbîr û welatparêzên kurdan dest pê kir. Polisên siyasî li Stenbolê, di aynê wext û seatê de digrin ser malên Awûqat Ziya Şerephanoglu, Musa Anter, Doğan Kılıç Şihhasenanlı, Saîd Elçî, Medet Serhat, Edip Karahan, Enver Aytekin, Ali Anagür û wan digrin. Di van operasyonên ku li ser rojnamevan, nivîskar, xwendekar û

welatparêzên kurdan de, 13 kes têne girtin û dûre hejmara girtiyan dighêje 23 kesan.

Wezîrê parastinê yê Tirkîyeyê, di 19ê hezîrana 1963an de li parlamentoyê, li ser van girtinan daxuyaniyekê belav dike. Di 28ê hezîrana 1963an de, wezîrê karê hundir Hıfzı Oğuz Bekata jî, vê daxuyaniyê bi civîneke çapemeniyê pêşkêşî rojnamevanan dike. Piştî vê agahdariyê, rojnameyên tirkîyan bi ser nivîsên mezin li ser vê bûyerê dinivîsin. Ev bûyer, di dîroka nêzik ya tevgera neteweyî ya Kurdistanê de, bi navê “*Bûyera Bîst û Sisyan*” tê nasîn...

Di derheqê van 23 kurdan de, Org. Cevdet Sunay di 17ê çiriya pêşîna 1963an de îdeanemeyekê amade dike. Ew kes bi sûcê “*hejarkirina îstiqlala dewletê, xerakirina yekitiya wê, mêldariya veqetandina beşekî ji erdên ku di bin nîrê dewletê de ye*” dihatin tewanbar kirin. Ji wan re xala 125an ya qanûna cezayê ya tirkîyan dihat xwestin ku ev jî daxawza îdamkirinê bû<sup>7</sup>.

Di vê operasyonê de hinek endam û berpirsiyarên “Komeleya Xwendevanên Kurd Li Ewropa- Liqê Stenbolê” jî hatin girtin. Li gor Dr. Îbrahîm Gürsel dinivîse, ew kesên ku di wê demê de li Tirkîyeyê bûn û hatine girtin ev bûn:

**Cemal Alemdar:** Di sala 1940î de, li Erbîlê hatiye dinyê. Di Unîversîteya Teknîkî, Fakulteya Mîmarî de xwendekar e.

**Îbrahîm Mamxidir:** Di sala 1933an de, li Koysançaxê (li Kurdîstana Başûr Z.S) hatiye dinyê. Di Akademiya Zanestîya Îktîsadî û Tîcarî de xwendekar e û endamê Komîteya Birêvebir e. (Lê li gor agahdariyên wezîrê karên hundir ku di rojnameyên 29ê hezîrana 1963an de hatine weşandin de; Îbrahîm Mamxidir di Unîversîteya Stenbolê Fakulteya Tîbê sefê 5an de xwendekar e. Z.S)

**Fuad Derwêş:** Di sala 1939an de li Bexdadê hatiye dinyê. Di Fakulteya Tîbê de xwendekar e û endamê Komîteya Birêvebir e.

**Nejat Remzî:** Di sala 1935an de, li Kerkûkê hatiye dinyê. Di Fakulteya Tîbê de xwendekar e û endamê Komîteya Birêvebir e.

**T. Şerîf Muhtar:** Di sala 1934an de li Hewlêrê hatiye dinyê. Xwendekarê doktoriya dirana ye û endamê rêxistinê ye.

**Fîrûz Falahat:** Di sala 1939an de li Rizaiyê (li Kurdîstana Rojhilatê Z.S) hatiye dinyê. Di Unîversîteya Teknîkî de xwendekar e û endamê rêxistinê ye.

Ev kesên ku wê demê ne li Tirkîyeyê bûn, nehatin girtin, lê endamên wê komeleyê bûn jî ev bûn: *Hesen Şetevî, Fatîh Hesen, Muhammed Saîd Caf, Saîd Dizey, Simko Çiyavok, Hesen Muhemmed Elî, Necîb Khaffaf, Sabîr Hoşnav, Kemal Çelebî, Umran Yahya Feylî, Muhsîn Elî Hamad, Fazîl Reşîd, Emer Dizey û Muhammed Cafer*<sup>8</sup>.

---

## Têbinî û çavkanî

1. Nureddin Zaza, *Bir Kürt Olatak Yaşamım*, Mezopotamya Publishing, Sweden, adar 1994, r.183-184.

2. Ji bo dirêjayiya vê behsê, binêre: Nureddin Zaza, b.n.d, r183- 185.

3. Ez hevîdar im ku wê kesên di derheqê vê komeleyê de xwedî agahdarî ne û di destên wan de wesîqeyên vê komeleyê hene, li ser navnîşana kovara Çirayê ji min re wan agahdarî û wesîqeyan bişîne, da ku mirov bikaribe bi awakî berfirehtir li ser vê komeleyê raweste.

4. Binêre: Îdeanameya Komara Tirkîyê Serokatiya Serkaniya Giştî Amîrtiya Dadmendî, Tarîx: 17 çiriya pêşîn 1963, hejmar: 963/ 668, esas: 963/ 138.

Ev îdeaname ji aliyê Orgeneral Cevdet Sunay ve hatibû amde kirin û weke tê zanîn, Cevdet Sunay dûre dibe Serêkkomarê dewleta Tirkîyê. Ev îdeaname di van pirtûkan de jî hatiye weşandin:

*"Bir Kürt Devrimcisi: Edip Karahan'ın Anısına"* Komal yayınları, nîsan 1977, r 99- 136.  
Hidir Göktaş, *Kürtler II Mehabad`dan 12 Eylüle*, Alan yayınları, çiriya pêşîn 1991, r. 72-97.  
Vedat Şadili, *Türkiye de Kürtçülük Hareketleri ve İsyanlar*, Kon yayınları, Ankara 1980, r. 182- 226.

5. Li têbiniya çaran binere.

6. Li têbiniya çaran binere.

7. Li têbiniya çaran binere.

8. Binêre: Dr. İbrahim Ethem Gürsel, *Kürtçülük Gerçeği*, r. 66- 68. Agahdariya ku Dr İbrahim Ethem Gürsel di derheqê xwendekariya İbrahîm Mamxidir dide ne rast e. Ez bi xwe jî di vî warî de, bi İbrahîm Mamxidir peyiyîm. Wî ne li Akademiya Zanestîya İktisadî û Ticarî dixwend; li Fakulteya Tîbî dixwend.

# şerê qirêj û rewşa weşanên Kurdan

Lokman Polat

**D**ewleta dagirker a komara Tirkîyê, li Kurdistanê şer ekî qirêj û barbar li dijî gelê Kurd dimeşînê. Tesîra vî şerî di qada jîyanê de bi her awayî xwe dide nîşandan. Bi hezaran gundên Kurdan tên şewitandin, her roj bi dehan Kurd têne kuştin. Zilm û zordarîya dewleta dagirker li dijî gelê Kurd bi giştî berdewam dike. Jîyan li gelê Kurd hatîye herimandin. Komara Tirkîyê bi metodên barbarî li ser gelê Kurd wehşetî û qetlîaman dike. Gelê Kurd hêj jî ji hemû mafên xwe yên netewayî û demokratîk bê par e.

Dewleta Tirk, Kurdistanê ji gelê Kurd re kiriye zîndan, kiriye cehenem. Dewlet dixwazê gelê Kurd tim di nav xêzanî, belengazî û nezanîyê de bimîne. Dewlet bi çerxa asîmîlasyonê dixwazê Kurdan bihelînê, wan ji nasnama wan a netewayî bi dûr bixe. Ji bo ku Kurd nexwînin, bi doza xwe ya netewayî hayîdar nebin, bi zimanê xwe, bi dîroka xwe nizanibin, bi riya qedexekirinê, dixwazê pêşî li hinek tiştan bigire. Loma jî bi her awayî, metodên antî-demokratîk bi kar tîne, kovar û rojnameyên Kurdan qedexe dike, pirtûkên Kurdî û yên li ser pirsra Kurdan kom dikir in.

Hetanî niha gelek pirtûk, kovar û rojnameyên Kurdan hatibûn qedexekirin, niha jî rojnameya “Demokrasi” û rojnameya ”Nûroj”ê qedexe kirin. Berê jî gelek rojname qedexe kiribûn. Gelek pirtûkên ku li ser Kurdan hatibûn nivîsîn bi metodên antî-demokratîk dihatin qedexekirin. Niha jî eynê metoda antî-demokratîk ya qedexebûnê dom dike.

Sawcîyê dadgehê dibêjê “ji bo ku em pirtûkan qedexe bikin û berhev bikin hewce nîn e ku em wê pirtûkê hemû bixwînin. Pirtûk a kîjan weşanxaneyê?

Û nivîskarê wê kî ye? Ev ji bo me bes e.” Ev gotin jî dide xuyakirin ku bi keyfî pirtûkan –bi gelemperî yê weşanxaneyên Kurdan– qedexe dikin. Hemû pirtûkên Mamoste Îsmâîl Beşîkçî hatine xedexekirin. Ji bo pirtûkên wî 64 sal hepis û 4 milyar ji cezê peran danê pê. Li Stenbolê çend kovar û rojnamên Kurdan derdiketin, hinek jê niha jî derdikevin. Ew hemû rojnameyên hefteyî û kovarên mehanî bi Kurdî û Tirkî dihatin weşandinê. Hema, hema hemû hejmarên wan dihatin berhevkirin, qedexe dibûn. Rojnamên Kurdan yê hefteyî, Newroz, Dengê Azadî û Jiyana Nû çawan derdiketin, dihatin kom kirin. Gelek hejmarên rojnameya rojane Özgür Ülke jî qedexe dibû, dihat kom kirin. Rojname xwerû bi zimanê Kurdî “Welat” hate girtinê. Rojname 15 rojî Medya Güneşi gelek caran bi çend heftan hate girtin. Kovarên mehane yê Kurdan jî têne berhevkirin. Gelek xwedî û berpirsîyarê kovar û rojnamên Kurdan hatine girtin, nûha di hefsê (zîndanê) de radizin. Niha jî li hemberê rojnameya Hêvî, Deng, Özgür Halk û yê din gelek asteng hene.

Di vê demê de, weşanên Kurdî, kovar û rojnamên Kurdistanî li Kurdistanê nayên belavkirin, dewlet nahêle ku ew weşan bikevin Kurdistanê. Li bajarên Kurdistanê weşanên Kurdî nayên firotin. Di bajarên Kurdistanê de ha mirov weşanek Kurdî û ha mirov bombayêk bi xwe re gerand, wek heve. Dewleta dagirker bi zanatî dixwazê gelê Kurd bê kovar, bê rojname û bê pirtûk bihêle.

Pirtûkxaneyên ku di bajarên Kurdistanê de ne, nikarin weşanên ku li Stenbolê derdikevin, bînin; di dikanên xwe de bifroşin. Li bajarê Amedê pirtûkxana Dîlan heye. Xwedîyê pirtûkxaneyê weha dibêjê:

”Weşanên çep qet nakevin hundirê Amedê. Pirtûk, kovar û rojnameyên ku li ser pirsê Kurdan disekinin jî yan nakevin destê me, yan jî wexta ku dikevin destên me, di cîh de, polîs dest didin ser. Ji bo vê yekê pirtûkxana me di bin mercên zor û zehmet de li ser lingan disekinê.”

Pirtûkxaneyek din jî, navê wê Amed e. Xwedîyê wê jî dibêjê:

”Firota weşanên Kurdî bi tevayî li Kurdistanê hatiye seknandin. Pirtûkxanên me, weşanên çep li cîhêk bihêlin, weşanên klasîk jî nikarin bifroşin. Weşan nakevin destê me. Wexta dikevin destê me jî polîs tîn davêjin ser pirtûkxanê, û dest didin ser pirtûkan. Karkerên me digrin bin çav.”

Weşanxaneyên ku li Stenbolê ne û weşanên li ser pirsê Kur dî diweşînin, ew jî dibêjin em pirtûkên ku çap dikin nikarin bişeynin Kurdistanê.

Wek têt zanîn, bi dehan kovar û weşanxaneyên Kurdan li bajara Stenbolê hene. Ew weşanxane li ser pirsê Kurdî, li ser ziman, çand û dîroka Kurdan gelek pirtûkên hêja diweşînin. Lê çi heyf ku, nikarin wan pirtûkê xwe bişeynin Kurdistanê û wan bidin firotin.

Xwedîyê weşanên Firat, dibêjê :

”Hendî belavkirina pirtûkan ji holê rabûye. Li Kurdistanê ji ber zilm û

tehda dewletê gelek pirtûkxane hatin girtin. Hendî weşanxane nikarin pirtûk bişeynin Kurdistanê. Li gel vê, wek şexs jî hendî kes nikarê bi xwe re pirtûk bibe Kurdistanê. Ji Hekarîyê du mêvanê min hatin weşanxanê. Wan çend pirtûk gelek ecibandin, lê ji her pirtûkek yek - didu be jî newêrabûn bi xwe re bibin Hekarîyê.”

Weşanxaneyên Kurdan yên ku li Stenbolê ne, ji bo ku astengên pêşiya belavkirina pirtûkan bi hev re ji holê rakin, ji bo belavkirina pirtûk û kovarên Kurdî bi hêsanî û bi berfirehî bê kirin, 22 kovar û weşanxaneyên Kurdî hatin cem hev û bi hev re “Yekîtiya Weşanên Neteweyî” damezrandin. Jîyan mir ov tîne cem hev. Li Stenbolê hevkarîya kovar û weşanxaneyên Kurdî tiştê gelek baş e, û xebatekî hêja ye. Ez bi dil û can serkevtina kar û xebata wan ya hevbeş dixwazim.

### **ASTENGÊN LI PÊŞBERÊ WEŞANÊN KURDAN**

Xwendin xweş e. Ji bo nivîskarek xwendin û nivîsandin ji hemû tiştan xweştir e. Li pêşiya xwendin û nivîsandinê gelek problem hene. Li welatên paştmayî û di dewletên ku sazmana dîktatorî li wê heye, xwendin û nivîsandin weha hêsan nîn e. Di van dewletan de hemû kes nikarin hertiştî bi azadî binivîsin. Li ser kovar, rojname û pirtûkan sansor heye. Weşanan qedexê dikin, weşan hêj di çapxanê de ye polîs diçin wan weşanan dicivînin, kom dikin dibin. Cezayê hepis û peran didin nivîskar û xwediyê weşanxanan.

Li ser weşanên Kurdan zordariyek mezin heye. Li Tirkîyê hemû weşanên Kurdan tên civandin, qedexê dibin. Xwedî û berpirsiyarên weşanan digrin davêjin zîndanê. Dewleta dagirker nahêle ku weşanên Kurdî di nav xwendevanan de bê belavkirin. Hemû hejmarên Jîyana Nû, Medya Güneşi hatin civandin. Bi leyîstikên Osmanî rojname rojane “Özgür Gündem”, “Özgür Ülke” û niha jî rojnameya “Demokrasi” û “Nûroj” ê girtin. Gelek hejmarên Azadî, Özgür Halk, Rewşen û kovarên din hatin civandin û qedexekirin. Li pêşberê weşanên Kurdan bi her awayî astengên mezin hene.

Li gel zilm û qedexekirina dewleta Tirk, gelek astengên din jî li pêşberê weşanên Kurdî hene. Hem li Tirkîyê û hem jî li Ewropayê pîr asteng û zehmetî li ber weşanên Kurdan heye. Astengên li pêşberê pirtûkên Kurdî hîn zêdetir e.

Amadekirina berhemek hêsan nîne. Jê re kedek mezin dixwazê. Nivîskarek ji bo ku berhema xwe amade bike, gelek xebat dike, dişixulê, mejîyê xwe diwestîne, bê xew dimîne, bi destê xwe lêdike, dinivîsîne, paşê nivîsê dixwîne, rast dike.

Nivîskarî zehmet e. Nivîskar hem bi roj kar dike û hem jî bi şev. Di nav Kurdan de nivîskarên ku bi firotina pirtûkên xwe jîyana xwe ya aborî



bidomîne tûne. Ew jî wek her însanî xwedîyê malbat in. Divê xwe û malbata xwe xweyî bikin. Ji bo vê jî, bi roj di karek de kar dikin, bi şev jî, ji bo nivîsandinê dixebitin, karê nivîsê dikin. Rojên wan yê şemî û yekşemê jî bi civînan, an jî bi kar û xebata rêxistinî û bi nivîsandinê derbas dibe.

Piştî gelek zehmetiyên xebatê, wexta ku nivîskar pirtûka xwe amade dike, vêcarê astengên çapê derdikevê holê. Dê çawan pirtûkê çap bike? Heqê çapê gelek e. Yek, didu ji berîka xwe, an jî bi rastîya wê ji qiriqa zarokê xwe bibire û diravê çapxanê bide, ya sisîyan hendî nikarê bi qeweta xwe pirtûkê çap bike. Rewşa wî/wê ya aborî jê re dest nade, bi serê xwe nikare pirtûkan biweşîne. Divê ji xwe re weşanek bibîne ku pirtûkên wî çap bikin. Dîtina weşanxaneyê jî gelek zehmet e. Xwedîyê weşanxanê ku pirtûka wî ne ecibînê, çap nake. Bi çi tewirî dibe bila bi be, piştê ku nivîskar pirtûka xwe çap kir, vêca astengîya belavkirin û firotinê derdikevê pêşberê wê.

Ev rastîyek e. Pirtûkên Kurdî hem li welat, hem jî li derveyê welêt zêde nayên firotin. Pirtûkên ku tên firotin ji çend sedî derbas nake. Ew jî heqê xwe yê çapê jî dernaxe. Ji bo wê jî weşanvanê pirtûkê (nivîskarê pirtûkê an jî weşanxane) zirar dike. Carek, du car, sê car, gava zirar bibe, hendî carekî din ew nikarin pirtûk biweşînin. Loma jî gelek kêma pirtûkên tene weşandinê. Ger pirtûkên Kurdî zêde bihatana firotin, bi wê pereyî dê pirtûkên din jî bihatana çapkirin û dê weşandina pirtûkan zêde bibana.

Li Tirkîyê weşanxaneyên Kurdan gelek kêma in. Yê ku hene jî bi pirranî pirtûkên ku bi zimanê tirkî (nivîskarê pirtûkan bi eslê xwe Kurd in) hatine nivîsandin, weşandin û hê jî diweşînin. Pirtûkên bi zimanê Kurdî gelek kêma (çend heb) hatine weşandinê. Ev jî ji ber sedema ku pirtûkên Kurdî nayên firotinê ye. Ger pirtûkên Kurdî pirtûk bihatana firotin, dê weşanxaneyan pirtûk çap bikin. Li gor bîr û bawerîya min, her çiqas pirtûkên Kurdî hendik jî bêne firotin, divê weşanxaneyên li welêt pirtûkên Kurdî zêde çap bikin, biweşînin.

Li Ewropayê jî, ji bo çapkirin, belavkirin û firotina pirtûkan gelek zehmetî hene. Nivîskar bi serê xwe nikarê pirtûkê biweşîne. Heqê çapê gelek bûha ye. Nivîskar, divê pirtûkê bide weşanxaneyekê. Hendî weşanxane û ûjdana xwe. Xwedîyê weşanxanê ger bixwazê diweşîne, nexwazê naweşîne. Li Ewropayê jî pirtûkên Kurdî gelek kêma tene firotin. Xwendevanên Kurd pirtûkan pirtûkê dikirin û dixwînin. Kovar û rojnameyên ku xwerû Kurdî ne û li Ewropayê derdikevin, ji kovar û rojnamên Kurdan yê din, yê ku bi Tirkî ne, an jî bi Tirkî û Kurdî ne, kêmtir tene firotinê. Bi rîya postê şîyandina cîhên din jî ji bo ku heqê postê pirtûkê bûha ye, mirov nikarê bi postê bişeynê.

Nivîskaren Kurd yê ku li Ewropayê ne û bi Kurdî dinivîsînin pirtûkek xwe li Tirkîyê diweşînin, lê a duyem hendî naweşînin. Lewra pirtûka yekem nayê firotin, li ser wan dimîne, perê xwe yê çapê dernaxe.

Welatên Ewropayê yên din nizanîm, lê li Swêdê çend weşanxaneyên Kurdan ji dewletê alîkarî digrin. (Konseya kulturî ya dewleta Swêdê alîkarî dide hinek weşanxaneyan . Ew alîkarî nadin şexsan, nivîskarên.) Li Swêdê weşanxaneyên Kurdan ji dewletê alîkarî digirtin, niha wê alîkariyê ji gelek kêr kirine. Hinek weşanxaneyan qet alîkarî negirtin.

Weşanxaneyên ku alîkarî digrin gelek pir tûkên Kurdî diweşînin. Lê pir tûkên wan jî zêde nayên firotinê, nayên belavkirinê. Pirtûkên Kurdî di depoyan de dimînin.

Ji bo afirandina berheman û weşandina wan cure cure zehmetî hene. Ev astengên heyî zû bi zû ji holê ranabin. Gelek tişt jî bi xwendevanên Kurd ve girêdayîne. Ger xwendevan pirtûkan bikirin û bixwînin, dê pirtûkên Kurdî hîn pîrr bêne weşandinê. Kurdên ku dikarin bi Kurdî bixwînin divê pirtûk û kovarên Kurdî bistînin, bixwînin.

## QEDEXEKIRINA WEŞANÊN KURDAN

Dewleta dagirker a Tirk, bi her awayî êrişa xwe ya li dij gelê Kurd didomîne. Li hemberê weşanên Kurdan çiqas metodên antî-demokratîk hene, hemûyan bi kar tîne. Weşanên Kurdan qedexe dike. Polîs diçin li pêşîya çapxanê disekinî wexta ku kovar û rojnamên Kurdan ji çapê derdikevin top dikin, digrin dibin, nahêlin ku ew weşan biçin bigihîşin destê xwendevanan.

Dewleta dagirker, qîma xwe bi qedexekirin û civandina weşanan ne anîye, vêca ji binî ve rojnamên Kurdan dide girtinê. Me navê wan weşanan li jor nivîsîbû. Hemû hejmarên wan rojnaman hatibû qedexekirin û civandinê. Dewleta Tirk bi qedexekirin û civandinê dixwazê weşanên Kurdan di hêla aborî de jî bixe tengasîyê.

Ev çend salên dawî gelek kovar û rojnameyên Kurdan hatin weşandinê. Lê gelek ji wan ji ber sedemên aborî û sîyasî, ji bona ku her tim dihatin qedexekirinê weşanê xwe dan seknandin, an jî ji alî dewleta dagirker va hatin girtinê.

Weşanên Kur dan yên ku nûha tene weşandinê ev in:

Hêvî, Özgür Halk, Jiyana Rewşen, Azadiya Welat, Nûbihar, War, Stêrka Rizgarî, Deng, Govend û Zend.

Rewşa weşanxaneyên Kur dan jî qet baş nîne. Weşanxaneyên Kur dan ji ber zilm û tehdeya dewletê gelek zirarê dibînin. Pirtûkên ku derdixin têt qedexekirin û civandin. Ji bo yeko yek pirtûkan û ji bo nivîskarê wê û ji bo weşanxaneyê cezayê peran û cezayê hepisê têt dayîn. Polîs davêjin ser weşanxanan, dest didin ser pirtûkan, arşîv û malzemên (kompîtor, faks, telefon û tiştên din) weşanxanê digrin û dibin; weşanxaneyê talan dikin. Ji hêla aborî ve gelek zirarê mezin didin weşanxanê. Polîs vê dawîyê dest da ser malzemên weşanxana

“Komal”ê û hetanî nûha tu tişteki wan paşve neda. Polîs hinek weşanxanan (Med, Melsa û Zagros) digrin, kilît li deriyê weşanxanê dixin.

Ji ber sedemên zirara aborî û tehdâ sîyasî weşanxaneyên Kurdan neçar dibînin û ji mecbûrî weşanxaneyên xwe digrin.

Pirtûkên ku weşanxaneyên Kurdan derdixin hemû jî têne qedexekirin û komkirinê. Weşanên Melsa, Zagros, Doz, Deng, Firat Dicle, Med, Zel, Çarçira, Komal, Medya Güneşî, Firat, Koral, Nûjen, Berfîn û hwd, gelek pirtûkên hêja weşandin, lê pirranîya wan hatin qedexekirinê.

Pirtûkxaneyên ku pirtûkên Kurdî û yên Tirkî, lê li ser pirsê Kurdî difroşin, di nav gelek astengîyan de ne. Li bajara Wan’ê Pirtûkxana Kultur û li Amedê (Diyarbakirê) Pirtûkxana Dîlanê ji alî hêzên dewletê yên tarî ve hatin şewtandinê. Li Hekarîyê xwedîyê Pirtûkxana Welat hate girtinê. Li Stenbolê polîs bişev diçe dikevê dizîya kovar û weşanxaneyên Kurdan. Êvarê wexta ku biroyên weşanxane û kovarên Kurdan tînin girtin û xebatkarên wan derî digrin û diçin malê, polîs diçin derî dişkînin û dikevin hundir. Wek mînak “We di ez im, nedî diz im”. Polîs jî bi vî tewirî dizîya kovar û weşanxaneyên Kurdan dike. Polîs pere û arşîvên weşanxane û kovaran didizin.

Ji ber gelek sedemên aborî û sîyasî gelek weşanxaneyên Kurdan hatin girtin. Nûha tenê çend weşanxaneyên Kurdan mane ku jîyana xwe ya pirtûk weşandinê didomînin.

Weşanxaneyên ku hêj jî pirtûk diweşînin evin:

Firat, Nûjen, Doz, Avesta, Komal û Deng. Ji bilî van weşanxaneyên Kurdan çend weşanxaneyên çepên Tirkan jî carna pirtûkên Kurdî û pirtûkên Tirkî li ser pirsê Kurdî diweşînin. Weşanxaneya Belge pirtûka Mehdî Zana ya bi Kurdî “Evîna Dilê Min” weşand. Weşanxaneya Koral, Yurt, Kaynak, Berfîn, Iletişim û Pencer e jî carna pirtûkên li ser cîvaka Kurd diweşînin. Weşanxana Berfîn navê wê Kurdî ye, lê pirtûkên ku çapkirîye hemû jî bi Tirkî ne û pirtûkên teorîk yên li ser pirsîrêkên çepîyê-sosyalîzmê ne. Ev weşanxane bi navê “Burfîn Bahar” kovarek jî derdixe, di kovarê de yek nivîsek jî bi Kurdî tûne ye.

Weşanên Yurt jî hemû pirtûkên Îsmail Beşikçi weşandiye û diweşîne. Dewletê berpirsiyarê weşanxaneyê Önal Öztürk girt avête zîndanê. Gelek hepis û cezayê pereyan dan pê. Lê li gel van cezayan, weşanxaneya Yurt di berxwede dide û weşandina pirtûkên Îsmail Beşikçi didomîne.

# Mele Ehmedê Palo

## A. Balî

**M**ele Ehmedê Palo li Kurdistana Bakur di sala 1920an de nêzîkî bajarê Palo, li gundê Sêreçurê ji dayik bûye.

Di zaroketiya xwe de dê û bavê xwe winda dike; sêwî dimîne. Ji yana wî di nav belengazî û perîşaniyê de derbas dibe. Dixwaze ku bixwîne. Lêbelê mercên xwendinê nabîne. Ji bo vê sedemê jî carcaran ji mal direve, berê xwe dide bajarê Swêrekê. Newal û kortalan dibîne, li deşt û zozanan dibe mêvan. Paşê ew dibe rêwî û li Kurdistanê digere. Li hin ciyan dibe mêvan û li hin ciyan jî dibe şivan.

Di pazde saliya xwe de bi nexweşiyê giran dikeve. Li dor du mehan di nexweşxana Mêrdînê de radikeve. Di pey ku ji nexweşxanê derdikeve, berê xwe dide Binxetê. Demekê li Dirbêsiyê dimîne. Di sala 1935an de diçe bajarê Qamîşlê. Û ji wir jî diçe gundê Wêsişkê şûnûwar dibe. Li vî gundî ew jî wek seydayê nemir dibe şivan. Seydayê Cegerxwîn jî bi şivanî û gavaniyê dest bi xwendina xwe kiribû. Ew jî bi rêyek wiha de dimeşe. Bi mele



Mele Ehmedê Palo

û feqeyan re hevaltîyê dike. Di wê demê de hînê xwendin û nivîsandinê dibe û zanîna xwe roj bi roj zêdetir dike. Bi taybetî li ser rêzimana Kurdî radiweste û xwe perwerde dike. Dibe mamostayê xwe. Ji bilî zimanê Kurdî xwe hînê Erebi, Tirkî û Farsi jî dike. Lêkolîn û lêgerînên xwe li ser wêje û dîroka Kurdistanê pêş de dibe. Di wê demê de dest bi helbestên Kurdî û nivîsandinê dike. Heta roja xwe ya dawî vî karî didomîne.

Mele Ehmed ji gelê xwe re melayetî dikir; gel ji xewê hişyar dikir. Dîwana xwe ya ku bi navê Dewr û Gera Kurdistanê di van deman de nivîsandî ye.

Mele Ehmed, paşê, mirovên ku rêzaniya Kurdî dizanîbûn nas dike û dibe hevalbendê wan. Dema ku di sala 1935an de komeleya Zanist û Alîkariya Kurd hatibû damezrandin, ew jî bûbû rêvebirekî komeleyê.

Emrê xwe ê dawî li Lûbnanê, li bajarê Bêrûdê derbas dike. Di sala 1991 meha Adarê de diçe ser heqîya xwe.

Mele Ehmedê Palo di 71 salê jiyana xwe de, diwazde berhemên giranbiha afirand û ji me re hiştin. Çi mixabin ji wan berhemên giran, bes dîwana wî ya bi navê Dewr û Gera Kurdistanê di sala 1994an de bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Heger hin lêkolînevan û hin çapxane li wan berhemên hêja xwedî derkevin, bêguman gencîneyên pirtûkxanên Kurdî dê hîn dewlementir bibin.

Berhemên Mele Ehmed yê çapnebûyîn:

Tarîxa Kurdan, Şano (Bi şîweyê helbestê hatiye nivîsandin. Dema ku dike çap bibe di çapxanê de tê girtin û winda dibe. Nûser bi tîpên erebî heye.), Ferhenga Kurdî-Tirkî, Farsi û Erebi bi tîpên Erebi ji bo çapê her amade ne.

## BILBILÊ XEMGÎN Û WELATÊ ŞÊRÎN

Carekê hatî gumanê, hilkişîme ser çîyan  
Ronî da roja cihanê, jê dibînim her çîyan

Ku cihek ava û şîn e, rind û şêrîn û delal  
Rengareng tê de civîne, nivşê daran û gulan

Tev şikeft û kort û çal in, hêliÇk û lat û zinar  
Cok û cobar û newal in, berqef û ser kaniyan

Nêrgiz û rihan û mêrg in, deşt û zozan û gelî  
Dezgehê şêr û piling in, cîgehê hîn û jîyan

Gol û derya tene dorê, rengê Qîzwin û siya  
Kaniyan da der ji Torê, colê berxan û miyan

Tê diçêrin ber bi banî, hêdî hêdî kom bi kom

Ku ji ber dengê şivanî, mane ser av û çeman

Ez dibînim tê xuya ne, gewher û zêr û dirav  
Rewşen û ronî veda ne, ser kelat û her deran

Givgiva bayê sebaye, raserê çiyayên bilind  
Xuşxuşa zad û giyayê, me'imeha berx û miyan

Qirçeqirça qirş û qala, bin piyê şêr û beran  
Zimzima dengê newalan, limlima ava çeman

Tiptipa sêv û hinaran, teqteqa berq û birûsk  
Ding û dinga lat û xaran, gumguma topên giran

Çikçika belk û pelan e, pîrpira teyr û tilûr  
Gimgima xap û derdan e, xurxura dar û beran e

Çingçinga şûr û dasan, zingezinga hesinan  
Qîjqîja çûk û çivîkan, xumxuma şîp û geran

Bax û bîsâtanek bijare, ser çemê ava Mirad  
Gulşenek tê da diyar e, gul stêrê asîman

Tu dibê tirmê mexîl e, serserî ronî dide  
Têra dewrê lîlîlîle, ya girêka sêwiyan

Lal û yaqût, dur û gewher, parçe parçe bûne kom  
Tê xuya ne jîn û tevger, nîne wek wî der cihan

Lew cihê bo keyf û şadî, xwendin û lîz û geşî  
Alme û zêrê reşadî, tê rijîne ser cilan

Bilbilek têda dixwîne, serserê şax û gulan  
Xem civîn û dil birîn, her dike ax û fixan

Caracara tête ser da, dil kul û jar û melûl  
Fir dide xwe pel di dev de, tête dora xaniyan

Ronî û rewş û çiraya, xwe bi niftê pê dixê  
Doz û daxwaz û divaya, xwe dike nav û nîşan

Min digot bo çi dinalî, bilbilê jar û pepûk  
Ser cihê rind û delalî, çir dikêşî derd û jan?

Gotî yara min bijare, dijminan winda kirî  
Jîr û serbaz û siyar e, bax û kar û niştiman

Min divê ku heyf û tola, xwe bi vê zarê derî  
Der newal û deşt û çolan, der kelat û ser hedan

Hejr ji dijmin zû hilînim, da nemînî derd û kul  
Rengê şêran xwe bighînim, dehl û dar û kaniyan

Ya bidim ser şop û rêça, ku diçe bax û bihuşt  
Çê bikim dewran û pêça, zana rêkim parleman

Rêzika pendan û şîret, kar û tevdîra min e  
Nameya namûs û xîret, bo min e zar û ziman

Ev ne texmîn û guman e, miletê dîl û nezan  
Ên di vê rê de xuya ne, ew diçin baxê cinan

Min dizanî ev bi rastî, yek ji tayê bawer î  
Ya bi ceng û ya bi aşî, xwe dibînim ser miyan

Pişk û para nozde milyonan, eger çi tê heye  
Ne guman û ne bi xewnan, pir di xama xwendevan

Xwende ev dîlî ne ar e, tu dibîni ev zeman  
Miletê te tarûmar e, maye bin dar û piyan

Deftera xwe tu hilîni, têxî taq û pencerê  
Zadê bê cî tim biçîni, hilgirî barê dizan

Ser di berda stû xwarî, rengê pîrê ser gilok  
Bêhiş û tevdîr û korî, dost û yarê xergelan

Mêze çir nakî cihanê, ku hemî serxwe dibûn  
Tu tenê mayî di xanê, mayî ber xaçê riyân

3.9.1965

# **Rewşa Kurdan di dîroka Îbn Xeldûn de**

*Wek ku xwendevan jî dizanin berê jî hinek ji cihên vê berhema Îbn Xeldûn ya tarîxê hatibûn wergerandin û di hinek hejmarên Çirayê de hatibûn weşandin. Ji ber ku di hejmara 6'an ya Çirayê de li ser jiyana Îbn Xeldûn û vê berhema wî ya giranbiha hatibû nivîsandin min pêwîst nedît ku li vir careke din ez wê dubare bikim.*

*Ji xwe Çawa ku ji jêrenotan jî tê zanîn dema wergerandina van cihan min ew hem bi berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamîl fi et-Tarîx re û hem jî di hinek cihan de bi berhema Îbn el-Ezreq el-Fariqî ya Tarîxa Meyyafarqîn û Amedê re ku M. E. Bozarşlan bi navê "Mervanî Kürtleri Trihi" ew wergerandiye Tirkî û bi ya Ebdurreqâb Yûsuf ya bi navê ed-Dewle ed-Dostikiyye fi Kurdistan el-Wusta re rûbar kiriye. Herweha min ew jêrenotên berhema Îbn Xeldûn ku ji aliyê weşanxaneyê ve jî hatibûn nivîsandin pê re wergerandiye.*

**Emîn Narozi**

**Ji Kîtab el-Îber We Dîwan el-Mubteda we el-Xeber  
fî Eyyam el-Ereb we el-Ëcem we el-Berber (Îbn Xeldûn)**

**Piştî 'Hemdaniyan Dewleta Merwaniyan Li Diyarê Bekir û  
Destpêka Kar û Barê wan û Rewşa Tevgera Wan**

*Ya rastî diviyabû ku em li pey dewleta 'Hemdaniyan rewşa vê dewletê bibêjin, çawa ku me ya El-Muqellediyan li Mûsilê û ya Benî Salih îbn (kurrê)*



Mirdas jî li Helebê got. Çiku ev hersê dewlet jî ji nav dewleta wan derketine û şax dane, bes Merwanî bi xwe ne Ereb in lêbelê ew Kurd in û ji ber vê yekê jî me dewleta wan anî xiste nav rêza ya biyaniyan [yên ne Ereb], lê me ew hişt piştî dewleta Benî Tûlûn, çimkî dewleta Benî Tûlûn gellek li pêşiya ya wan bû. Niha jî dê em dest bi nûçeyên dewleta Merwaniyan bikin:

Ji xwe li pêş meseleya Badê Kurdî ku navê wî Huseyn îbn (kurrê) Dûşik<sup>1</sup> û paşnavê wî jî Ebû (Bavê) Şeccaş bû, bihurî. Herweha dîsa bihurî ku ew xalê Ebû 'Elî îbn Merwanê Kurdî bû, wî dest danîbû ser Mûsil û Diyarê Bekir [herêma Diyarbekir] û gelş di nav wî û Deylemiyan de derketibû, lê piştî zora wî çûbû û ew hilkişiyabû çiyayên Kurdan. Di duvre 'Edu ed-Dewle û Şeref ed-Dewle mirin, Ebû Tahir Îbrahîm û Ebû 'Ebdullah el-'Hesen hatin Mûsilê zeft kirin, bes di nav wan û Deylemiyan de jî nakokî derket. Li ser vê yekê dilê Bad jî ku hingê li Diyarê Bekir dima, bijiya Mûsilê û rabû ber pê ve çû, lê herdu kurrên Nasir ed-Dewle zora wî birin û ew di cingê de hat kuştin, çawa ku li pêş jî ev bûyer giş derbas bûn.

Dema ew hate kuştin xwarziyê wî Ebû Elî îbn Merwan ji şer filitî û çû gihîşte Husni Keyfa [Heskîfê] ku malbata Bad û zexîreya wî li wir bû û yek ji keleyên wî yên asêtirîn bû. Wî ji bo ketina keleyê bi hîle diyar kir ku xalê wî ew şandiye, ta ku kete hundurû rabû dest danî ser keleyê û jinxala xwe mar kir. Piştî ew li navçeya Diyarbekirê geriya û milkê xalê xwe Bad tev zeft kir. Di wê navê de dema ku wî jî dora Meyafarqînê girtibû herdu kurrên 'Hemdan êrîşî ser wî kirin lê wî ew şikandin. Piştî dema ew li ser Amedê bû careke din ew zivirîne ser lê cara diduyan jî şikestin. Rewşa wan ji Mûsilê ve têk çû û Ebû Elî îbn Merwan Diyarê Bekir giş zeft kir. Xelkê Meyafarqînê ku rîspiyê wan Ebû el-Esxa<sup>2</sup> bû destê xwe dirêjî wî kir lê wî dengê xwe nekir haya ku roja cejnê hat û ew derketin çolê. Li çolê wî êrîşî ser wan kir Ebû el-Esxa girt, di sûrê de avête xwar û Kurdan dest danî ser bajêr. Ebû Elî deriyan li ser wan [xelkê bajêr] girt nehişt ku ew têkevin hundurû û heryek ji wan bi riyekê ve çûn. Hingê sala 380/990<sup>3</sup>î bû.

### **Kuştina Ebû Elî îbn Merwan û mezinatiya birayê wî Ebû Mensûr**

Ebû Elî îbn Merwan bi qîza Se'd ed-Dewle îbn Seyf ed-Dewle [yê emdanî] re zewicî bû, wî ew bi lez ji Helebê da anîn ku li Amedê jê re qesrekê ava bike. Hingê rîspiyê wan tirsîya ku tiştê anîbû serê meyafarqîniyan dê bine serê wî û amediyan jî û hevalên xwe li ser vê yekê haydar kir. Wî ji wan xwest ku dema ew têkeve hundurû ew ziv û zêr li ser bireşînin, bavêjin ser û çavên wî û paşî lêxin.<sup>3</sup> Wan jî wusa kir, ew mijûl kirin û ji nedî ve derbekê li serê wî xistin. Hevalên wî li hev qelibîn, di wê navê de amediyan serê wî jî avêtin cem hevalên wî yên Kurd û ew jî bi paş ve dageriyan Meyafarqînê. Parêzgerên wê ketin

gumanê ku dê ew Meyafarqînê zeft bikin û ji ber vê yekê nehiştin ew têkevin bajêr lê piştîre dema birayê Ebû Elî Muhîd ed-Dewle<sup>4</sup> Ebû Mensûr îbn Merwan hat gihîşt bajêr hingê pasbanan rê dayê ku têkeve û wî ew der [Meyafarqîn] zeft kir. Ji sikke (diravçêkirin) û xutbexwendinê pê ve tişteki din ku bike jê re nemabû.

[Dema ew hat ser hukum] birayê wî Ebû Nesr dijî wî rabû û pê re berberî kir, lê Ebû Mensûr zora wî bir û wî şand keleya Sêrtê, bes wî li wir jî timî jê re zehmetî derdixist. Heçî Amed heya demeke dirêj di destê şêxê wan ‘Ebdullah<sup>5</sup> de ma. Wî qîza xwe jî dabû îbn Dumneyê ku kuştina Ebû Elî îbn Merwan girtibû ser xwe; lê wî [Îbn Dumne] ew [‘Ebdullah] jî kuşt, dest danî ser Amedê û li ber sûrê qesrek ji xwe re ava kir. Di pey de ew kete ber fermanrewahiya Muhîd ed-Dewle, nava xwe û wî xweş kir, perû ji qiralê Romê, xwediyê Misrê û şahên din re şandin û nav û dengê wî belavbû.

### **Kuştina Muhîd ed-Dewle îbn Merwan û mezinatiya birayê wî Ebû Nesr**

Muhîd ed-Dewle li Meyafarqînê dima û di nav dewleta wî de desthilatdariyeke xurt ya serokleşkerê wî Şirwe [Şêrwe] hebû. Wî jî zebt û rebtê sipartibû koleyekî xwe ku Muhîd ed-Dewle zahf jê aciz bû û gellek caran dixwest wî bide kuştin lê ji ber xatirê şirwe dîsa dev jê berdida. Carekê gava ku koleyê Şirwe çû hizûra wî jê re fizûliya (fesadiya) Muhîd ed-Dewle kir û nava wan xera kir. Demek di pey de dema ew [Muhîd ed-Dewle] çû cem, wî [Şirwe] rabû ew kuşt ku hingê sala 402/1011’yan bû û dûvre weke ku ew bi fermana Muhîd ed-Dewle here, çû dest danî ser heval, meriv û pismamên wî tev.<sup>6</sup> Piştî ew meşiya heya Meyafarqînê, wan bi ceweta Muhîd ed-Dewle jê re derî vekir, ew kete bajêr û ew der zeft kir. Wî dest pê kir li ser devê Muhîd ed-Dewle ji xwediyên keleyan giş re name nivîsand û sipartina keleyan ji wan xwest. Di nav wan de xwediyê keleya Erzena Romê [Xirebajar] Xwace Ebû el-Qasim, keleya xwe neda kesekî û [ji bo eseyîkirina xeberê] berê xwe da Meyafarqînê. Di rê de ew bi kuştina Muhîd ed-Dewle hisiya û ji nivê rê car din bi paş ve zivirî Erzenê. Wî şande pey Ebû Nesr Îbn Merwan, wî ji Sêrtê anî û bire cem bavê wî Merwan ku hingê tadeyî gihîştibûyê û ji bêgavî bi jina xwe re derketibû çûbû Erzenê ser gora kurrê xwe Ebû Elî. Ew jî çûne cem, wî li hizûra bavê wî û li cem gora birayê wî ew da sondê û Erzenê dayê. Di wê navê de Şirwe jî ji Meyafarqînê mirov ji bo girtina Ebû Nesr Îbn Merwan şandibû Sêrtê lê hê berî hingê ew gihîştibû Erzenê jî; bi vê re jî ew [Şêrwe] têgihîşt ku dawiya wî hatiye. Piştî Erzenê Ebû Nesr deverên Diyarê Bekir yê din jî girt, bi bernavkê [leqeba] Nesîr ed-Dewle hate bi nav kirin û dewra wî dest pê kir. Wî xuyê xwe xweş kir û ji ber vê yekê jî ji her deverên cîhanê gellek zana û şar eza lê kom bûn. Yek ji wanên ku qesta wî kiribûn Ebû ‘Ebdullah el-

Kazerûnî bû ku li hêla Diyarê Bekir mezhebê şafi'î pê belav bû. Gellek şa Şir û helbestvan lê civiyabûn, pesnê wî didan û wî jî ew perû [xelat] dikirin. Di dema wî de ew gelî û birrekên wan deveran tev ewle man û teba [reşye] û xwelêgirtiyên wî jî heya dema mirina wî di welatê xweştrîn de jiyân.

### **Vegirtina Nesîr ed-Dewle'îbn Merwan bi ser Ruhayê ve**

Bajarê Ruhayê di destê 'Uteyr [en-Numeyrî] de bû, wan [ruhayîyan] ji Ebû Nesr îbn Merwan re nivîsand û jê xwestin ku here wê vegire. Wî jî cîgirê xwe yê Amedê ku navê wî Zenk [Zeng îbn Ewan] bû şande wir û ew der zeft kir, lê wî ['Uteyr] bi riya Salih Îbn Murdasê xwediyê Helebê ji Îbn Merwan hêviya bexşînê kir, wî jî ew bexîsand û nivê bajêr dayê. Ew ['Uteyr] çû Meyafarqînê cem Nesîr ed-Dewle, wî qedrekî baş dayê û ew şande Ruhayê ku bi Zenk [Zeng] re li wir bimîne. Ew çend rojan bi Zenk [Zeng] re bi aştî ma lê di wê navê de kurrê wî cihgirê ku wî ['Uteyr] ew kuştibû hate wir.<sup>8</sup> Zeng ji bo heyfhilanînê nav tê da û dema ew ['Uteyr] derket wî jî da pey, ji bo tolgirtinê lê kire gazî. Çaxê xelkê çarşiyê ev yek buhîst ji nedî ve avêtin ser û wî bi sê hevalên wî ve kuştin. Benî Numeyriyan jî li dervayî bajêr ji Zeng re kemîn danîn û hinek êrîşkaran şandin ser, gava Zeng bi leşker ve derket û kemîn derbas kir hingê wan êrîş birê. Di şer de kevirek lê ket û ji ber derba wî kevirî ew vegirê (fatihê) hijdemîn mir û Ruha jî ji Nesîr ed-Dewle re ma. Piştî Salih Îbn Murdas ji bo Îbn 'Uteyr û Îbn Şibil mehderî (şefa Şet) kir û navçe car din li wan hate zivirandin heya ku Îbn 'Uteyr çawa ku wê li pêş jî bê, ew der firote dewleta Romê [Bizansiyan].

### **Dorgirtina Bedran ibn Muqelled ya Nuseybînê [Nisêbînê]**

Nuseybîn [Nisêbîn] di destê Nesîr ed-Dewle îbn Merwan de bû gava ku Bedran îbn Muqelled bi koma 'Uqeyliyan ve çû ser û dora wê girt. Wî zora wan leşkerên ku li wir bûn bir, lê Nesîr ed-Dewle hinek leşkerên din şande alîkariya wan. Bedran hinek mirov şandin pêşiya wan û ew şikandin lê Îbn Merwan jî leşkerekî pirrtir li hev civand û wan şande Nuseybînê. Ew çûne ser [Bedran] û cara pêş ew şikandin bes piştr e dîsa ew li wan fitilî û êrîş wan kir. Wî her li şerê wan domand heya ku bihîst birayê wî Qerwaş gihîştîye Mûsilê; ew jê tirsîya û ji ser wir rabû.

### **Ketina Xuzziyan [Oxuziyan/Oğuz Oğulları] ya Diyarê Bekir**

Ev Xuzzi [Oxuzî] ji hinek qebileyên Turkan in û eslê Sulcûqiyan [Selcûqiyan] jî ji wan tê. Ji xwe li pêş bihurî ku çawa dema ew gihîştin Xorasanê Muhemmed îbn Sebektekîn [Sibiktekîn], Erslan [Arslan] îbn Sulcûq [Selcûq] girt û ew avête zindanê, herweha ew xirabiyên ku li Xorasanê kiran û ew êrîşa

Muhemmed îbn Sebektekin ku piştî mirina bavê xwe Mehmûd bire ser wan û ew bi çolê ve reviyên çûne Azerbaycanê cem wan Xuzziyên ku berê li wir bûn, bihurî. Piştî ku ew nikaribûn têkevin **Hemezân, Qezwîn û Ermenîstanê** rabûn çûn xelkê Îraqê şewitandin. Yê din jî ji Azerbaycanê hatin derxistin û **Wehşûzanê** xwediyê **Tebrîzê** jî tibabek ji wan kuşt. **Kurdan** jî nehişt ew têkevin nav wan û ew talan kirin. Dûvre dema nûçe gihîşte wan ku birayê **Sultan Tuxrul Beg Niyal Îbrahîm bi Reyyê** ve çûye, di wê sala 433/1041'an de ew ji wir bi lez reviyên çûne Azerbaycanê, lê dîsa xeber hat ku Niyal li pey wan e, wan ji tirsê ji wir jî bazda, çiku ew re'yeyên wî û birayê wî bûn.

Dema ew reviyên rêbir ew di çiya û zozanan de birin haya ku gihîştin deşta **Cezîreya îbn 'Umer [Cizîra Botan]**. Ji wir hinek ji wan çûne **Diyarê Bekir**, wan **Qezwîn, el-Husniye û Yazîdiyê** bi zor zêft kir, hinek ji wan jî li hêla rojhilatê **Cizîrê** man û yê din çûne **Mûsilê**. **Suleymanê kurrê Nesîr ed-Dewle** li wir nazir bû, wî ji bo lihevhatinê şande pey wan bi şertê ku ew bi wan re here herêma **Şamê**, wan jî qebûl kir. Piştî **Suleyman ziyafetekê** da, **Ibn Xuzz [Oxuz] Elî** vexwendê û ew girt, avête zindanê. **Xuzzî [Oxuzî]** bi herhêlê ve reviyên û leşkerê **Nesîr ed-Dewle**, yê **Qerwaş** û yê **Kurdên Besnewî**<sup>9</sup> dane pey wan. Piştî dema **Ereb** ji bo lêderbaskirina zivistana xwe çûne Îraqê hingê **Xuzzî** jî zivirîne **Cezîreya îbn 'Umer** û dora wê girtin, wan **Diyarê Bekir** bi kuştin û talanan xira kir. **Nesîr ed-Dewle** xwest ku bi berdana **Mensûr ibn Xuzz Eli** ku **Suleyman** ew hebis kiribû, bertîl bike lê berdana wî têrî rawestandina xirabiyên wan nekir û ew heya **Nuseybîn, Sencar û Xabûrê** pê ve çûn. **Qerwaş** jî çawa ku me li pêş jî diyar kir, kete **Mûsilê** lê qefleyek ji wan [**Xuzziyan**] jî dane pey û ew bûyerên ku me di behsa wî [**Qerwaş**] de derbas kir di nav wî û wan [**Xuzziyan**] de çêbûn.

## **Çuna Romê ber bi welatê**

### **Merwaniyan ve û Vegirtina Ruhayê**

Dema doza 'Elewîtiyê li **Şam** û **el-Cezîreyê** belabû ku sedemê wê jî xwendina xutbeyê li ser navê wan ji aliyê xwediyê **Herranê** û **er-Reqeyê Wîsab en-Numeyrî** bû û **el-Wezîrî** ji aliyê **Şelewîyan** ve bû waliyê herêma **Şamê** hingê wî gef li **Îbn Merwan** xwarin ku dê ew here bavêje ser welatê wî. **Îbn Merwan** ji xwediyê **Mûsilê Qerwaş** û ji xwediyê **er-Reqeyê Şebîb ibn Wîsab** daxwaza alîkarî, hevkarî û rakirina doza 'Elewîtiyê kir, wan jî erê kir, xutbeya ser navê **el-Mustensir birrîn** û dest pê kirin xutbe li ser navê **el-Qaîm** xwendin. Sal hingê 430/1038 bû; **el-Wezîrî** dîsa rabû ser zengoyan û gef li wan xwar. Li ser vê **Îbn Wîsab** careke din dageriya ser **Xutbeya 'Elewîtiyê** ku hingê ketibû meha **zulhecceyê** [meha dozdemîn ji salnameya hîvî yî koçî ye] û bûbû dawiya salê.

### **Kuştina Suleymanê Kurrê Nesîr ed-Dewle**

Nesîr ed-Dewle kurrê xwe Suleyman ku bi Ebû Herb el-Umûr jî dihate nasîn [li hêla Cizîrê] kiribû walî. Di hingê de li el-Cezîreyê (Cizîrê) Mûşîk [li pêş Mûşîk bihûrî] îbn el-Muhellî ku mezinê hinek keleyên wan deran bû, pê re hemberî dikir û li ser vê yekê di nav wan de dijîtî derket. Piştî Suleyman rabû xwe bi ger û fen nêzî wî kir. Ji ber ku xwediyê keleya Fenîkê û hinek keleyên din Mîr Ebû Tahirê Besnewî yê xwarziyê Nesîr ed-Dewle dostê Suleyman bû, ew rabû wî ew Mûşîk] bi qîza Ebû Tahir re zewcand heya ku ev yek bû sedemê nêzîkayiya navbera wan û dilê Mûşîk li Suleyman vebû, piştî xwe dayê û çû şerrê Dewleta Romê [Bizansiyan] li Ermenistanê. Nesîr ed-Dewle ibn Merwan alîkariya mal û leşker pê re kir, ji xwe berê jî wî li ser navê wî ([Nesîr ed-Dewle] xutbe dixwend û bi ya wî dikir. Wî Mehdera Mûşîk kir lê Suleyman ew zû kuşt û ji Tuxrul Beg re got ku: "Ew miriye". Ji ber bikaranîna wî [Suleyman] qîza Ebû Tahir ku ew dabû Mûşîk, ji bo vê kuştinê Ebû Tahir bi awayekî manedar jê re spasî kir, lê Suleyman jê tirsîya û ji bo bûyerê daxwaziya berîbûnê jê kir. Wî jî ew pejirand, daxwaza hevdîtîne li Suleyman kir û ji bo wê yekê jî ji kelaya xwe ya Fenîkê dakete xwar. Suleyman jî bi çand kesan ve derkete pêşiyê, lê Ubeydullah<sup>10</sup> ew kuşt û çû gihîşte wan kesên ku dijî bavê wî rabûbûn. Ev nûçe gihîşte Nesîr ed-Dewle, ew jî rabû wî kurrê xwe Nesîr<sup>11</sup> digel leşker ve ji bo parastina Cizîrê şande wir. Qureyşê Kurrê Bedran gava ev bûyer bihîst, temê wî avête milkê Cezereya îbn 'Umer [Cizîra Botan] û çûyê. Kurdên Husniye û yên Besnewî jî bûne yek û ji bo kuştina Nesîr ibn Merwan gihştin hev, lê wî bi wan re xweş şer r kir û welatê xwe qenc parast. Di cengê de Qureyş bi çend ciyan birîndar bû û dageriya Mûsilê, Nesîr ibn Merwan li Cizîrê ma û Kurd jî li hember wî.

### **Çûna Tuxrul Beg Ber Bi Diyarê Bekir Ve**

Dema Tuxrul Beg çû Mûsilê û ewder zeft kir serê pêşî Qureyş ji wir r eviya lê piştî e di sala 448/1056'an de zivîrî û kete ber fermana wî. Dûvre Tuxrul Beg ji wir berê xwe da hêla Diyarê Bekir û çû dora Cezîreya ibn 'Umer [Cizîra Botan] girt. Di çûyina wî [Tuxrul Beg] ya ser Mûsilê û dagerandina wî de Îbn Merwan jî di ber xizmeta wî de bû û jê re diyariyên curbicur şandibû. Wî ji ber cizîrê ve jî mal dayê û diyar kir ku dê li kêleka wî têkeve wî şerrê pîroz û pê re geliyan biparêze. Tuxrul Beg hingê dorgirtina ser wî rakir û çû hêla Sincarê, çawa ku me di bûyerên Qureyş de jî got.

### **Mirina Nesîr ed-Dewle Îbn Merwan û mezinatiya Kurrê wî Nesr**

Di sala 453/1061'ê de Nesîr ed-Dewle Ehmed ibn Merwanê Kurdî yê xwediyê Diyarê Bekir ku nasnavê wî el-Qadir Billah bû, pêncî û du sal piştî ferman-dariya xwe mir. Deverên bin destên wî pîr bûbûn, malê wî zahf bûbû

û di wan gelî û birrekan de berhemên baş da bû. Wî gellek perû û diyariyên hêja dida sultan Tuxrul Beg. Ew werîsê yaqûtfî yê Buweyhiyan ku wî ji Ebû Mensûr îbn Celal ed-Dewle kirîbû jî di nav wan de bû ku pê re sedhezâr dînar jî jê re şandibû û ji ber vê yekê jî wî [Tuxrul Beg] rûmeteke baş dabûyê. Wî bi bihayê pêncsed hezar dînanan û zêdetir jî cariyê ji melîkên mezin re dikirî da ku demeke xweş bi wan bide jîyan û dilên wan şa bike. Ji bo razan û qerwaşiyê ji hezarî bêhtir cariyê li cem wî hebûn. Firaq û aletên muzîkê yên wusa bi qîmet ku bihayê wan ji dused hezarî zêdetir bûn, li cem wî peyda dibûn. Wî qîzên şah û milûkan li hev civandibû û bi wan re zewicîbû. Ji bo xwarinpêjîyê aşpêjan şandibû diyarê Misrê û qût û mûnetên wan jî dabû heya ku li wir fêrî aşpêjîyê bûbûn. Ebû el-Qasim îbn el-Mexribî ku mirovekî pêş yê dewleta 'Elewiyên Misrê bû û Fexr ed-Dewle jî ku pêşewayekî dewleta 'Ebbasiyan bû, çûne cem; wî ew qebûl kirin û kirin wezîrên dewleta xwe. Çi helbestvanên ku çûne cem qencî bi wan re hate kirin, zana û şarezayên ku qesta wî kirin cihê wan li cem wî bilind bû û dema ku di sala [453/1061'ê]<sup>12</sup> de mir hingê ew serkeftin ji Nesr re ma; ew li Meyafarqînê rawestiya lê birayê wî Seşîd çû Amedê, ew der zeft kir û li ser vê yekê li hev kirin.

### **Mirina Nesr ed-Dewle û Mezinatiya Kurrê wî Mensûr**

Piştîre Nîzamuddîn Nesr îbn Nesîr ed-Dewle di zilhecceya sala 472/1079'an de mir, kurrê wî Mensûr kete cihê wî û Îbn el-Enbarî jî dewleta wî gerand. Ew li ser femandariya dewleta xwe ma heya dema ku Îbn Cuheyr hat, avête ser û welêt ji destê wî derxist.

### **Çûna Îbn Cuheyr Ber bi Diyarê Bekir ve**

Fexr ed-Dewle Ebû Nesr Muhemmed îbn Cuheyr ji xelkê Mûsilê bû û berê ji cariyeya Qerwaş re û piştîre jî ji birayê wî Bereke re xizmet kiribû û ji cem wî ji Qeyserê Romê re qîzên ezep biribû. Piştîre ew kete ber xizmeta Qureyşê kurrê Bedran jî ku paşînê xwest wî bavîje zindanê lê bi kefîltiya yekî Benî ŞUqeylî xelas bû û çû Helebê. Li wir ew bû wezîrê Me'z ed-Dewle Ebû Summal îbn Salih. Ji wir jî ew çû 'Etiyyeyê û rastî Nesîr ed-Dewle îbn Merwan hat; wî ew kire wezîrê xwe û rewşa dewleta xwe pê li hev anî. Dema ew di sala 453/1061'ê de mir hingê wî [Fexr ed-Dewle] kar û barê Nesrê kurrê wî yê ku kete cihê wî li hev rast kir lê piştîre di sala 454/1062'yan de reviya çû Bexdadê ku hingê li wir wezîrtî jê re hatibû pêşkêşkirin. Ew piştî Muhemmed îbn Mensûr îbn Du'ad<sup>13</sup> bû wezîr. Di pey de gellek caran ew û kurrê wî 'Emîd el-Melîk ji kar hatin avêtin û car din li kar hatin zivirandin; herweha ew kete ber xizmeta Nîzam el-Mulk û Sultan Tuxrul Beg jî.

Dema kurrê wî cara dawî ji ser kar hate avêtin hingê li cem Xelîfe

mehderiya wî hatibû kirin û Sultan û Nîzam el-Mulk şandinbû pey wî û kurrê wî û pismamên wî giş. Ew çû Esfehanê cem wî [Sulatan] û qedir û rûmeteke baş li wir dît. Wî [sultan] tevî leşker ew ji bo vegirtina Diyarê Bekir û sitandina wir ji Merwaniyan birê kir. Wî alet danê û destûr jî dayê ku di xutbeyê de li pey navê Sultan navê xwe bixwîne û wêneyên xwe li ser diravan bikêşe. Ew di sala 476/1083'yan de ji bo vê yekê bi rêket.

### **Vegirtina Îbn Cuheyr bi Ser Amedê ve**

Ji xwe me li pêş qala çuna Fexr ed-Dewle îbn Cuheyr tevî leşker ber bi Diyarê Bekir ve kiribû. Piştî wê di sala 477/1084'an de Sultan, Erteq îbn Eksek bi leşker ve şandibû alîkariya wî. Nesr îbn Merwan ji Şeref ed-Dewle Muslim îbn Qureyş alîkarî xwestibû û ji wê bonê sozê dana Amedê pê re dabû, wî jî qebûl kiribû û çûbû piştgiriya wî. Fexr ed-Dewle îbn Cuheyr ji ber merivatiya Ereban ji cenga bi wan [Nesr û Muslim] re vekişiya, lê Erteq dijî wî derket û bi Tirkan ve çû şerê wan û ew şikandin. Ew çû li Amedê gihîşte Muslim û ew li wir xiste hesarê lê wî mal da Erteq û xwe ji ber xelaskir çû er-Reqeyê. Îbn Cuheyr jî berê xwe da Meyafarqînê lê Mensûr îbn Mezyed, kurrê wî Sedeqe û Ereben pê re dev jê berdan û ji wir fitilîn. Fexr ed-Dewle çû devera ku bi navê el-Qurm tê naskirin, li wir peya bû û hesara ser wê teng kir. Rojekê yek ji parêzgirên ji sûrê hate xwar û cihê xwe vale hişt, yekî amî rabû çû cihê wî û siloganên (duruşme û nîşanên) Sultan gotin; parêzgerên din yên ser sûrê jî li pey wî çûn û xeber şandin cem Ze'im er-Ruesa' Îbn Cuheyr. Ew siwar bû û çû di sala 478/1085'an de dest danî ser bajêr. Xelkê bajêr malê Filleyên (xiristiyanên) ku di bacgeh û deyndarvaniyê [tehsîlata bac, zikat û deynan] de ji Merwaniyan re xizmet dikirin, talan kirin û bi vê yekê jî heyfê ji wan hiltanîn, lê Xwedê çêtir dizane.

### **Vegirtina Îbn Cuheyr ya Meyafarqîn û Cezîreya**

#### **Îbn 'Umer [Cizîra Botan] û Dawiya Dewleta Merwaniyan**

Dema Fexr ed-Dewle îbn Cuheyr kurrê xwe şand Amedê ew jî çû bi ser Meyafarqînê ve girt û heya sala 477/1084'an li ser ma. Se'd ed-Dewle û Kuhrayîn jî hatin alîkariya wî û her ku çû wî jî hesarê li wan teng kir. Rojekê sûr hat neqeb kirin û xelkê tê de sloganên (duruşme û nîşanên) Melîkşah avêtin, hingê Fexr ed-Dewle jî kete bajêr û ew der vegirt. Wî dest danî ser pertal û gencîneyên Merwaniyan û bi kurrê xwe Ze'im er-Ru'esa re ew ji Sulatan Melîkşah re şandin, di şewala [meha dehan ji salnameya koçî yî hîvî ye] sala 478/1085'an de ew gihîştin Esfehanê û Fexr ed-Dewle û Kuhrayîn jî çûne Bexdadê. Wê hingê wî leşker şandibû ser Cezîriya îbn 'Umer jî ku dora wê bigirin. Malbateke xuyanî ya bajêr ku bi mala Benî Ruhhan dihate nasîn, li ber wan [Merwaniyan] rabû û çû deriyê bajêr yê piçûk ku [navê wî] Neqeba

Mêraniyê bû, vekir. Leşker çûn di wir de ketin bajêr û li ser navê Sultan Melikşah ew der zeft kirin. Bi vê yekê Dawiya dewleta Merwaniyan hat û Mensûrê kurrê Nîzamuddîn Nesr ibn Nesîr ed-Dewle li Cezîreyê xwe avête herêma Xuzziyan. Piştî Cekermîş ew girt û di xaniyê yekî cuhû de hebis kir ta ku di sala 489/1095'an de li wir mir. Mayîna hertimî bi tenê ji Xwedê re ye.

Wergera ji Erebî:

Emîn Narozî

---

### Têbinî:

1. Li pêş Dûştik bihurî (Îbn Xeldûn Kitab el-el-îber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berbeş Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, c. 4, r274) Herweha li gor Ebdurreqîb Yûsuf ew "Dostik" e. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 23). Li cem Îbn el-Esîr jî hem "Dostik" û hem jî "Dosik" tev tê lê ew di şûna "Bad" de nasnavê wî wek "Baz" dide. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 35)
2. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf û Îbn el-Esîr navê wî "Muhemmed ibn Ebî es-Seqer" e. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 67; Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 72)
3. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf ku jî Îbn el-Ezreq el-Fariqîgirtiyê, ev bûyera kuştina Ebû Elî bi dek û dolab û navtêdana Şêrweyê nivîskar û dergevanê wî çêbûye. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 69-70)
4. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf û Ibn el-Esîr "Mumehhid ed-Dewle" ye. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 71; Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 73)
5. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf û Îbn el-Esîr "Ebd el-Berr" e. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 69; Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 72)
6. Li gor Îbn el-Ezreq el-Fariqî ew kurrê Şêrwe Feyles bûye û sala bûyerê jî 400/ 1009 yan jî 401/1010 bûye. (Îbn el-Ezreq el-Fariqî, Mervani Kûrtleri Tarihi, Koral Yayınları, n. p. 1975, wergera Tirkî M. E. Bozarslan, r. 101). Li gor Îbn el-Esîr jî Şêrwe li keleya Hetaxê ku hingê sipartiyê wî bûye ziyafet daye û Mumehhid ed-Dewle jî vexwendiyê serdema ew çûye wir Şêrwe bi hîle ew daye kuştin. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 73)
7. Li gor Îbn el-Ezreq û Ebdurreqîb Yûsuf nasnavê wî "Nesr ed-Dewle" ye. (Îbn el-Ezreq el-Fariqî, Mervani Kûrtleri Tarihi, Koral Yayınları, n. p. 1975, wergera Tirkî M. E. Bozarslan, r. 107; Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 80)
8. Li gor Îbn el-Esîr berê ew der di destê 'Uteyrê Numeyrî de bûye ku mirovekî pirr xerab û nezan bû. Wî jî yekî bi navê Ehmed kiriyê cihgirê xwe ku gellek bi dadmendî bajêr idare kiriyê û wî xweş li hev gerandiyê. Çawa ku xelk ji ber bêdadî û bêidaretiya 'Uteyrê jê aciz



bûye wusa jî ji cihgirê wî Ehmed xweş û jê re beremir bûye. 'Uteyr bi xwe bi tenê carna hatiye bajêr lê wekî din timî ew di kêf û sefaya xwe de bûye. Di wê navê de carekê gava ew hatiye wir û ditiye ku xelk çiqas ji cihgirê wî xweş e, ew jê hesidiye û rabûye maniya xwarina mal û milk lê kiriye û ew kuştiye. A li ser vê yekê xelkê bajêr rabûye name ji Nesr ed-Dewle re nivîsandiyê û jê hêvî kiriye ku here wan ji destê 'Uteyr rizgar bike. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 214 not 190 ku ji Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, rûpelê 120'an hatiye girtin)

9. Li gor Îbn el-Esîr û Ebdurreqîb Yûsuf 'Beşnewî" ye. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 116; Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 24,35)

10. 'Ubeydullah kurrê Ebû Tahir e; li gor Ebdurreqîb Yûsuf û Îbn el-Esîr dema Suleyman Mûsik kuştiye tirsiyaye ku Ebû Tahir li heyfa zavayê xwe bigerê û ji ber vê yekê ew rabûye wî bi jehriyê ew daye kuştin. Loma jî 'Ubeydullahê kurrê wî jî rabûye bi vî awayî tola bavê xwe girtiye. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 116; Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 210)

11. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf "Nesr" e. (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 116) Herweha du beş li jêr di vê berhema Îbn Xeldûn de jî dîsa "Nesr" tê. Li jêr li beşa "Mirina Nesîr ed-Dewle" binihêre!

12. Di eslê wê de ev der jê kêm bû û me di çavkaniyên cem xwe tev de jî cihê mirina wî nedît lê sala mirina wî çawa ku bihurî, 453/1061 bû. (Îbn Xeldûn Kitab el-el-îber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berberç Dar el-Kîtab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, c. 4, r. 283, not 2)

13. Li gor Ebdurreqîb Yûsuf "Durast" e, (Ebdurreqîb Yûsuf, ed-Dewle ed-Dostikiyye fî Kurdîstan el-Wusta, Hoşeng Kurdaxî, Beyrût, 1996, çap 2, beş 1, r. 142)

# Zanîstîya edebî û bîrewerîya dîrokî

N. Zaxuranî

**B**erhemên edebî herdem mal û mewdanê gelekî dîyar in. Ev berhemên hêja û delal bi zimanê wî tînen nivîsandin. Ji xwe, ev berhemên edebî di serdemeke dîrokî yeke dîyar de tînen afirandin. Ji ber vê yekê jî, zanyarîya edebî divê ku heya wê jî peywendîyên di navbera serpêhatîyên dîrokî û hunerî hebe. Ger ku bi vê metodê zanyarîya edebî nêzikî hemû cure pirsgirêkan bibe, dê zanîstîya edebî bi alîkarîya wan peywendîyên nêzik yê dîrokî bikaribe li geş û balbûna jiyana netewî û civakî ya gelên cihanê bi awayekî bi rêk û pêk vekole, mîna şaxekî zanîstîyê ronî bike.

Birastî jî, gava ku mirov li berhemên hunerî yê ku bi vegotina zimên tînen hunandin, dinere, hinganê baş tê xwiyakirin ku ev berhemên hunerî dibine mirêk ji bo serdemeke dîrokî ya netewî. Ev yeka ha jî, ji bo hunera edebî xwedîyê cihêkî xweyî bi reng dîrokî ye. Bi qasî ku tê zanîn, berhemên folklorî yê devkî di mixê gel de tînen daîm tînen jiyandin, bi alîkarîya stranbêj, hozan û çirokbêjan, ji nivîşkî digihin nivîşkî din. Ji ber vê yekê jî, berhemên folklorî di serpêhatina dem û dewranan de çî jî alîyê naverok û çî jî alîyê şiklê xwe ve tînen guhertin. Ji bo lêkolînevanekî ku serê xwe li ser analîzkirina berhemên folklorî tîne, gelekî sext e ku orjînalîteya wan pêşî bibîne. Lê, ji bo berhemên hunerî rewş cuda ye. Lewra ev berhemên hunerî hatine çap kirin û mirov her gav dikare wan bi dest bixîne. Bi vî awayî jî, ev berhemên hunerî yê ku di demeke dîyar ya dîrokî de tînen afirandin, bi sedên salan heta hinek ji wan bi hezarên salan bêyî ku bêne guhertin, hebûna xwe didomînin û xweserîya xwe ya pêşîyapêşî diparêzin. Pîrrên caran ev berhem, bi naverok û şêwe (şiklê)

xwe, ne bitenê heyameke dîrokî, heta mirov karê bi hesanî bibêje ku geş û balbûna netewekî ya kulturî, polîtîkî, manewî û civakî ya konaxeke dîyar di warên hemû jîyanê de ronî dikin. Bi peyveke din, ev berhemên hunerî serdema xwe bi gelek alî karekterîze dikin.

Heke ku ev karekterizekirina li ber çavan newê girtin, dê mirov çawa bikaribe şart û şurutên serdemeke dîyar ligel bûyerên wê yên bi reng dîrokî û civakî dest nîşan bike. Bêyî têgihîştina wan , mirov nikare birewerî û jiyana giyanî ya serdemeke dîrokî hin bibe. Weke ku tê zanîn, bêyî hînbûna wan jî, mirov nikare weha bi hesanî berhemên hunerî şîrove bike. Bela vê yekê jî, divê ku mirovê edebîyatzan zanîstîya disiplinên dîrokî - dîroka netewî, dîroka felsefê û dîroka hunerî - baş bizane û heya wî rind ji encamên lêkolînên dîrokî û ed. hebe. Xwedî têgihîştineke bi pirr alî yeke xweser be. Bi saya têgihîştineke wehayî bi rêk û pêk dê mirovê edebîyatzan bikaribe jiyana netewî û civakî ligel naverok û şiklê wê di hunandina berhemên edebî de himbêz bike.

Bêguman, ji bo mirovê edebîyatzan zanyarîyên dîrokî yên netewî ku jiyana gel ya civakî, sîyasî û peywendîyên ramanî yên di jiyana wî gelê de bi awayekî bi rêk û pêk şîrove dikin, gelekî girîng û bi reng giyanî ne. Berîya hertiştî, mirovê edebîyatzan bi alîkarîya van zanistîyan dibe xwedîyê informasyoneke kronolojîkî. Mînak, hînî fenomen û bûyerên ku di jiyana civakî de tên meydana, dibe. Bê ev bûyer li ku , kengî qewimîne, dest nîşan dike. Ji vê yekê wîrdetir, peywendîyên di navbera wan de li gora cetwelekî dîrokî ku ji bo mirovê edebîyatzan giring e, tê bidest xistin. Ev yeka ha bi serê xwe dibe alîkar ji bo mirovê edebîyatzan ku bikaribe têkilîyên ji hev cuda yên ku di dem û dewranên ji hev cuda de di berhemên hunerî yên ji hev cuda de peydebûne, bibîne. Ango mirovê edebîyatzan bêyî kronolojîyeke bi giştî ya dîrokî û kronolojîyeke edebî ya bi taybet nikare weha bi hesanî hînî dîroka edebîyatê bibe. Heke ku di kronolojîya dîrokî ya welatekî de ne zelalî hebin, dê ji bo mirovê edebîyatzan gelekî sext be ku prosesên ji hev cuda yên edebî ku di welatekî de hatine pê, hîn bibe.

Ji ber ku baş tê zanîn, serdemeke xweser ya dîroka welatekî berîya hertiştî xwe di naveroka berhemên hunerî yên ku di wê demê de hatine afirandin, dide jîyandin. Bi saya vê jîyandinê, mirov liqayî fenomen û bûyerên dîrokî yên bi reng netewî ku ji alîyê hunermendên wê demê ve bi alîkarîya afrandinên hunerî berhem kirine, dibe. Lê, divê baş bê zanîn ku mirovê edebîyatzan bitenê bi vê rastlêhatinê qail nabe. Ji ber ku her xwendewan kare bi hesanî vê yekê bi cih bîne. Heçî mirovê edebîyatzan e, divê ku vê yekê bi gelek alî fehîm bike, anga divê mirovê edebîyatzan rastîya ku ji alîyê hunermendî ve di berhema hunerî de hatîye afirandin, ligel hemû karekterîstîkên civakî yên ku ji bo netewekî giring in, bi alîkarîya belgeyên dîrokî şîrove bike. Ji ber ku, bêyî bidestxistina zanîstîya dîrokî ya konkret nemumkune ku mirovê edebîyatzan

bibe xwedyê têgihîştineke kûr û bi zehv alî. Bi vî awayî jî, mirovê hunermend nikare hînî jiyana ku bi îmajên hunerî ji alîyê nivîskarî ve hatiye hunandin, bibe. Ji ber ku mirovê edbîyatzan nexwedyê zanistîyeke bi gelek alî ye di derbarê mijarên ku nivîskarî serê xwe li ser wan têşand di serdema xwe de.

Pîvanên karekteristik yên ku ji bo serdemekê an jî welatekî giring in, di berhemên ku bi alîkariya zimên tîpê de, ne bi tenê îbaretê ji rastîya ku di naveroka xwe de bi cih û war dikin, tîpê hunandin. Ev pîvanên ha , bê rastî ji alîyê nivîskarî ve çawa tê bêjîng kirin jî, giring e. Lewra, nivîskar di dawîya dawîyê de ferdek ji ferdê civatê yê ku mesubê raf an jî çineke dîyar e. Xwedî hinek peywendîyên organîk e bi dorberên civata ku têde dijî. Mustewa wî ya têgihîştinê ji kesên din yên civatê cuda ye. Aligirê tevgêreke sîyasî û fikrî ye. Bela vê yekê jî, bivê-nevê tevî karûbarên politîkî û kulturî dibe. Ji bilî vê yekê jî, nivîskar xwedyê nerîneke dîrokî ye û ji bo bicihkirina wê di jiyana civakî de kêma an zêde beşdarî kar û xebata rojane dibe.

Bêyî ku mirov bizane bê nivîskar di kujan şart û şurutan de dijî, ji bo çî dinivîsîne, berhemên wî yên hunerî bi çî nerîn û ramanê hatine hunandin, mirov nikare awayê afrandina wî ya hunerî hîn bibe. Ji ber vê yekê jî, mirovê edebiyatzan hewcedarê zanyarîyên din yên dîrokî ye, dîroka netewî, dîroka felsefê û dîroka huner e. Vêca, mirov kare bi hesanî bibêje ku mirovê edebîyatzan ancax bi alîkariya informasyona van zanyarîyan hînî rewşa kulturî û fikrî ya ku di demeke dîyar de li welatekî zal e, bibe. Bi vî awayî jî, atmosfera jiyane ya ku berhema hunerî têde hatiye afirandin, bi gelek alî zelal dibe.

Lê, dive newê ji bîr kirin ku jiyana edebî ya heyameke dîrokî ji alîyê mirovê edebîyatzan ve bi awayekî serbixwe lê bê kolandin, da ku bi vî awayî jî, awayê afrandina hunerî yê nivîskarê berhema hunerî bê têgihîştin. Mirovê edebîyatzan jî, divê ku bikaribe li ser arşivên ku di vê mijarê de bi rumet in, li ser wan mijul bibe. Malzema û metaryalên nû bi dest bixe, metnên edebî yên ku hîn nehatine weşandin, kom bike û zanistîya wan ya bi reng dîrokî şîrove bike.

Ronîkirina awayê afrandina nivîskarî ya hunerî wezîfeyê herî girîng e ji bo mirovê edebîyatzan. Ji bo ku mirovê edebîyatzan bi awyekî bi rêk û pêk bikaribe vê wezîfa girîng ya dîrokî bi cih bîne, divê ku belgeyên cur bi cur bi dest bixîne.

Di destpêkê de divê ku mirovê edebiyatzan heya wî ji name, hevpeyvîn, serpêhatî û berhemên hunerî yê nivîskarî hebe. Di debarê wan de xwedyê têgihîştineke rind be. Herweha divê ku mirovê edebîyatzan bikaribe peywendîyên organîk bi heval û hogirên nivîskarî re deyne, da ku bi vî awayî jî hînî raman û nerînên wan yên di derbarê nivîskarî de bibe. Herçiqas biyografîya nivîskarî ji bo ronîkirina dîroka edebî û naveroka edebiyata netewî ne zehv grîng be jî, divê ku mirovê edebîyatzan kelkê (istîfadê) jê bigre.

Yên ku heta aniha hatin gotin, ra û şewrên giştî yên ku ji bo lêkolîna edebîyatê bikêrî mirovî tî, bûn. Lê, weke ku tê zanîn, her gel an jî netewe bi alîkarîya zimanê xwe edebîyateke xweyî netewî ku ji bilî wan taybetmendiyên jorîn ku behsa wan hate kirin, bi naqşên xweyî netewî dixemîlîne. Bi vî awayî jî, lêkolîna her edebîyateke netewî ku ji aliyê mirovê edebîyatzan ve tê pêk anîn, pêwistî bi zanistîya bitaybet ya dîrokî, filolojî û henerî tê kirin. Lêkolînên di derbarê edebîyatên netewî yên ji hev cuda de hiştina ku di warê edebî de şaxên cuda yên bitaybet bêne peyde kirin. Gelek edebîyatên netewî geş û balbûna xwe ji sedên salan vir de didomînin û di van demên ji hev cuda de her ku diçe, bêtir rengin û dewlemend dibin. Lê, rengînbûna wan jî bi guhertina dem û dewrana re tê guhertin. Bêguman, ji bo ku ev rengînbûn û dewlemendîya ji hev cuda baş tê bê gihîştin, pêwistî bi zanyariyên bitaybet yên di derbarê naverok û şiklê berhemên hunerî de heye. Bi qasî ku tê zanîn, dîroka edebîyatê xwedî konaxên ji hev cuda ye û her konaxek, şaxên edebîyatê yên ji hev cuda di xwe de bi cih û war dike. Vêca, weke ku bi hesanî tê xwîya kirin, heke ku mirovê edebîyatzan ne xwedî têgihîştineke dîrokî yeke kûr û berferah be, dê çawa bikaribe di derbare pîrsgirêkên edebîyatê de mijul bibe.

Ji bo ku mirov bikare xweserîya edebiyata netewî bi hemû detayên wê rind şirove bike, divê muqayesa bê bikaranîn. Bê çawa mirovê edebîyatzan berhemên hunerî yên ji hev cuda di serpêhatina dem û dewranên ji hev cuda de berhemên hunerî yên ku mensubê netewên ji hev cuda ne, muqayese dike, herweha divê ku mirovê edebîyatzan cudabûna berhemên ji hev cuda yên ku mensubê netewekî dîyar in jî, muqayese bike. Ma gelo mirov dikare ji vê yekê re bibêje metoda muqayesekirina edebîyatê? Heke ku mirov bi awayekî vî li pîrsgirêkê binere, hinganê mirov jê re dikare bibêje metoda muqayesekirinê ya edebîyatê. Lê, di aslê xwe de ne weha ye. Ji ber ku ev metoda muqayesekirinê ne bi tenê ji bo edebîyatê tê bikar anîn. Bi giştî di prosesa perwerdekirin û hînkirinê de jî ev metoda tê bikar anîn. Ev metoda bê çawa ji bo hemû şaxên zanyariyê tê bikar anîn, herweha ji bo şîrovekirina praktîka rojane jî dikare kelk (istîfade) jê bê girtin. Bêyî danasandin û muqayesekirina fenomen an jî bûyerên bi reng civakî, dîrokî û hunerî, mirov nikare weha bi hesanî cudabûna wan ji hev veqetîne û bighê encamên bi rêk û pêk. Bêguman, divê ku mirovê edebîyatzan kar û xebata xwe bi tenê bi metoda muqayesekirinê sînor neke. Ji ber ku metoda edebîyatê ya zanistî bi tenê ne ibaretê ji muqayesekirinê ye. Wezîfa herî girîng ya metoda edebî ya zanistî ew e ku peywendiyên di navbera geşbûna jiyana gel û geşbûna edebîyatê de di warê hemû jiyandê de bi awayekî zanistî şirove bike.

Pêkanîna vî wezîfeya gelekî girîng ji bo ronakbîrên gelê kurdistanê zehv sext e. Ji ber ku rewşa welêt bi hemû aliyê xwe li ber çava ye. Hêzên dagirker li her çar aliyê Kurdistanê cengeke bi qerêj li pêşberî gelê kurdistanê bireve

dibin. Hebûna me inkar dîkin, kultura me di warê hemû jiyânê de qedexe dîkin, metaryal û belgeyên dîrokî ji holê radikin. Ji xwe yên ku hîn dibin erdê dene, hêzen kolonyalist tu mecalê nadin ronakbîrên me ku bikaribin li dora wan lêkolînan lidar bixin.

Herçiqas, iro roj li derveyî welêt ronakbîrên gelê kurdistanê di derbarê dîrok, ziman û edebîyata xwe de karû barekî pîroz dîkin jî, ev kar ûxebata wan têr nake ku vê wezîfa girîng ya bi reng dîrokî bi cih bînin. Ji ber ku li derveyî welêt dijîn. Her ku diçe peywendîyên wan yên organîk bi jiyana welati re qels dibin. Bi vî awayî jî, ji bo bicihkirina vê wezîfa gelekî girîng, lê pîrr dijwarî sext, divê ku ronakbîrên gelê kurdistanê tevgera rizgarîxwaz ya gelê kurdistanê organîze bikin. Ji bo rizgarîya welêt çî pêwîst be, divê ku ronakbîrên gelê kurdistanê hewl bidin ku tevgera rizgarîxwaz bi hêztir bikin, da ku bi vî awayî ji bikaribin vê wezîfa xwe ya dîrokî bi cih bînin. Ji ber ku heta em rizgar nebin, dê hemû hebûna me - ziman, edebîyat, dîrok, eborî û ed. - ya netewî ji alîyê hêzên dagirker ve bê weran kirin.

*Stokholm, 24/5/97*

# Gerranewey Estêrekan

Xebat Arif

Eme xoşewîstîy min e!

Lem dinyay pir azarewe, dest be dananî yekem awazim dekem û her le naw em azareş da, kotayî be diwa awazim dehênim. Le naw êweda, ey ew dile bêzaraney, legel yekem firmêskim da erjêne ser rûy em xake û legel yekem firmêskîş da kotayîtan be çawî giryawim debînim. Le naw ewe da ey balindekanî birûske, derrjême naw mezintirîn zeryay xoşewîstî û sûtanewe.

Lew rojewey le naw xoşewîstî û sûtanî êwe da aramim girtiwe w serî xomim kirdote penagay azartan, herçî debînim her gule w le nêwanî pencekanima çiro deka. Herçî ebînim, her xorî tûrebûne w tîşkekanî firê dedate ser dilim. Herçî debînim, her êwen. Boye eşqî hemûtan le çawekanî min da ye w xoşim ewên.

Eme xoşewîstîy min e!

Eme xoşewîstîy min e w ke dûr debin, pir be dilim, tasey gerranewetan dekem û ke lêm nizîk debinewe, emewê bibne baranî mezinî w birjêne çawekanimewe. Eme xoşewîstîy min e, boye le gerdelûlî reştirîn rojekanî jiyanîşim da, êwe rûbarî xoşîn û derjêne perey dilmewe, rêy biyabane wişkekanî bîrkirdinewem lê degrin û îtir ne hezî wişkbûn, ne pelamarî bêûmêdî, nagerênewe bo lam û xoyan le naw xwênekem da heşar naden.

Eme xoşewîstîy min e w bo yekem car ke zimanî eşqim pija, wek rêbwarêkî rêy tenyayî û xoxwardinewe, êwem nasî w le nêw dinyay xewnekantan da malî bûm. Êwem nasî û her lewêwe şetilî yekem nenamekanî azarim, le ser dilim, be xwênekey dilî êwe, be bêzarbûntan geşey kird.

Bêzarbûntan: Ew hêze efsûnawîye ye, fêri kirdûm serim awqay mezintirîn xulya bêt bo diyarîkirdinî cê pêy xom.

Bêzarbûntan: Şalawî ew agire ebedîye ye, ke le nawya pêm girtiwe w fêrî kirdûm, dest le zemîney xoragirtinim gîrkem û bo eşqêkî tir bisûtêm.

Ew eşqey bawer u mezinî bo nêw dile mirdwekanî naw ewe, le tarîktirîn şew da, kêş dekat û fêrî yekem tûrebûne.

Eme xoşewîstîy min e w katê le diwapiley xoşewîstîy da desûtêm, tenya êwen, ey ew dile bêzaraney legel yekem firmêsktan da, derjême ser rûy em xake w fêrim deken, xoşewîstî dirextêke w her liqêkî mewday taybetî xoy heyê w legel yekem firmêskîş da, kotayîm be çawî giryawtan debînin.

1979/8/30



# Kurdên Azerbaycanê, dîroka Laçîn û yên mayin<sup>(\*)</sup>

Şamîlê Selîm Esger

**B**erê pêşîn destûr bidin ez li ser navê kurdên Komara Azerbaycanê we bi dilgermî silav bikim.

Belê, dîrokê şaşîtiyeke mezin kiriye û ji rûyê kurdan re nekeniyaye. Dîrokê welatê kurdan parçe-parçe kiriye. Niha ew çar parçe ye û gelê ji her parçeyan li ser rûyê cîhanê belav bûye. Ji wan kurdan gelek nifûz li Komara Azerbaycanê jiyana xwe derbas dikin. Dîroka kurdên Azerbaycanê gelek kevn e. Tarîx bi me dide zanîn ku kurd berî zayînê (mîlad) bi heft qurnan (sedsala 7'an) li Azerbaycanê hebûne. Gelek dîrokzan hene ku di pirtûkên wan de navê kurdên Azerbaycanê derbas dibin.

Di sedsala heftan de serleşkerê xelîfeyê Bexdayê Selman Îbn Rebiye bi leşkerekî mezin êrîş dibe ser Azerbaycanê. Wî çaxî li Azerbaycanê welatek bi navê Balasakan (Balasîcan, Balasacan) hebûye. Li hember leşkerê Salman Îbn Rebiye, kurdên Balasakanê (Balasakan navê eşîreke kurd e) demekê li bi ber xwe didin û bi mêranî şer dikin. ("Azerbaycan Tarihi Üzerine Kaynaklar", Bakû, 1989, r. 68-69). Em di vê pirtûkê de dikarin du navên eşîrên kurd - Seturdan û Sabalan- bixwînin.

Di sedsala XI-XII'an de navê çemê Terterê (li Azerbaycanê) "Ava Kurd-

---

(\*)Ev gotar di 21'ê îlona 1996'an de di konferansa Kurd û Bajar (The Kurds and the City) de, li bajarê Sévresê li Fransayê hatiye pêşkêşkirin. Me di hejmara 7'an a Çirayê de di derheqa konferansê de agahdariyeke kurt dabû xwendevanan. Ji ber ku destûra gotarê dan me, em gelek spasî amadekarên konferansê dikin.

Elem” bûye (Îsa Huseynov, ”Mehşer”, Bakû, 1978, r. 141).

Ji sala 951 ta salên 1174’an kurdên eşîra Şeddadi li bajarê Divîn (951-974), paşî li bajarê Gence (951-1174) hukumdarê Azerbaycanê bûne. Hukumdariya Şeddadiyan 223 salan dom kiriye. Wê çaxê diyarê Azerbaycanê gelek avan bûye û bi pêş da bûye. Helbestvanekî Azerbaycanî pîrr menşûr bi navê Qetran Tebrîzî, di derheqa hukumdarên Şeddadiyan de zêdeyî 200 helbestan nivîsandiye. Weke mînak wî di derbarê hukumdar Ebdul Xelîl Cafer de 30, li ser Elî Leşkerî 20 methiye (pezn, qesîde) nivîsandiye. (Qetran Tebrîzî, Dîvan, Bakû, 1967)

Dîrokzanayê navdar Şerefhanê Bedlîsî di pirtûka xwe Şerefname de dinivîsîne ku di sala 1587’an de Şah Abbas-I, 24 eşîrên kurd şandiye Qarabaxê. Nîjadê van eşîran niha jî li Azerbaycanê dijîn. Em dikarin navê van eşîran destnîşan bikin: 1. Babalî, 2. Bayîndûrlû, 3. Bergûşad, 4. Bozlu, 5. Cavadlû, 6. Elîkyanlû, 7. Ferîkanlû, 8. Gelovçû, 9. Hacî Samlû, 10. Hesenanlû, 11. Kolanî, 12. Kulîkanlû, 13. Kullûxçû, 14. Qaçorlû, 15. Qulûxanlû, 16. Mîllî, 17. Pusyan, 18. Sisiyan, 19. Sultanlû, 20. Şadîmanlû, 21. Şeylanlû, 22. Tertarlû, 23. Tehmezlû, 24. Xanezeklû. (A. Elekberov, Trûdû Azerbaycanskogo fîlîala XXV, ”K. Voprosû İzûçenîi kulturu kudov. Bakû, 1936, r. 40-62)

Balyozê dewleta Rûsyayê Pyotr Lêrx ku demekê li Îranê dima, kurdzanekî bi nav û deng bû. Pyotr Lêrx baş hay ji kurdên Azerbaycanê heye û di pirtûka xwe de 13 eşîrên kurdan bi nav dîke: Bayîndûrlû, Kulikanlû, Bozlû, Cavadlû, Ferîxkanlû, Hacî Samlû, Hesenanlû, Qaçorlû, Mîllî, Sultanlû, Şemdînanlû, Tehmezlû û Xanezeklû (P. Lêrx, ”İslêdovaniya ob Îranksîx kurdov î sêvernîx xaldeyax”, St. Petersburg 1856, r. 88).

Zanyarekî Azerbaycanî di sala 1921’an de pirtûka xwe ku bi navê ”Azerbaycan ...” nivîsandiye. Navê vî zanyarî Memmedhesen Velîlî (Baharli) ye. Velîlî pirtûka xwe bi rûsî nivîsandibû. Di sala 1993’an de ev pitûk bi azerî çap bû. Velîlî di pirtûka xwe de behsa van gundên kurdan ên qedîm dîke:

Li qezaya Kûba Qar kurdu, Qaracallî; li qezaya Cavad Qaralar (çar gund) Qaracallîlar, Buyuk Gorus; li qezaya Şamaxî Kurd, Qaralî, Gorus, Çeperlî; li qezaya Goycax Cir Kurd, Kurd Şaban, Kurd Qarabaxlî, Kurdmasî, Kurd, Qaracallî, Qaraca, Gorusaxê û Gorusarekend; li qezaya Lenkeran Bergûşad, Kurdabbaslî, Kurdler, Buyuk Qaralî, Kuçuk Qaralî; li qezaya Axdêş Kurdler;

li Zengezûrê Qaralar, Qaracallî, Sîsîsan, Kurdhacî, Qazîkurdarlî, Kurdelî û Kurdqala; li Qazaxê Qaralar; li Cebraîlê Qaracallî, Kurdmahmûdlû, Kurd mahrîzlî, Kurdçapîq û Kurdefendîler; li Cavanşîrê Bergûşad, Kurdbaraqî, Qazî Kurdelî, Kurdler û Kurdbîzdeamanyan; li Gencê Sefîkurd; li Şûşayê Kurdqaradaxlî û Kurdler; li Şerûrê Derelegöz û Pasyan. (r. 57)

Di nivîsarên jorîn de kêmasî hene, ji ber ku Velîlî navê 24 eşîrên kurd ku

Şah Abbas-Işandiye Qarabaxê nenivîsandiye. Velîfî dinivîsîne ku li Azerbaycanê milletê kurd ji gelên din bêtir assîmîle bûne (r. 57).

Nivîskarekî din bi navê Şamîl Ezîz di meqaleyêke xwe de agahdarî dide ku kurdên Azerbaycanê li Qarabaxê li qezaya Zengezûrê, li der-dora çemên Bergûşad û Hekarî, li qezaya Cavanşîrê li der -dora çemên Tûtqû û Terterê bicîhbûne û ji xwe re kirine cîwar. Şamîl Ezîz navê nivîskar M. A. Skîbîtskî binav dike û peyama dide ku di sala 1893'an de li Qerebaxê 69 gundên kurd û 47 gundên fileyan (ermenî) hebûne. Di van gundên kurdan de 3 510 mal û 18 600 mirov dijyan. ( Rojnameya "Azerbaycan", 6.I. 1990, hejmar -I)

Îro li Komara Azerbaycanê li 22 nehiyan 36 gund hene ku di navên van gundan de gotinên "kurd" hene:

Navê nehîyeyê	Navê gundan
1. Axçabat	Kurdler
2. Axdam	Kurdler-1, Kurdler-2
3. Berde	Kurdboracî, Kurdler
4. Fuzûlî	Kurdler, Kurdmahmûdlû
5. Goranboy	Axamalîkoglu Kurd, Balakurd, Baxçakurd, Sefîkurd
6.Îmîşlî	Kurdmahmûdlû
7. Îsmayîllî	Kurdeldarbeylî, Kurdmaşî, Kurduvan
8. Kurdemîr	Bajarê Kurdemîr, Avanê Kurdemîr
9. Qûba	Kurdax
10. Qubadlî	Kurdmahmûdlû, Kurdçapîq
11. Laçîn	Kurdhacî
12. Lêrîk	Kurdeser
13. Goyçax	Çirkurd, Kurd, Kuremîş, Kurdşaban
14. Celîlabad	Kurdler
15. Masallî	Kurdebazlî
16. Oxuz	Kurd
17. Şerîl	Kurdçûllû, Kurdkent
18. Xankendî	Kurdler
19. Xanlar	Kurdelyar
20. Cebrayl	Kurdler

21. Zakutalî

Kurdemîr

22. Bajara Bakû

Avanê, Kurdexanî

Me li vir di derheqa kurdên Azerbaycanê de agahdariyeke kurt pêşkêş kir . Pêwîst e em pê bizanin ku di dîrokê de di nav gelê Azerbaycana Bakur û di nav kurdan de tu nerazîbûn û xerabî tu car çênebûne. Gelên me li vê derê mîna bira bi hev re jiyane derbas kirine. Li Azerbaycanê di dema Sovyetê de, gelek gelek mirov bi Asyaya Navîn ve hatine nefîkirin lê ji nehiyeyên kurdan tu nefî çê nebûne. Ev jî îsbata biratiya me ye.

Ez nabêjim ku li Azerbaycanê tu problemên kurdan tunebûne û tune. Weke mîna di dema Sovyetê de navên kurd hatine înkarkirin û dibistanên bi zimanê kurdî hatine qedexekirin; lê paşî rewş hinek baştir bûye. Wê çaxê li Azerbaycanê hinek zanyarên kurdzaniyê hebûne. Em dikarin ji wan navên Huseyn Kurdoxlu, Şemsî, Rehîm Qazî, Elî Kalavêj, Şamîl Eskerov, Zumrud Şefîyêva bînin ziman. Niha zanyarê eyan Kemal Mezher li ser xebata xwe ya zanyariyê li vir mijûl bûye. Îzeddîn Mistefa Resûl jî zanyariya xwe li Azerbaycanê dest pê kiriye.

## DÎROKA BAJARÊ LAÇÎN Û YÊN MAYÎN

Di derheqa bajarê Laçîn û qezaya Kurdistan (Kurdistana Sor) de gelek hatiye nivîsandin û niha jî tê nivîsîn. Lê ya rastî çî ye, ew nayê nivîsandin. Rastî çî ye, em deyndar in ku wê bizanibin.

Li Azerbaycanê, di derheqa Kurdistanê de gelek biryar hatine wergirtin. Ez dixwazim hinekan ji wan bi nav bikim ku em binasin:

7 temûz 1923. Ji bo sazûmankirina Wîlayeta Kurdistanê. Şeş roj şûnde biryareke din hat wergirtin ku Qezaya Kurdistanê bê damezrandin.

30 temûz 1923. Biryar: Bira gundê Pîrcahan bibe dêbajarê Qezaya Kurdistanê.

Temûz 1923. Biryar: 1. Bira Kurdistan bibe qeza, 2. Bira Kurdistan bibe nehiye; li vir tu biryar nayê wergirtin.

6 tîrmeh (tebax-?-Çira) 1923. Di derheqa Qezaya Kurdistanê de biryar: Ji serê çiyayê Mûrov heta çiyayên Alaqayê û Lîsagorsk û Camîn-Kuyum, ji virê heta Bagîrbeylî, ji aliyê Qezaya Cebraîlê ber bi jêr heta çemê Hekarî, heta gundê Efendîler, gundê Agavyurd, yê Onzîrak, çiyayê Delîdag, Devegozu... Dêbajar gundê Pîrcahan.

8 cotmeh 1923. Biryar: Ji bo demekê bira Şûşa bibe dêbajara Qezaya Kurdistanê heta ku dêbajerekî nû çê bibe.

Tîrmeh-îlon 1923. Li Komara Azerbaycanê 15 qeza tên saz kirin: Axdam,

Axdaş, Baki, Cebraîl, Qazax, Kûba, Kurdistan, Gence, Goyçax, Lenkeran, Nûxa, Salyan, Şamaxî, Şamxor û Zakatala.

Di 8.10. 1923'an de dêbajara (navenda) bajarê Qezaya Kurdistanê bû Laçîn. hetanî wî çaxî li Kurdistana Azerbaycanê bi navê Laçîn tu gund tunebû. Lê li navbenda Qezaya Kurdistanê bi navê Abdallar gundek hebû. Biryar tê dayîn ku ev gund bibe dêbajarê Kurdistanê. Lê tê gotin navê wê nexweş e. Li jora gund zinarekî mezin heye ku navê wî Laçîn e. Navê vî zinarî li gund datînin û Abdallar dibe Laçîn. Zû zûka Laçîn aban dikin, avahiyan çedikin û sazûmaniyek mezin ava dikin. Wê salê, yanî sala 1924'an gundê Laçîn dibe bajarê Laçîn û dibe dêbajarê Kurdistanê.

Di sala 1926'an de li bajarê Laçînê 438 mirov hebûn. Ji wan 339 kes mêr, 99 kes jî jin bûn. Wê demê li qezayê daîre (bi rûsî okrûk) hebûne. Di nava Qezaya Kurdistanê de hejmara daîreyan 9 bûne.

Di sala 1926'an de nifûsa komara Azerbaycanê tê hejmartin û di derheqa van hejmaran de li Tiflîsê pirtûkek tê çapkirin. Di vê pirtûkê de li ser kurdan bi kurta hî wiha tê nivîsîn: Li Qezaya Kurdistanê 479 gund û bajarek heye. Hejmara nifûsê bi giştî 51 426 in. Ji sedî 72,3 van kurd û ji sedî 26,7 tirk in. Wê çaxê li Kurdistanê hejmara kurdan 37 182 (19 160 mêr û 18 022 jin), ya tirkan jî 13 745 (7152 mêr û 6603 jin) in.

Me li jor got ku li ciyê Qezaya Kurdistanê çar nehiye sazûman bûn. Niha jî em di derheqa wan de agahdarî bidin:

**LAÇÎN:** (Navê Laçîn ji navê zinarekî hatiye hilanîn û ew jî navê teyrekî ye.)

Li ser axa Laçînê gelek bîrdarî (peyker), çalxane (turbe), mebûd (mizgeft, dêr), mescîd û yên mayîn hene. Em ji van dikarin li gundê Gulebîrdê çalxane ji sedsala 5'an, li gundê Cîcîmlî mebûdê Melek Ejder ji sedsala 6'an, li gundê Hoçazê mebûd û şikeft ji sedsala 5'an, li gundê Zêyve qeleya kafir ji sedsala 17'an û mebûda bapîrê Soltan ji sedsala 19'an, li gundê Qarîqışlaxê mescîd ji sala 1761'an, li hêla çemê Axoglan mebûd ji sedsala 19'an û pira çemê Hekarî jî ji sedsala 17'an binav bikin.

**KELBECER:** (Kavil, wêran; bajar, yanî "bajarê wêran)

Li Kelbecerê jî bîrdariyên kevn gelek in. Ji van tesvîra Tatan berî zayinê sê hezar sal kevn e. Her wiha nêzîkî gundê Qanlîkend keleya Lok ji sedsala 12'an, nêzî gundê Orta Qereçanlî keleya Qereçanlî (Ûlûxan) ji sedsala 11-12'an, nêzî hundê Pîrlar û Comerdê keleya Comerdê ji sedsala 11'an, nêzî gundê Qalaboynû keleya Qalaboynûyê ji sedsala 11'an, li gundê Şorbûlaqê

bîrdariya Xwedêdan ji sedsalên 4-5 û 12-13'an, li gundên Zar, Çeplî, Tekeqaya, Axcakend, Moz, Fetallar û nêzî gundên Nadîrxanlî, Molabayramlî, Baxlipeye û yê mayîn jî gelek bîrdariyên qedîmî hene.

Navê nehiye	Heta kengê gund bûye	Kengê navê avana bajêr sitendiye	Kengê navê bajêr sitendiye
Laçîn (Abdallar)	1923		10.8.1923
Kelbecer	1960	21.11.1960	1981
Zengilan (Heta sala 1957			
Pîrçivan)	1956	1957	1967
Qûbadlî	1961	1962	

Navê nehiye	Kengê bûye nehiye	Hejmara gundan	Hejmara avanên bajaran	Hejmara bajaran
Laçîn	8.8.1930	143		1
Kelbecer	8.8.1930	123	1	1
Zengilan	8.8.1930	93	1	1
Qûbadlî	14.3.1933	101	1	

Navê nehiye	Aqarê (erdê) wî (km <sup>2</sup> )	Ji Bakûyê dûrbûn (km)	Navê îstas. riya hesin û dûrbûn
Laçîn	1835	443	Xankendî, 49 km Axdam, 70 km
Kelbecer	1936	458	Yêblax, 165 km
Zengilan	707	377	Pîrçivan, 0 km
Qûbadlî	802	387	Akara, 35 km

ZENGILAN: Li der-dora axa nehiyeya Zengilanê jî bîrdariyên kevin hene.

QÛBADLÎ: (Qûbad navê mîrekî kurd e.)

Li geliyê Gavûr şikefet û mebûd ji sed sala 4'an, li gundê Mûradxanlî keleya Qalalî ji sed sala 5'an, li gundê Eliqûlûûşaxî keleya Hêşîn ji sed sala 5'an, li gundê Demîrcîler 2 mebûd ji sed sala 14'an û li deşta Yazî jî mebûda Cavaşîr û yê mayîn hene.

Li her çar nehiyeyan, li bajar û gundan dibistanên pêşayî, heştalî û dehsalî, dibistanên mûsikê, çend bîmarxane mentegeyên feldşêr-maman, pirtûkxane, klûb û malên çand, dergûşxane, dibistanên pêza (pêşe), zavodên asfalt û beton, ên rûn û penîr, dageriyên (îdareyên) daristanî, heywan jîrkirin, têxn'î ka, pîlan û aborî, meîşet, melhebûna gundîtîyê, doxtorî, av, avto û otobês, beytarî, fûtin, pirekêşî, xanî çêkirdarî, zayinxane, aborî û yê mayin hebûn. Cînarên me yî ermenî gişkan wêran kirine. Belê ev koncaleke giran û yeman e.

Tenê li ser axa nehiyeya 30 000 kaniyên cemidî, ji sedî zêdetir avên narzan (tirş) 17 avên germ hene. Avgerm li Kelbecerê kîrotekî eyan bû. Li çiyayên Kelbecer ji 4 hezar zêdetir tesvîrên teht (zinar) ji dîroka qedîm xeber dida. Me li ser van tehtan tesvîrên dînazor, bizin, gakuwî, govend, roj û hîv, tesvîrên nêçîrvantîyê û tiştên mayîn dîtîbû.

Me li jor got ku li Azerbaycanê 15 qeza hatibûn çêkirin. Di sala 1929'an de li Azerbaycanê çiqas qeza hebûn, gişka efal (lexû) kirin û di ciyê wan de nehiyeyan çêdikin. Li ciyên Qezaya Kurdistanê jî wî çaxî çar nehiyeyên jêrîn sazûman kirin: Laçîn, Qûbatlî, Kelbecer û Zengilan. Hinek gundên kurd jî li nehiyeya Cebraîl mane. Naxçivan mîna komareke muxtar, çiyayê Qerebaxê mîna wîlayeteke muxtar li ciyên xwe dimînin.

Belê di sala 1929'an de ne tenê Qezaya Kurdistanê, lê Azerbaycanê çiqas hebûn gişan lexû dikin. Paşê li bajarê Şûşa texnîkom (zanyariya navîn) vedikin û li wêderê dersdarên zimanê kurdî amade dikin. Lê sed heyf ku paşê li wê texnîkomê mamosteyên zimanê kurdî amade nekirin. Heta sala 1938'an li dibistanên pêşayî bi zimanê kurdî ders dane. Paşê dera zimanê kurdî ji ortê rabûye û di pasaportan de navê kurdî nehatiye nivîsîn. Divê em bizanin ku li paytexta Azerbaycanê Bakûyê dibistanên bi rûsî, ji yê azerî pîr zêdetir bûn.

Îro li Ermenistanê û li ciyên cihê di derheqa Qezaya Kurdistanê de dinivîsîn û dipirsin ka ev qeza çima ji nû ve nayê avakirin. Wêrin em li ser bersîva vê pirsê rawestin. Ji bo ku Qezaya Kurdistanê ji nû ve sazûman bikin, pêwîst e ku 15 qezayên Azerbaycanê ku ev 67 salan tune ne, ji nû ve gişan sazûman bikin. Her wiha pêwîst e ku li Azerbaycanê çî nehiye hene bêtin lexûkirin û li ciyên wan dîsa 15 qezeyên bereynî ji nû ve bîn teşkîlkin.

Ez pirs dikim: Kî karê wisa dike? Pêşneyariyên wisan bi çi teherî bi ser

dikevin? Kîjan welat razîbûna xwe ji tişteki wisan re dide?

Bapîrên me gotine: "Hûr bifikire, kûr bifikir û dûr bifikir!" Ramanên mîna van pêşneyaran vala ye. Ev yek

Ya dudû: Li Azerbaycanê çiqas nehiyeyên kurd hebûn, tev ji teref Ermenîstanê ve hatine zeftkirin. Ermenîstanê kurdan ji nav xwe qewitandiyê; kurdên Azerbaycanê ji ciyên xwe bar kirine û tu kurd li ciyê xwe nemaye. Ji lewre jî çî giliyên Kurdistana Sor, kîjan Qezaya Kurdistanê ye ez tê nagihim. Ev giliyekî vala ye û bi qillêr e.

Li welatên derve, li Kurdistanê şer, birakujî, di nava du birayan de -Mesûd Barzanî û Celal Talabanî neyartiyê sazûman dikin. Kîjan kurd mafê xwe dixwaze, wî gulebaran dikin. Niha jî cehd dikin ku li Azerbaycanê dijmintiya kurdan çêkin. Na; ev cehdeke bê meram e, bê feyde ye.

Ez dîsa dibêjim, li Azerbaycanê problemên kurdan hene. Kurdên Azerbaycanê ji zûva ji Kurdistanê qetiyane, lewma jî zimanê xwe wendakirine. Ji bo dersdayînê mamosteyên kurd tune ne. Em tev revok in. Aboriya me pîrr qels e. Cînarên me ermenî hê jî ji ciyên me derneketine. Me tevan mîna bira cînariya ermeniyar dikir. Yek kurdek tune bû ku li Ermenîstanê û li Çiyayê Qerebaxê kirîvekî wî tunebe. Lê cînarên me mixennetî (xayintî) kirin û warên me bi beyanî girtin.

Ûn dizanin ku serokê komara me Heyder Eliyev dixwaze ku navbera Azerbaycan û Ermenîstanê bi riya aştî hel bibe. Ew dibêje ku demekê di navbera Elmanyayê û Sovyetistanê de şerekî mezin bûbû; lê niha herdu dewlet dostanî dikin. Ermenîstan cînarê me ye. Riya rastî aştî û dostanî ye. Em li Ermenîstanê jî pêşneyareke wisan dikin.

Van salên dawî ji bo pêşdeçûyîna çanda kurdên Azerbaycanê bi alîkariya H. Eliyev gelek xebat hatiye kirin. Niha li komara Azerbaycanê navenga çanda kurdî heye. Em di radyoya dewleta Azerbaycanê de bi zimanê kurdî dengûbas, mûsîk û xeberan guhdarî dikin. Du romamên Ehmedê Heppo, ferhenga xeberdan û alfabeya Bayramê Fetê, pirtûkên helbestvanên Bariyê Bala, Qadirê Motî ronayî dîtiye. Pitûkeke Zumruta Şafî bi navê "Poyêmayên kurd" çap bûye. Di van rojan de em dê ferhenga mezin, "Ferhenga kurdî-azerî bibîn. Vê ferhengê Şamîlê Selîm û Mehmedê Heso amade kirine.

Par me bi Akademiyê û nivîskarên Azerbaycanî re 300 saliya "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî bi şahiyê mezin pîr oz kir. Em hersal cejna Newrozê li cîhekî mezin pîroz dikin.

Gelek pirtûkên me ku çap bûne xwe didin ber çavan. Wek mîna "Ferhenga azerî-kurdî", "Ferhenga kurdî-azerî", "Ferhenga başûvendê (qafiye, mişare) zimanê kurdî", bi zimanê azerî "Şêxê Senhanê" a Feqiyê Teyran, "Berhevoka helbestvanên kurd" û yên mayîn çap bûne. Lê sed mixabin ku ji bo çapkirina



van pirrtûkan pere û kompîterên me tune ne. Wê rojek bê ku her tişt biserkeve.

Bi destûra we ez dixwazim vê gotara xwe bi helbesteke xwe yî biçûk xelas bikim:

### ÇI YE ÇAR

Emane, qet mekşînin

ûn li bal min navê çar.

Çi ye çar?

Bo Kurdistan mar, eşmar!

Çi ye çar?

Bo Kurdistan gurek har!

Koncal, tajan û mecar!

Hezar sal in çar bûye

bona kurdên kolêdar!

Qerî-qerî kiriye

welatekî bi çar par,

li war ma ye kurd bêwar.

Çar çi ye?

Bo Kurdistan ax û zar!

Him bimarî, him bêtar, em nêçîrin, çar-rewkar!

Çi ye çar?

Kûreyek bi agir, ar!

Şewtandiye Kurdistan, bûye wêran, tar û mar!

Kurdno, rabin hûn pek-pek,

Xetên çepan bibirin,

Bila ev çar bibe yek!

Bila ev çar bibe yek!

---

### Şamilê Selîm Esger (Şamil Eskerov, Şamil Delîdax)

Zaniyariya berendamî û doxtoriyê Kinyaz Mîrzeyebli Azerbaycanê mumkun (mîyeser) bû. Di dema Yekîtiya Sovyetê de bi zimanê azerî di derheqa kurdan de gelek pirtûk û nivîsên mayîn li bajarê Bakûyê çap bûn. Ji wan;

1. Berhevoka nivîskarên kurd
2. Di derheqa Abdûlla Goran (Huseyn Kurdoglu)
3. Di derheqa Cegerxwîn (Şamil Esgerov)

4. Pirtûka Ebdurrehman Hejar, "Kurd naxmelerî (Kilamên kurdî)
5. Pirtûka Ehmedê Xanî "Mem û Zîn", (wergêr Esger Şamîlov)
6. Berhevoka nivîskarên Gurcîstanê, "Şîmal Kuleyî" (Bayê Bakurê)
7. Pirtûka Ereş Şemîlov "Kurd çobanî" (Şivanê kurd)
8. Pirtûka di derheqa "Şerefname"ya Şerefxanê Bedlîsî (Şemsî)
9. Elî Ebdurrehman "Etîram" (wergêr Şamîl Esgerov)
10. Di derheqa eleqeyên wêjeya azerî û kurdî (Azerbaycan-kurd edebî elaqelerî), du pirtûkên Kinyaz Mîrzoyev û yên mayîn.

# Çend gotin li ser semînera edebiyata zarokan

Mihemed Dehsiwar

Çend roj berê (29/01-05/06.1997) 23 nivîskar û wênekêş, ji welatên Bakur (Skandînavya) li xwendegeha Bîskops Arnöyê beşdarî semînereke dirêj û balkêş bûn. Li ser navê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê ez û Zinar Soran beşdarî semînerê bûn. Helbet dil dixwest ku nivîskar û wênekêşên ku bi taybetî li ser pirtûkên zarokan kar dikirin, beşdarî vê civînê bibin.

Civîn ji gelek hêlan ve balkêş bû. Li balkêşiya herî girîng ferqa di nav edebiyata pêşketî û pirhêl ji hêlekê ve, û ya paşdemayî û qels ji hêla din ve, ango ferqa di nav wan û me de bû. Bê şik sedemên vê gelek in û pêwîst e em kurd di vê hêlê de xebateke bêhempa li darxin.

Îro neteweyê kurd di warê kultur û edebiyatê de ketiye pêvajoyeke xweparastinê, pêvajoya li dîroka xwe xwedîderketinê û jinûve avakirina çand û edebiyata neteweyî. Gelek nivîskar û şairên kurd, lêkolînvan û berhevkarên kurd bi vê armancê xwe diêşînin û xebateke berbiçav derdixin holê. Bê şik ev karekî gelek bi rûmet e, lê êdî pêwîst e ev xebat rê li şaxên nû veke, berhemên nûjen derxe holê.

Edebiyata kurdî ya modern hîn pirr nû ye û di destpêkê de ye; berhemên di vî awayî de bi hejmar in. Her çi qas xebata li ser edebiyata nûjen di van çend salên dawî de xwe nîşan dabe jî, giraniya xebatê hîn jî li ser berhevkirinê ye. Bê şik çand û edebiyata îro ji ya duhî bi xetên qalind nayên qetandin; bi taybetî jî di rewşa kurdan a niha de ku bi salan e ji bo hebûna xwe û berdewamiya

jiyana xwe têdikoşe.

Ji ber ku babeta me semînera Bîskops Arnö ye, ez dê zêde li ser nakokî û astengiyên ku ji teref dijminê barbar û nîjadperest ve li pêşiya pêşkeftina çand, ziman û edebiyata kurdî û her wiha hebûna kurdan derketine holê nesekinim. Kurd jî û ger hebin dostên kurdan jî vê baş dizanin. Bi taybetî jî xebatkar û xîretkêşên vî barê giran, vê rewşê bas dinasin.

Pirsgirêke herî girîng jî kêmxwendina zimanê kurdî ye ku hîn jî mîna zarokan bi çaplûkan dimeşe. Tradîsyona xwendina kurdî pîrr qels e û ev yek dibe sebebê pêşkeftina çand û edebiyatê û nederketina berhemên nûjen ku dikare ji ber reqabetê tesîreke mezin li ser edebiyatê bike û jê re rûpelên nû veke. Ez bi van gotinan naxwazim tu şikan bînim ser dilpakî û xîretkêşiya nivîskarên kurd ku îro di rewşeke pîrr nazîk de xebatê didomînin.

Ez her wiha baş pê dizanim ku kurd niha di çî pêvajoyê de dijîn, nivîskarên kurd bi çî zorî û kefteleftan berhemên xwe diafirînin. Tevî vê jî ez pêwîst dibînim ku îro ji bo kurdan seferberiyêke çarhêl a xwendina kurdî dest pê bike. Ger xwendevanên kurdî zêde bibin û rexneyên birûmet û hêja bigihînin nivîskarên me, eşkere ye ku wê berhemên hêjatir û nûjentir derkevin holê.

Ji lewre jî ez ji tevahiya kovar, rojname, nivîskar û xwendevanên kurd hêvî dikim ku bala xwe bi taybetî bidin ser vê rewşê. Helbet nivîs û berhemên nivîskaran tenê bi xwendinê û rexnegirtinê digîjin armanca xwe û li nav gel bela dibe. Xebateke wiha pêwîst e û divê rojek berî rojekê dest pê bike.

### **Semînera Bîskops Arnöyê**

Civîna Bîskops Arnöyê jî eşkere kir ku berhem bê xwendevanan nagîjin armanca xwe. Xebata ku di çar rojan de li vir hat amadekirin, hem ji hêla naverokê ve û hem jî ji hêla berheman ve pîrr dewlemend û pêşketî bû. Her wiha ev xebata ku bi awayekî kollektîvî hat amadekirin, destnîşan kir ku nivîskarî û wênekêşî (illustrator) li welatên Bakur çiqas bi pêş ketiye û gihîştîye çî pêvajoyê. Di nava van sê-çar rojan de, ji dehan bêtir berhemên ku ji çapê re amade bûn, pêşkêşî beşdarên semînerê bûn.

Ev semîner an jî civîna xebata nivîskar û wênekêşan digel nivîskarek û wênekêşekî îslandî, ji hêla mudira Bîskops Arnö Birgitta Östlundê ve weke projeyekê hatibû amadekirin. Armanca ji vê civînê, nêzîkahî û xebateke hevbeş a nivîskar û wênekêşên ku li ser berhemên zarokan bû. Arnî Arnason û Halldor Baldursson ku ji Îslandê hatibûn, demek berê tevî çend kesên din beşdarî projeyê li Şîlfyê bûbûn, serokatîya civînê dikirin.

Ji bilî van Sigrun Eldjarn û Ragheitur Gestsdottir jî ji Îslandê, Fam Ekman, Marit Kaldhol, Harald Nordberg û Hans Sande ji Norveçê, Thorstein Thomsen, Ida Gantriis û Birde Poulsen ji Danîmarkayê, Solrun Michelsen û

Olivur vit Neyst ji Føroyar (giravên Färö), Laila Kohonen (fînî) û Dorrit Krook (swêdî) ji Fînlandê, Mare Hunt, Ivo Iliste Dalby û Tiia Toomet Tartu ji Estonyayê, Ole Korneliussen ji girava Grönlandê, Kerttu Vuolab, samî ji Fînlandê, Berît Marit Hætta samî ji Norveçê û Zinar Soran û Mihemed Dehswar ji Kurdistanê beşdarî civînê bûn.

Lê kurdên ku vê heftiyê hatibûn Bîskops Arnöyê ne em tenê bûn. Rojek piştî civîna me, civîneke bi vî awayî lê ji bo şair û helbestvanan jî hatibû amadekirin û mamosteyê hêja M. Emîn Bozaslan jî beşdarî vê civînê dibû. Em bi ditîna wî hê bêtir kêfxweş bûn.

Berî civînê wêneya pisîkekê ku ji teref Torstein Thomsen ve hatibû çêkirin ji beşdarên civînê re hatibû şandin û pîrraniya beşdaran li ser vê babetê çî wêne çî jî çîrok amade kiribûn û hê hatibûn. Ez û kek Zinar ji ber ku me dereng bersîv dabû amadekarên civînê, di vî awayî de ne amade bûn û bê hazîrî beşdarî civînê bûn. Ji xwe wêne bi xwe jî neketibû destên me.

Herkesî bi wêneyek an jî bi çîrokeke li ser vê pisîkê fikir û rayên xwe diyar kir. Curbecur wêne, rengîn an jî reş û sipî derketin holê. Çend texlît çîrokên li ser pisîkan hatin pêşkêşkirin. Piştî beşdaran dîtînen xwe li ser wêne û çîrokên xwe gotin, em derbasî nîqaşkirina li ser wan bûn.

Di pey xwarina nîvro de Arni û Halldor li ser çîrokeke xwe agahdarî dan civînê. Arnî di rojnameyekê de resmê masiyekî kirêt dîtibû û wê ji xwe re kiribû babeta çîrokekê. Halldorê hevalê wî jî ji bo çîrokê wêneyan amade kiribû. Navê çîrokê jî danîbûn "The ugliest fish in the world" (masiyê di dinyayê de herî kirêt).

Roja din em li ser afirandina wêne û çîrokan rawestiyên. Naveroka vê civînê çîrok bû. Pirsên li ser vê babetê jî ev bûn: Çîrok çî bû? Karakterê wê çî ye? Pêwîstiyên zarokan çî ne? Herkesî di nav pênc deqîqeyan de çend rêzan nivîsand û di vî awayî de dîtînen xwe pêşkêş kir. Piştî re em derbasî xebata "Groupwork"ê bûn.

"Groupwork" an jî xebata hevbeş a bi vî awayî, ji me herdu kurdan re hinek xerîb û zor bû. Lê me hewl da ku ji wan kêmtir nemînin. Sihuda me hebû ku em kurd û du heb wênekêşên samî ketin grûbekê û herdu jî tenê bi wêneyan re mijûl dibûn. Di wir de nivîskariya me bi kêr hat. Heger ne wisa bûya, em dê bê xebat û bê berhem bimana.

Li ser daxwazên beşdaran me pênc grûban saz kir; di nav van de grûba penaberan û eqalîyetan jî hebû û em kurd, swediyekî Fînlandê û samî ketin vê grûbê. Eqalîyetên din (Grönlandî, Føroyî û swediyên Fînlandê) ne ketin grûba me.

Wê rojê her grûb xebata xwe seet ji 15.30 ta 17.00-yan pêşkêş kir. Tişteki herî balkêş jî ew bû ku du grûb çîroka xwe amadeyî çapê jî kiribûn. Tenê

mîzampajeke baş jê re diviya. Yên din jî xebateke baş kiribûn û çîrokên hêja amade kiribûn. Nîqaş û sohbet a li ser van çîrokan heta dema şîvê domand.

Roja din ev car her grûb wezîfeyeke din wergirt û xebat her hat berdewamkirin. Me biryar da ku em çîroka xwe bidomînin û wê weke pirtûkekê, tevî wêne û nivîsê pêşkêşî civînê bikin. Herdu hevalên me yê samî wêneyên xwe, yekê bi şeklan yekê jî bi pêûsê amade kirin û em jî li ser nivîsê kûr bûn. Di dawî de, çîroka me ku li ser penaberekî (hey grûba me ya penaberan bû, me jî problemên ku di serê zarokê kurd de derbas bûbûn, kir babeta çîroka xwe) bû hazirî pêşkêşiyê bû. Me jî naveroka çîroka xwe weke grûbên din, tevî wêne û nivîsa xwe pêşkêşî civînê kir.

Çend seet piştî xwarina êvarê me berê xwe da salona "Gotî" ku mûsîka keltî guhdarî bikin. Konsera hunermendekî swêdî ku li Îrlanda û Skotlandê li ser mûsîka keltiyên lêkolîn kiribû, bi sê-çar instrumentên cuda yê keltiyên, nêzî seetekê em mest kirin. Piştî konserê em derbasî avahiya mezin bûn ku şevbihêrka xwe bidomînin. Çend nivîskar û şair, bi nivîs û helbestên xwe şevbihêrê hê bêtir dewlemend kirin. Me jî li ser daxwaza civatê, Feqiyê Teyran bi beşdaran da nasîn û helbestekê pêşkêşî wan kir.

Civîna me roja din berî firavînê tewa bû.

Di vê civînê de me bi wênekêş û nivîskarên welatên Bakur re pêwendiyên baş û giranbuha danî. Gelekan ji wan, çî hêla wêneyan be û çî jî ji hêla nivîsan be soz dan ku alîkariya me bikin. Kek Zinar ku di karê Kulîlkê de hertim kêmasiya wêneyan dikşîne, gav bi gav li pey wênekêşan bû daku çend wêneyan bi dest bixe. Gelekan soz dan ku bi postê wêne û nivîsan ji me re rêkin.

Artî ku ji Îslandê bû, çaxê rewşa me guhdarî kir, dilê wî gelek bi me êşiya. Li gorî agahdariyên wî, edebiyata îslandê jî 50 sal berê di vê rewşê de bû. Piştî ku rizgariya xwe bi dest xistibûn, ji bo jinûve avakirina dezgehên neteweyî bi dil û can xebatê kiribûn. Welatekî ku hejmara gelê wê îro bi tenê nêzî 300.000-an e, di hêla çand û edebiyatê de bi welatên mezin re ketiye reqabetê.

Tiştêkî herî girîng ku di vê civînê de bala min kişand, pêşketin û moder niya wan wênekêşên ku karê xwe bi hunermendiyê xemilandibûn û xebata wan î hevbeş a bi nivîskaran re bû. Her wiha xebata wan a bi dîsîplin û bi rêkûpêk jî balkêş bû. Ya rastî karê xwe bi profesyonelî dikirin. Dil dixwaze ku civaka kurd jî bi vî awayî bi pêş keve û rojek berî rojekê bigîje vê pêvajoya ku welatên Ewrûpayî tê de dijîn.

# Çend helbest ji Alîşêr Efendî

Berhevkar:  
Doxan Yildirim

**A**lîşêr, wek ku tê zanîn, di nav berxwedana Qoçgirî û Dersimê de şexsiyeteke mezin bû. Wî li dijî zor destiya Tirkan di her cepheyî de şer kiriye. Alîşêr hem dîplomat û hem jî komutanekî zîrek bû. Di gel van xusûsiyetan mirovekî şahîr û tembûrvan jî bû. Hin helbestên wî bûne stran. Belê mixabin gelek helbestên wî ên nivîskî îro winda ne. Kitêbxana wî ji aliyê Tirkan de tê talankirin. ( Li gora ku M. Bayrak ji min re got: Nazmi Sevgin di kitêba xwe de qala destdayina ser sindoqek kitêbên Alîşêr dike.)

Dijmin dixwest ku bi yêk carê re rêyan ji ortê rake ku her tişt bê ji bîrkirin. Piştî kuştina Alîşêr û Zarîfê neviyê Qasim Çavuşê birayê Alîşêr Zeynel ku di wê demê de 13 salî bû ji aliyê Rehber û merovên wî tîn kuştin. Xwenga Zeynel ya ku di wê wextê de di pêçekê de bû birîndar dibe. Bavê van zarokan Yusuf li Dersimê di şerê aşîratiyê de tê kuştin.

Çendek berê bi firseta çûyina welêt, min da dû şihîrên Alîşêr. Çend hebên ku min bi destxist derbasî nivîsê kir ku peşkeşi xwandevanan bikim. Sernivîsên helbestan ji aliyê min ve hatine danîn.

Alîşêr helbestên xwe bi Kurmancî û Tirkî nivîsandine. Heta niha min nebihîstiyê ku helbestên wî bi zarê Dimilikî hene. Naveroka helbestan li ser mesela Kurd û eşqa Hz. Alî (Qizilbaşî), tekoşîna li dijî devletên Tirk û Moxolan e. Dema ku çekdarên Qoçgirî bi awayê leşkerî xwe perwerde dikin, perwerdekirin û patev bi Kurmancî ye.

CEBXANA ME TUNE

Lo lo eman e!

Çiyayê gazan girtiye berf û dûman e  
Cebxana me tune, halê me yemane

Subedan li kewkebê, derketine serê Mezgelê  
Me qurşûn avêtin hevdu, seba vê din ê meshebê

*Min ev helbest ji teref gundiyên Alişêr Cemal, A. Haydar, Xalojina Riqê  
bihîst. Helbest dirêj e, belê mixabin ewqasî dizanîbûn.*

## HASRET

Bu dünya fanidir fani  
Dedem seyit Kasım Xanî\*  
Kış almış Munzur dağını  
Uçan kuşlar xeber hanî

Hasretin beni yakıyor  
Boynuma zencir takıyor  
Pirim kaldı Erzincan da  
Talipler yola bakıyor

Seyit Kasım miri kelim  
Giden yoktur yazam selam  
Pirim kaldı Dersim elinde  
Kimse yoktur haber alam

*\*Navê Seyit Kasım di kitêba "ERZİNCAN Tarihi, Coğrafi, Toplumsal,  
Etnoğrafi, İdari, İhsal inceleme araştırma tecrübesi" ya Ali Kemal de s.119  
derbas dibe.*

## HAYDAR BEG

Tarih bin üçyüz otuz yedi  
Haydar Begden geldi haber

.....\*

Haydar Beg ata binmiş  
Yiğitleri hep seçmiştir  
Erzincan Kürtleri derler  
Köprüler hep atılmıştır

Haydar Beg beylerin beyi



Cihanda bulunmaz dengi  
Duwanlıkta tabur bozdu  
Aslan gibi etti ceng

*\*Mehmet Karakuş ê Kevenlî vê helbesta Alîşêr dixwîne. Di helbestê de du rêz kêm hene.*

*Min, ev her çar helbestên jêrîn ên Alîşêr ji devê Belguzarê Kevenlî bihîst. Belguzar aniha 64- 65 salîy e. Kalikê wî Mistefa demekê dirêj li cem Alîşêr li Dersimê dimîne. Piştî demekê li gundê xwe vedigere û dersê dide zarokan.*

## EY CANAN

Ey canan bi eşqa te jî hatim  
Demê te yad mekim, çi bikim?  
Ji hisna te re ez jî matim  
Lê ez feryat mekim, çi bikim?

Zihîn li eşqa te heye  
Zaten li meşqa te jî heye  
Li ruyê min şevqa te heye  
Ez dil abad mekim, çi bikim?

Ez jî maîlim cemal tu yî  
Di fikra min da xeyal tu yî  
Ser dikim qîl û qal tu yî  
Ez jî qisan îcat mekim çi bikim?

Seba te giştî aşiqan  
Mal û milk kirin wêran  
Seba te jî şahê rindan  
Ez jî berbat mekim çi bikim?

Ez jî Mecnûn tu jî Heva  
Li sevdayê te ye Leyla  
Seba şêrîn koy û qeya  
wek ku Ferhat mekim çi bikim?

Ey canan tu jî serê yaran  
Çima tu pirs nakî caran

Tu jî şad dike exyaran  
Li te bêzar mevim çi bikim?

Teqî bere yarê te ye  
Dijminê exyarê te ye  
Maîlê dîdara te ye  
Ez jî bi te xeşat mekim çi bikim?

## MIN GOT

Alema ervahê cema elestê  
Exyar la îllah got min îllelah got  
Li asanê taqvîm li hêla rastê  
Cemalê te ra min bîsmîllah got

Bîsmîllah min lê hanê alemî ceberut  
Ervahê lê hanê mülkü merecut  
Li alemî şahadet el sirrî lehut  
Nura Ahmet ra min resullulah got

Resullulah yare şefaata kanî  
Ububet velayet kê ku nezanî  
Caran jî nabînê feyz-i rehmanî  
Bi eşqa Elî min velîlulah got

Welîlulah ne got misliman nîne  
Li mûheyîbê dewdu îmaman nîne  
Münkir münafike jî quran nîne  
Şikir bi Xwedê min eyvallah got

Eyvallah min yare vahadeta te ye  
Gîştî mevcutat heyeta te ye  
Di ber şera hîzmet taeta te ye  
Nemi niyaz vaye min huvallah got

Huvallah dibêm yareb te çitan tarîf kim  
Kullî îçtîhadan gîştî tarîf kim  
Bi elhemdûllîlah hatmi şerîf kim  
Ruyê min tu yî, min amentûbillah got

Amentûbillah Takî min mazlûm meke  
Li heyeta ebed min mahdûm meke  
Li meqema ewliyan min mahrûm meke  
Bi heqqê Muhamed Alî te ra Allah got

## RAHM EYLE

Rahm eyle bize putların şahı  
Benim çektiğimi erd-ı semah çekemez  
Zalimin zulmi, mazlumun ahı  
Azim olan aşık ala çekemez

Yari mahçub edip exyari memnun  
şanına düşermiydi çeşmi purhun  
Adalet nizamı eyledin mahzun  
Sabreden eyyub-y ala çekemez

Kalınadı meydanda ad edenin merdi  
Exyardır çektiğim ah ile sevdi  
Bir yanda bize dost olanın derdi  
Hem bu hali halk-ı alem çekemez

Seni seven daim düşmüş esarete  
Kurtar bizi dedik gel inayete  
Gittikçe düşürdün xemi minnete  
Hem bu hali Hüseyini Kerbela çekemez

İnayet eyle şahım geldi zamanı  
Xoş merhem bağla bu derdi mihanı  
Lutf eyle mahf et şu kavmi mervanı  
Hem bu hali Taki yi şeheda çekemez

## ELHEMDÜLLİLAH

Cemalım murad cihan numadır  
Bare kella gördüm elhemdüllilah  
Cemalın hikmet syrrı xudadır  
Zerresine erdim elhemdüllilah

Efkarım efkarım Allah-ı ekber  
Ya nurı Muhammed dilimden ezber  
Mürşidim muilim sultanım Haydar  
Yani ser verdim elhemdüllilah

Set selatıl sela mihri mahım var  
Ömrümün mülkinde on iki şahım var  
Hazreti Cafere giden rağım var  
ikiliği sildim elhemdüllilah

Ol emir el müminin darıl amandır  
On dört yıldızım var şöhreyi candır  
Cümlesi bülbüli darıl cinandır  
Güllerini derdim elhemdüllilah

Serhab-ı aşkınla şaha beyhuşem  
Methi muhabetle mesdi meyxuşem  
Ben Taki halka bir guşem  
Payine yüz sürdüm elhemdüllilah

# Derheqê kirmanckî (kirdkî) de kombiyayîşê Stockholmi

28-31ê adare 1997

**R**oja 28ê aşma (menga) adare de, Stockholm de, kirmanckî (kirdkî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayîşê diyine dest pêkerd û çar rojî (28-31ê adare) ramit. Nê kombiyayîşê diyine de nê heştês kesî amade bîy:

Osman Aytar (*Sêwregi*)  
Yildiray Beyazgül (*Gimgim*)  
Çeko (*Gimgim*)  
Mûnzûr Çem (*Dêrsim*)  
Hûmanê Çıyan (*Depe*)  
Haydar Diljen (*Sêwregi*)  
Nîhat Elî (*Sêwregi*)  
J. Espar (*Pîran*)  
Cemîl Gündoğan (*Dêrsim*)  
Lerzan Jandîl (*Gimgim*)  
Huseyîn Kulu (*Dêrsim*)  
Seyîdxan Kurij (*Çewlîg*)  
M. Malmîsanij (*Pîran*)  
Selîm Mûrat (*Pali*)  
Robîn Rewşen (*Licê*)  
Kamer Söylemez (*Dêrsim*)  
Harun Turgut (*Pali*)  
Şukrî Urgun (*Hêni*)

Nê kombiyayîşî de amadebiyayoxî nê meselanê cêrînan ser o vindertî, munaqeşe kerd û meylê xo tesbît kerdî:

### I-Name

- 1)Nameyê lehçeya ma
- 2)Nameyê hetan (cîhetan)
- 3)Nameyê mengan (aşman)
- 4)Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

### II-Zemîr

Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)

### III-Sifet

Rengî

### IV-Hûmarî

Şima nê nuştî de netîceyanê nê munaqeşeyan û meylan wananê. Netîceyê ke ze meyl tesbît biyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan îfade kenê. Nê, ze tewsiye û teklîfî yê.

Tanî çeku (kelîme) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mintaqayan de ciya yê.

## I-NAME

### 1)Nameyê lehçeya ma

Kurdê ke bi lehçeya ma qisey kenê ca ra ca xo ra vanê "kirmanc", "kird", "zaza" yan zî "dimili"/"dimlî"; lehçeya xo ra vanê "kirmanckî", "kirdkî", "zazakî" yan zî "dimilkî"/"dimilî"/"dimlî".

Meylê kombiyayîşî nê çekuyan (kelîmeyan) ra "kirmanc" û "kirmanckî" ser o yo.

### 2)Nameyê hetan (cîhetan)

#### kirmanckî (kirdkî)

rojawan

rojhelat

vakur

başûr

vakurê rojhelatî

vakurê rojawanî

başûrê rojhelatî

#### tirkî

batı

doğu

kuzey

güney

kuzeydoğu

kuzeybatı

güneydoğu

## 3) Nameyê mengan (aşman)

Kirmanckî (kirdkî) de him çekuya "mengi" him zî "aşme"/"aşmi"/"aşm" vajiyêna. Tani cayan de "mengi" yena mena "mois" a ziwane frenskî (30 roj), "aşme" yena mena "lune" a frenskî (bi tirkî "gökteki ay"). Tanî cayan de zî çekuya "mengi" nêvajiyêna, "aşme" him mena "mois" him zî "lune" a ziwane frenskî dana.

kirmanckî (kirdkî)

1. çele

2. sibate, gucige

3. adare

4. nîsane

5. gulane

6. hezîrane

7. temmuze

8. tebaxe

9. êlule

10. oktobre

11. teşrîne

12. kanûne

tirkî

1. ocak

2. şubat

3. mart

4. nisan

5. mayıs

6. haziran

7. temmuz

8. ağustos

9. eylül

10. ekim

11. kasım

12. aralık

Nê nameyan ra "çele" nerî (masculin) yo, nameyê bînî makî (féminin) yê. Nameyê mengan bi herfa hurdî (wurdî) dest pêkenê.

## 4) Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

Goreyê îdareyê dewletan tanî nameyê cayan nê yê:

kirmanckî (kirdkî) °

dewe

nahiye

qeza

şaristan, bajar

tirkî

köy

nahiye

ilçe, kaza

il, vilayet; şehir, kent

Meylê kombiyayîşî nê panc çekuyanê corînan ser o yo, labelê formê bînî

zî estê. Nimûne:

meylê kombiyayîşî

dewe  
şaristan

formê bînî

dewi, dew  
şahr estan, şehir, şehîr

sûke: Tanî cayan de çekuya "sûke"/"suki"/"sûk" menayanê "şehir, kent, il merkezi", "ilçe merkezi" yan zî "çarşı"yê tirkî de vajiyêna. Ma vajî Diyarbakir, Erzingan û Sêwregi ra "sûke" yan zî "suki" vajiyêno. Ziwane erebkî de "sûq" mena "çarşu"y de ya û tanî nuştoxî vanê ke eslê na çekuye ziwane berberkî ra ameyo.

### Şaristan û qezayê Kurdistanî

Ma nê kombiyayîşî de nameyanê tanî şaristanan û qezayan ser o vindertî. Tiya de ma derheqê nê nameyan de meylê kombiyayîşî nusenê. Ma wext nêdî ke nameyanê şaristanan û qezayanê bînan ê Kurdistanî ser o vinderê.

nameyo kirmanckî

1)Bidlîs

1. Elcewaz
2. Hîzan
3. Motkî
4. Tûx
5. Xelat

2)Çewlîg

1. Azarpêrt
2. Bongilan
3. Çêrme
4. Dara Hênî
5. Gêxî
6. Kanîreş
7. Xorxol

3)Dêrsim, Mamekiye

nameyo ke dewlete panawo

1)Bitlis

1. Adilcevaz
2. Hizan
3. Mutki
4. Tatvan
5. Ahlat

2)Bingöl

1. Adaklı
2. Solhan
3. Yedisu
4. Genç
5. Kiği
6. Karlhova
7. Yayladere

3)Tunceli



1. Çemişgezek
2. Mazgêrd
3. Pêrtage
4. Pilemuriye
5. Pulur
6. Qisle
7. Xozat

1. Çemişgezek
2. Mazgirt
3. Pertek
4. Pülümür
5. Ovacık
6. Nazimiye
7. Hozat

Dêrsim eslê xo de nameyê yew mintiqa yo. Nameyê şaristanî bi xo Mamekiye ya, ci ra Kalan zî vajiyêno.

#### 4)Diyarbakir

1. Bismil
2. Çêrmûg
3. Çınar
4. Erxenî
5. Gêl
6. Hezro
7. Hêni
8. Karaz
9. Licê
10. Pasûr
11. Pîran
12. Silîvan
13. Şankuş

#### 4)Diyarbakır

1. Bismil
2. Çermik
3. Çınar
4. Ergani
5. Eğil
6. Hazro
7. Hani
8. Kocaköy
9. Lice
10. Kulp
11. Dicle
12. Silvan
13. Çüngüş

#### 5)Erzingan

1. Ciminî
2. Îlîç
3. Kemaliye
4. Kemax
5. Mose
6. Refahiye
7. Têrcan

#### 5)Erzincan

1. Üzümlü
2. Iliç
3. Kemaliye
4. Kemah
5. Çayırılı
6. Refahiye
7. Tercan

6)Erzirom

1. Aşqeale
2. Çat
3. Gogsî
4. Hesênqeale
5. Îspîr
6. Narman
7. Oltî
8. Olur
9. Ortîlî
10. Tatos
11. Xinûs, Kela
12. Xoresan

7)Mûş

1. Gimgim
2. Kop
3. Milazgir

8)Riha

1. Bêrecûg
2. Curnê Reş
3. Hewenc
4. Serê Kaniyê
5. Sêwregi
6. Sirûc
7. Wêranşar
8. Xelfetî

9)Semsûr

1. Aldûş
2. Bêsnî
3. Çêlikan

6)Erzurum

1. Aşkale
2. Çat
3. Karayazı
4. Pasinler
5. İspir
6. Narman
7. Oltu
8. Olur
9. Şenkaya
10. Tekman
11. Hınıs
12. Horasan

7)Muş

1. Varto
2. Bulanık
3. Malazgirt

8)Urfa

1. Birecik
2. Hilvan
3. Bozova
4. Ceylanpınar
5. Siverek
6. Suruç
7. Viranşehir
8. Halfeti

9)Adıyaman

1. Gerger
2. Besni
3. Çelikhan

4. Kolik
5. Semsat
6. Serê Golan

4. Kahta
5. Samsat
6. Gölbaşı

#### 10)Sêrt

1. Berwarî
2. Dih
3. Hewêl
4. Misriç
5. Şêrvan

#### 10)Siirt

1. Pervari
2. Eruh
3. Baykan
4. Kurtalan
5. Şirvan

#### 11)Xarpêt

1. Axin
2. Baskîl
3. Depe
4. Keban
5. Meden
6. Miyaran
7. Pali
8. Qowanciyar
9. Sivrice
10. Xulaman

#### 11)Elazığ

1. Ağın
2. Baskil
3. Karakoçan
4. Keban
5. Maden
6. Arıcak
7. Palu
8. Kovancılar
9. Sivrice
10. Alacakaya

## II-ZEMÎR

### Zemîrê kesî (zemîrê şexsî)

Kirmanckî de di grûbî zemîrê kesî estê. Ma tiya de goreyê meylê kombiyayîşê nê di grûban nusenê:

### Grûba yewine

1. ez
2. ti
3. o
3. a

1. ma

2. şima
3. ê

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

meylê kombiyayîşî

2. ti
3. o
3. a

formê bînî

2. to, tû
3. ew, aw, we, wi, ay, yo, yû, wo
3. ya

2. şima
3. ê

2. sima
3. yê, yî

Grûba diyine

1. mi
2. to
3. ey
3. aye

1. ma
2. şima
3. înan

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

meylê kombiyayîşî

1. mi
2. to
3. ey
3. aye

formê bînî

1. min
2. tu
3. yi, yê, hî, jey, ê, êy, êyî, ay
3. yê, ya, yay, aya, ay, a, ja

1. ma
2. şima
3. înan

1. man
2. şiman, sima
3. yîn, yînî, yîne, jînî, îna, îne, îne, înu, aynan, eyna, ayno

Yew zemîro kesî zî "xo" yo. Frenskî de nê zemîrî ra "pronom personnel réfléchi" vajiyêno. Meylê kombiyayîşî formê "xo" yo, labelê tanî cayan de herûnda "xo"y de nê formî zî vajiyênê: xwe, xwi, xu, ho, hu.

### III-SÍFET

#### Rengî

<u>Kirmanckî (kirdkî)</u>	<u>tirkî</u>
sipî, sîs	beyaz, ak
sûr	kırmızı
siya, qer	siyah, kara
şalên, qeweyî	kahverengi
kewe	mavi
hewz, kesk, zergûn	yeşil
zerd, çeqer	sarı

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê. Nimûne:

<u>meylê kombiyayîşî</u>	<u>formê bînî</u>
sipî	sipe, sipê, sipye
sûr	sur
siya	şiya, şa
qeweyî	rengê qehwî, rengê qawî
kewe	kewo, kiho, kuhe, kûhe
hewz	sewz
zerd	zer, zerk

Mena tanî rengan ca ra ca ciya ya. Nimûne:

kewe (kewo, kiho, kuhe, kûhe): Tanî cayan de yeno mena "yeşil"ê tirkî.

zergûn: Tanî cayan de yeno mena "hewzê zerdinî" yan zî "zerdbiyaye"yî (bi tirkî "sarartı").

zerd: Tanî cayan de yeno mena "altın sarısı"yê tirkî.

## IV-HÛMARÎ

Meylê kombiyayîşî nê hûmaran ser o yo:

11	yewendes
12	diwês/duyes
13	hîrês
14	çarês
15	pancês
16	şiyês
17	hewtês
18	heştês
19	newês
20	vîst
30	hîris
40	çewres
50	pancas
60	şeştû
70	hewtay
80	heştay
90	neway
100	se
200	di sey
300	hîrê sey
400	çar sey
500	panc sey
600	şeş sey
700	hewt sey
800	heşt sey
900	new sey
1000	hezar
1000 000	mîlyon
1000 000 000	mîlyar

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê zewbîna (sewbîna) formî zî estê:

meylê kombiyayîşî

formê binî

11 yewendes

des û jû, des û jew, yondes

12 diwêş/duyes

des û didi

13 hîrêş

des û hîrê

14 çarêş

des û çar, des û çihar

15 pancêş

des û panc, poncêş, pûncêş

16 şiyêş

des û şeş

17 hewtêş

des û hewt, hotêş

18 heştêş

des û heşt, heyştêş

19 newêş

des û new

30 hîris

hîriş

40 çewres

çewreş, çores, çoras

50 pancas

poncas, pûncas

60 şeştî

şeşt, şest, şeştî, şeşt, şeştî

70 hewtay

hotay, hawtay, hotayê

80 heştay

hêştay, hêştayê, heyştay

90 neway

newayê, noway

500 panc sey

pan sey, ponc sey, pon sey, pûn sey

700 hewt sey

hot sey

800 heşt sey

heyşt sey, hêşt sey

900 new sey

no sey

1000 hezar

henzar, hinzar, honzar, hûnzar, hazar

1000 000 mîlyon

mîlun

1000 000 000 mîlyar

mîlar

Nimûne:

1925 hezar û new sey û vîst û panc

1938 hezar û new sey û hîris û heşt

1997 hezar û new sey û neway û hewt

1567849 yew mîlyon û panc sey û şeştî û hewt hezarî û heşt sey û çewres û new

# "Yado yew dêr a vaciyena welat mi di"

Sêyidxan Kurij

Tertelê 1925 di Serleşkêr Cephê Palu- Xarpêtî Yado bi (Yadîn Mehmud Ebas), la çi heyfî go hetûn roja êri Yado seri zaf kem çî amo nuştîş. Mi çend sêr cuwa ver Yadoy seri yêw nuşte nuşt û ini nuştê mi "Ar manc" û "Medya Güneşi" di vécîya. Veterîner Dr. Nûrî Dêrsimî pîrtûka xwi ya "Kürdistan Tarihinde Dersim" di behsê Yadoy kenû. Nûrî Dêrsimî vûnû; mi Yado Sûrîye di dî. Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) pîrtûka xwi ya "Doza Kurdîstan" di ca dawû yew fotografê Yadoy. Kamuran Bedirxan romana xwi ya "Qertalê Kurdistan" di heyat Yado ser o nuştî. Kemal Burkay zi Yadoy seri yew şîer nuştî. Yado him serrê tertelê Şêx Seîdî di him cuwa pê zaf cumêrdîya pîl kerda. Tepîştîş Şêx Seîd û umbazun yi ya pê zî Yado pa umbazûn xwi ya verba devleta Tirkû qoxe rûmna. Wi çend ray şû Sûrîye (Bin Xêt), la huncî zî gêrawu a amo Kurdistan herb pêşmer getîyê rûmna wû. Cînî Yadoy Tellî dewê mi Kur ra wa û Yado pa umbazûn xwi ya mintiqay ma di zaf mendibi. Ini semed ra waxti go ma qiji bî pîlûnî ma tîm û tim ma rî meselê Yadoy vatîyeni. Ma çimi di ina dinya di Hezretî Elî ya pê Yado amêni. Zaf merdimi go miyûn tertelê Şêx Seîdî di ca guretibi û cuwa pê pi myun qeflê Yado di mên dibî, qîjkekê ma di, cematî di serameyê xwi vatîyeni. Umbazûn Yadoy ê veryenûn ra yew Meh Evdî bi. Meh Evd hetûn pêni Yado ya bi, cuwa pê pîya şîbî Sûrîye, Sûrîye ra Meh Evd gêrabî a amebî kîye. Meh Evd hetûnî gi merd zî dewê Cebaxçor Hepsorî di bi. Mi bi xwi Meh Evd nidî, la ê merdimûnî go Meh Evdî di qisê kerdibi mi yini di qisê kerd. Guerê vatê Meh Evd, raya pêyini di Yado şinû mezray dewê Kur Qeldar, kê pî Tellî. Yado îta ra Tellî zî genû hêt Dara



Hênî ya şinî, pê Dara Hêni di mufreze erzenû yini ser. Yado û umbaz xwi mufrezê eskêri di herb kêni. Îta di Tellî bena birîndar, xêliyek yew rîye yi Tellî xwi ya bêni. Cuwa pê vînênî ki, darbê Tellî girûn a, Tellî hin nieşkena yin a şuerû û xêlisayiş ya yi zi mumkun nîyû. Yado dezay Tellî Meh Evd ra vûnû: Meho şue Tellî bikişi wa dêst duşmên mekurû, esker tîrkûn byebext û gur o pîs Tellî kenû.

Meh gêrenû a şinû tifing nûnû Tellî ya, Tellî kişenû. Mezêl Tellî hun û nizdî dewê Oliyûn d' o. Owca ra pê, yew qisim merdimûn vûnû, Meh Evd vatû ez bîya birîndar, mi Yado kerd vîn, mi hîn wi nidî. Yew qisim merdîmûni zi vûnû, Meh Evd vatû ez û Yado ma pîya lingûn şî Sûrîye, ma Sûrîye di yew mudet mênî; ef vécîya, ez amêya welat, Yado Sûrîye di mend.

Mi seri ga viyert (1996) di Çewlîgi di xwertê Yadoy Dilşa Xanimi di qisê kerd Dilşa Xanim mi rî qalê Yadoy û daykê xwi kerdi. Ez wazena inî pîya qisê kerdiş wendoxûn Çira ri binusî.

- *Ma wazênî tu bisinasnî.*

Dilşa : Nûmê mi Dilşa wa, ez xwer tê Yadoy a. Nûmê may mi Rabîa ya, Rabîa cînî Yadoy a vêrîn a. Yado di cînî yi bî, a vêrîn may min a, a didini zi Tellî Ezîmşêr a.

- *Qêdo ki ma zûnî Yado şikyayiş tertelê Şex Seîda pê pa umbazun xwi ya çend sêr herb pêşmergetî rûmna. Ti eşkena inî ser ma rî qisê bikîrî?*

Dilşa: Mi Yado nidî û ez o waxti di niciwiyaya. May mi hot sêr Yado pîya koyûni di gêraya, cuwa pê surgini di menda û amêya newe ra zewicîyaya. Ez dewê Şarge ra kênay Hecî Elî El a (H. Alî Can). May mi ma rî tim tim qalê xwi û Yadoy kêrdîyeni. Qêdo ki may mi vatîyeni ina mintiqay ma ra biray may mi Faris, dezay yayi Polês, biray Tellî Mehmêdî û Husêynî Ezîmşêr, Emîn Sêl, Meh Qilç, Meh Evd û Hes Begûn umbaz Yadî bî. Îta ra pê ez eşkena vatê may xwi şima rî vacî. May mi vatîyeni:

Ez hîrye sêrri pa Yadoy koyûn a menda, cuwa pê amêya Çewlîg, la dewlet ez rahat niverdaya, her ruej amêni mi ra vatîyeni ti gerekca cay Yadoy ma ra vacî.

Mi vatîyeni: Eger şima cay heşûn, cay ver gûn zûnî ezi cay Yadoy zûna. Yado sê heşûn û vergûn o her ruej hun û yew ko ya, ez çi zûna Yado ho ça d' o?

Eskerûn ez rahat niverdaya. Inî ser ez şîya Yadoy het, la mi laj ma Çerkez tê niberdibi.

Yadoy mi ra va: Şue Çerkêz biya. Ez amêya pî pird mehlay cyêr (Çewlîg). Mi xeber şawit, Çerkez ame. Mi Çerkez gurot, ma şî dewê Dugernuni di resay

Yadoy ini. Ma îta ra piyer piya hêt kuêyûn Şabûn a şî. Ma inî kuêyûni di xendê yew ser mênî. Ma îta di erd kendibi, bin erdî di mixarê viraştîbî û ma inî mixarûni di mênîyeni. Hûnc ma verba eskerûn mevzi kênîdibi, waxti go leşkerûn bieştaynî ma ser, ma kotiyeni mevziyûn û ma xwi verdaynî. Yado hendê yew ser îta mênî û cuwa pê ma hêt Qeldar a şî. Cînî Yadoy ê didin dewê Xarpîyêt Kungi di bî. Yado xeber şawitîb. ya amêbî Qeldar. Ma Qeldar ra Tellî girot, Tellî zi amê ma het. Wusari bi dar vil kerdibi, her ca bibi zergûnayî, derê derxwelê kotibî owk ser; ti qayilibî koyûna bigêrî. Tellî zi ma ya bî, ma yew mudet mintiqay Pox û Şîrnûn di gêrayî, cuwa pê Yadoy Tellî hêna şawit Kung.

Dewê Gêxî Wexçiyûni di di biray bî. Nûmê yew Necîp Axa bi, o bîni zi Husên Axa bi. Bînatê inî wird birayûn çînêbi. Husên Axayî Yadoy rî xeber şawit, va: Bînatê mi û biray mi çînû, ez dewê xwi ra vêciyena şîna yewna dew ti biyê dewê mi di bimûni.

Inî ser ma da ra şî Wexçiyûn, ma yew mudet îta mend. Kung ra xeber amê ki Tellî niweşê qicûn a. Mi kinc cûmyerdûn girot pira, ma çek, sîlah xwi girêda, ez û Meh Evd kot rîye hêt Kung a şî. Ma şî Kung ra bî nîzdî, şar kung kotibi sêr şonşiyûn ma temaşe kêr dîyeni. Ma şî miyûn dew ra viyer t ra, şî Tellî het. Tellî wêlidîyay, ci ri yew laj bi, nûmê yi Filît na pa. (Filît inkê ho Çewlîgi d' o). Meh ca di têpîya gêra a şî, la ez 40 roj Kungi di menda. Cuwa pê ezi zî gêraya a şîya Wexçiyûn. Devlet cay ma musay eskerûn eşt ma ser. Yado û umbaz bîn remay, ez û dezay Yadoy Meh ma zerre di mênî. Meh xwi şonşî ra eşt, rema, la cendirmun pê ra tîfing na pa, şî kot. Ez xapung ra amêya warê, şîya Meh ser, Meh birîndar girun bi.

Mi veng kerd ci, mi va: Meho, Meho!

Meh va : Qayişûn mi akir, qayişûn mi akir.

Mi hetûn qayiş yi kêrd a, Meh merd.

Mi veng kerd Yadoy, mi va: Yado, Yado! Dezay tu kişîya!

Eskeran astwar Yado zî tê berd. Astwar Yado cis erebî bi û yew astwar qeri bi. Yado pa umbaz xwi ya pê ra kotî cendirmûn dim a, yini cendirmê pernayî, cendirmê têpîya gêrayî a şî. Devlet cay ma musay, ma hin nieşkayî Wexçiyuni di vindir, ma kot rîye hêt koyûn Şeqşewat a şî. Y ew ko berzi bi, byeveng bi, tek yew merdim pês veri di bi. Inî merdim hetî di yew kutiko gird bi. Ma sinî go hêt myêrik a şî, kutik ame ma. Yado veng da, va: Xalê Faris em dost in, em ne duşminin. (Xalo Faris ma dost î, ma duşmen nî.)

Inî ser myêrik venda kutik xwi da, kutik şî, ma zi şî myêrik het. Ma di şew îta Xalo Faris het mênî, cuwa pê ma wiriştî û hêt Dêrsim a şî. Nîzdî Dêrsimî di kiştê yew owki di ma mola da, binê arisîyayî û owca ra zi ma da ra hêt Sencêx a şî. Sencex nahîyay Çewlîg a. Mi rîye ra Yadoyi kêrdî vîn. Mi dêst Çerkêz girot, ma gêray gêray ma kes nidî. Ma kot rîye şî, ma resay Qerwêlûn

(yew dewê Sencêx). Qerwêlûni di ma şî kotî Gomê Xalit, mi laj Xalit şawit şî xeber da pî xwi.

Xalit ame, va : Xêr o, şîma qê têna yî, Yadoyi ça yî ?.

Mi Va: Ma Yadoyi kêrd vîn, ma zwar xwi eşt îta.

Ma yew şew Xalit hêt mênîdi û cuwa pê Xalit kot ma ya ver, ma pîya şî gêray Yadoyîni. Ma xêliyak ca şî, yew çayirî di ma yew kuçûnê adir dî.

Mi Xalit ra va: Ini miheqeq adir firarîn o, ti hin eşkênî şûerî, ez û Çerkez ma îta di pawênî.

Xalit şî, ez û Çerkez ma şî adir het, dûmarê adirî di nûn yini bi, mi nûn yini girot, pişt yew çixin ra û nimit. Ti nivûn yini adir kerdû we, nûn potu, la a heli di cendirmê pa vécîyayî; yini mecmur nun xwi ca verdawû û xwi dawû koyûni. Mi Çerkez girot ma kotî qurnê dar, ma qurnê dari di pawit hetûn yi amê. Waxti go yi amê û nûn nidî, Meh Evd va: Byebextûn, şîma nûn ma berd, şîma ga yew çend nûnûn ma ri vêrdî.

Yadoy va: Ini gurê cendirmûn nyû.

Mi cuwa ver Cerkez têmîye kerdibi, mi vatibi: Çerkez, eger yi amê ti vêng xwi nyekirî. La waxti go yini bînatê xwi di qisê kerd, Çerkêz veng da ,va: Yado, ma hê îta d' ê.

Inî ser ma vécîyayî werte. Yi ma ra persayî, va: Şîma şî ça, se bi şîma?

Tabî mi herçî ti ra va. Ma îta ra wiriştî û hêt Cebaxçor a şî. Ma eşnawiti ki berpîrsîyar sîyasî ê cephê Palu-Xarpêtî Şêx Şerîf hêt Dara Hênî di têtîşiyawû. Seîd Begûn pa yew mufrezê eskerûn a kotibi Şêx Şerîf dima û wi hêt Dara Hênî di yew mixara di tepîştibi. Yado pa umbazûn xwi ya xebitîya ki Şêx Şerîf bixelisnû, la nieşka Şêx Şerîf bixelisnû.

Ez pîyer pîya hot sêrr Yado gêrû, hot serûn a pê amêya Çewlîg. Yew mude cuwa pê eskerûn Dara Hênî û Bongilan (Solxan) ra cînî gîragirûn kirdun, cînî axûn, cînî şexun girotî bin dêt. Ma dayî arîye bêrdî Xarpîyet. Xarpîyeti di yew qişlê eskêrîya di ma 6-7 aşm tepîştî û cuwa pê îta ra ma şawitî Qeyserî(Kayseri). Qeyserî di zi ma yew qişlê eskêrîya di mênîyênî. Îta di eskerun tirkûn tim û tim tehlîm kêrdîyênî. Waxti go eskerûn tirkûn tehlîm kêrdîyênî, yi qêraynî vatyenî: Yaşa yaşa Kemal Paşa! (Biciyo Kemal Paşa!).

Çerkezî zî ê qij kurdan bînî ard piye ser, dar ra xwi rî tifing viraştî, tifing kêrdî xwi queli ri û yini zî dest tehlîm kerdî.Çerkez qij kirdûn têmîye kêrdîbî, waxti go yini tehlîm kêrdîyênî, yi zî qêraynî vatyenî:

- Yaşa Yaşa Y adîn Paşa!

Inay ser sereskêr eskêrîya gazî ma kerd, ma şî yi het.

Sereskêr Çerkez ra va:Ti nivûnî yaşa yaşa Kemal Paşa, ti vûnî yaşa yaşa Y adîn Paşa.

Çerkez va: Kemal Paşa yew paşay tirkûn o, Y adîn Paşay kir dûn o. Eskêr tu vûnî "yaşa yaşa Kemal paşa", tabî ma zi vûnî "yaşa yaşa Y adîn Paşa"..

Sereskêr va: Ini qij biciyo benû belay sarê ma, gereka ini dinya di nyemûnû. Çerkez o waxt 10 serre bi. Ma hîrye sêrr Qeyserî di mêndî, ef vêcîya la ma ef ver a nikotî.

Heval ma ê bîn verra dayî, ez û Çerkez şawitî navçê Dêrsîm Nazimîye. Nazimîye di hîryê sêr ma qêdîyayî yew roj tegmenik ame va: Yuzbaşî ho şima wazenû. Ma wirişt şî yuzbaşî het. Ma kêrdî yew wade û hîrye sarê ardî masa seri nayî rue.

Yuzbaşî mi ra va: De vaci, inî hîr yê sarûn ra kam ê Yado yo?

Mi va: O merdimi go Yadin kişenû hama may xwi ra nibû, hama rî dinya namo. Inî sarun ra qet yew zî sarê Yadin niyû.

Inay seri yi şî yew cemay tifingûn ard.

Çerkez mi ra va: Dayê, ti zûna inî wazên se bikîrî?

Mi va: Ê Çerkez mi, yi wazênî mi biceribnî.

Yuzbaşî mi ra va: Ti inî tifingûn sinasnena?

Mi va: Ê, ez sinasnena. Ê mi tek tek ti ra va kam tifing ê kam o.

Yuzbaşî mi ra va : Pekî, qet nişûn Yado ê hususî est.

Mi va : Ê, guêş Yado ê raştî di yew gueşar o sîmîn est?

Inî ser yuzbaşî guêş cayî xwi ri qîsê nikerd.

Mi va: Madem şima Yado kiştû, ma ver ra dîyenî ma xwi rî şimi kê xwi.

Yuzbaşî va: Nîye, ma şima ver ra nidûnî, şima çetebaşî.

Ma hîrye serrûn a pê amê zerrê Dêrsim. Ma ponc sêr Dêrsimi di mêndî, Çerkez kişiya. Yew cendirmî destî di tifing teqîya, gina Çerkêzî ri, Çerkez merd. Esker qerez ra, yûnî zunayê xwi ra tifing Çerkez a nina, yew qeza bî. Eskêr Cerkez nisinasnaynî, Çerkez qeza ra kişiya. Ez Nazimîye û Dêrsimi di pîyer pîya 10 sêrr menda. Des serrûn a pê amêya Çewlîg, mi hin Yado ra xeber nigiro. Ez cuwa pê zî newe ra zewicîyaya.

# Nûçeyên komeleyê

## ”Em tekerrura tarîxê naxwazin!”

Serokê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, M. Malmîsanij li ser êrîşa dewleta Tirk a li ser Kurdistanê Başûr daxuyaniyek belav kir. Malmîsanij di daxuyaniyê de weha dibêje:

”Dilê welatperwerên kurd û dostên milletê kurd, di 14yê gulanê de careke din bi êrîşa or diya Tirkîyê ya li ser Kurdistanê Başûr û gerîllayên PKK êşiya. Di van salên dawîn de bîyekîrî û bêhêzbûna kurdan firsendek wisa daye destê Tirkîyê ku wek malê bavê xwe her sal dikeve Kurdistanê Başûr, piştî kur dkuji û texprîbatên mezin gava ji bo xwe baştir dibîne vedikişe.

”Li gor agahdariyên massmedya, ev çrîşa dawîn a or diya Tirkîyê bi piştgirî û hevkarîya PDKI dimeşe. Eşkere ye ku li dijî hin hêzên kurd hevkarîya hin hêzên din ên kurd bi karbidestên Tirkîyê, Îraqê, Îranê, Sûriyê re, zirar dighîne tevgera azadîxwaz û rizgarîxwaz a Kurdistanê. Loma jî kîjan partî dibe bila bibe em helwestên wisa xeternak dibînin û bi hevkarîya hêzên kurdan û hêzên dewletên dagirkerên Kurdistanê xemgîn dibin û protesto dikin.

”Em careke din tekrar dikin û tînin bîra hêzên kurdan ku divê problemên navxwe ne bi çek û şiddet, lê bi peyivîn û muzakere hel bikin û problemên nava wan bi tu hawî nebin sebebê hevkarî û piştgiriya dijmin.

”Bes e êdî, em tekerrura tarîxê naxwazin!”

## Kongreya sêyem a KNKS'yê çêbû

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê (KNKS) kongreya xwe ya sêyem di 8ê Adara 1997'an de li Stockholmê çêkir. Di kongreyê de raporên xebatê hatin pêşkeşkirin û endaman nêrînên xwe li ser van raporên anîn ziman. Herweha li ser xebata pêşerojê pêşniyar û daxwaz hatin kirin û hin biryar hatin girtin. Ji bo Komîteya Kargêr, Malmîsanij, Zinar Soran, Mihemed Dehsuwar, Laleş Qaso û Osman Aytar wekî asil; Sait Aydoğmuş û Aram Gernas wekî cîgir hatin hilbijartin.

Komîteya Kargêr di civîna xwe ya yekem de di nav xwe de wezîfe parve kirin. Ji bo serokatîyê Malmîsanij, ji bo sekreteriyê Osman Aytar û ji bo berpirsiyariya malî Zinar Soran hatin hilbijartin. Redaksiyona Çirayê jî ji Osman Aytar, Mahmûd Lewendî, Laleş Qaso û Zinar Soran pêk hat.

Kovareke nû

kovara hunerî, çandî û siyasî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

Bihar / Havîn 1997

Aksaray Kürtleri

*Çarşamba*

Tevn/Teşî

Orta Anadolu

Kürtlerinde halı sanatı

*Manisa*

Belge

Sefki Aşiretinin

iskan öyküsü

*Manisa*

Orta Anadolu

Alevilerinde,

Kürtçe Ayet ve Beyitler

*Manisa*

Edetên Zewac / Dawatê

*Manisa*

Yareni / Henek

*Manisa*

Horasan Kürtleri

*Manisa*

2



Ji aliyê kurdên Anatoliya Navîn kovara Bîrnebûnê wek kovara hunerî, çandî û lêkolînî derdikeve. Hejmara 2'an, bi mijarên balkêş hatîye dagirtin. Ji navnîşanên jêrîn hûn dikarin Bîrnebûnê peyda bikin.

Navnîşan:

Li Almanyayê

Karl str. 2, 35576 WZ

Deutschland

Telefaks: +49 6441-52 615

Li Swêdê

Apec

Box 3318, 163 03 Spånga-Sverige


Telefaks: + 46 8 761 24 90

SALA 1  
HEJMAR 1  
ADAR 1995

# ÇIRA

KOVARA  
KULTURI

kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê



1

# ÇIRA

Çarşemê 2  
hejmar 2  
hulavî 1995

kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê



# ÇIRA

Çarşemê 3  
hejmar 3  
îlon 1995

kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê



3

# ÇIRA

Çarşemê 4  
hejmar 4  
hulavî 1995



4

# ÇİRA

Arşiv ve Kültür  
Konya Kütüphanesi ve Arşivleri Kurumu

sal  
hejmar  
bikar 2  
5  
1996



5

# ÇİRA

Arşiv ve Kültür  
Konya Kütüphanesi ve Arşivleri Kurumu

sal 2  
hejmar 7  
payiz 1996



7

# ÇİRA

Arşiv ve Kültür  
Konya Kütüphanesi ve Arşivleri Kurumu

sal 2  
hejmar 6  
havin 1996



6

# ÇİRA

Arşiv ve Kültür  
Konya Kütüphanesi ve Arşivleri Kurumu

sal 2  
hejmar 8  
zivistan 1996



8





Kürt Millet  
Hareketleri

ve  
Irak'ta  
Kürdistan  
İhtilali

DR. ŞIVAN

Navnîşana xwestinê li Swêdê:

Apec-Tryck & Förlag

Box 3318

S-163 03 Spånga/Sweden

Tel: +46 8 761 81 18

Faks: +46 8 761 24 90

Epost-adress: [apec@stockholm.mail.telia.com](mailto:apec@stockholm.mail.telia.com)

Li Almanyayê:

Dilan KİTAP-MUZİK

Brigitten str. 3

20359 - Hamburg/Deutschland

Tel: +49 40 432 906 70

Faks: +49 40 432 906 71